**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Beşir GÜÇLÜ**

# DENGBÊJ SALİHÊ QUBÎNÎ YAŞAMI VE ESERLERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**MUŞ–2019**

**T.C.**
**MUŞ ALPARSLAN ÜNİVERSİTESİ**
**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ**
**KÜRT DİLİ VE KÜLTÜRÜ ANABİLİM DALI**

**Beşir GÜÇLÜ**

# DENGBÊJ SALİHÊ QUBÎNÎ YAŞAMI VE ESERLERİ

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**DANIŞMAN**
**Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ**

**MUŞ–2019**

**K.T.**
**ZANÎNGEHA MÛŞ ALPARSLAN**
**ENSTÎTUYA ZANISTÊN CIVAKÎ**
**ŞAXA MAKEZANISTA ZIMAN Û ÇANDA KURDÎ**

**Beşir GÜÇLÜ**

# DENGBÊJ SALIHÊ QUBÎNÎ JIYAN Û BERHEM

**TEZA MASTIRÊ**

**RÊVEBIRÊ TEZÊ**

**Alk. Doç. Dr. Canser KARDAŞ**

**MÛŞ–2019**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Muş Alparslan Üniversitesi Lisansüstü Eğitim-Öğretim ve Sınav Yönetmeliğine göre hazırlamış olduğum "Salihê Qubînî Jiyan û Berhem" adlı tezin tamamen kendi çalışmam olduğunu ve her alıntıya kaynak gösterdiğimi taahhüt eder, tezimin kağıt ve elektronik kopyalarının Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü arşivlerinde aşağıda belirttiğim koşullarda saklanmasına izin verdiğimi onaylarım.

Lisansüstü Eğitim-Öğretim yönetmeliğinin ilgili maddeleri uyarınca gereğinin yapılmasını arz ederim.

□ Tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

□ Tezim sadece Muş Alparslan Üniversitesi yerleşkelerinden erişime açılabilir.

□ Tezimin......yıl süreyle erişime açılmasını istemiyorum. Bu sürenin sonunda uzatma için başvuruda bulunmadığım takdirde, tezimin tamamı her yerden erişime açılabilir.

**21.12.2018**

**Beşir GÜÇLÜ**

**TEZ KABUL TUTANAĞI**

**SOSYAL BİLİMLER ENSTİTÜSÜ MÜDÜRLÜĞÜNE**

Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ danışmanlığında Beşir GÜÇLÜ tarafından hazırlanan bu çalışma21/12/2018 tarihinde sunumu başarıyla gerçekleştirilmiş olup Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı`nda Yüksek Lisans Tezi olarak kabul edilmiştir.

| | | |
|---|---|---|
| Başkan | : Doç. Dr. M. Zahir ERTEKİN | İmza : ........................ |
| Jüri Üyesi | : Dr. Öğr. Üyesi M. Emin PURÇAK | İmza :........................ |
| Jüri Üyesi | : Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ | İmza :........................ |

**NAVEROK**


**NAVEROK………………………………………………………………..………….I**

**ÖZET…………………………………………………………….….…........VIII**

**KURTE…………………………………………………………………….…..IX**

**ABSTRACT……………………………………………………………….........X**

**PÊŞGOTIN…………………………………………………………………XI**

**KURTEBÊJE…………………………………………………………...…XII**

**DESTPÊK………………………………………………………….............1**

**BEŞA YEKEM**

**AWIRTÊDANEK GIŞTÎ LI SER ÇANDA DEVKÎ**

**1. 1. AWIRTÊDANEK GIŞTÎ LI SER ÇANDA DEVKÎ……………………………**4

1.1.1. Çanda Devkî……………………………………………………………4

1.1.2. Çanda Nivîskî…………………………………………………………..7

1.1.3. Dengbêj û Dengbêjî…………………………………………………….8

1.1.4. Di Civakê De Rola Dengbêjiyê……………………………………......12

**1.2. LI HERÊMA XERZANÊ DENGBÊJÎ………………………………………**15

1.2.1. Danasîna Çend Dengbêjên Herêma Xerzanê…………………..……............17

1.2.1.1. Nazî Beg………………………………………………………..…….18

1.2.1.2. Teyîboyê Sehertî………………………………………………..….…19

1.2.1.3. Emerê Xatê………………………………………………..…….…21

1.2.1.4. Recêyê Sihî …………………………………………………...……...24

1.2.1.5. Hisamedînê  Zoqeydî………………………………………….........24

1.2.1.6. Mihemed Eliyê Comanî ………………...…………………………..….26

1.2.1.7. Xalitê Xerzî  …………………………………………………………….26

1.2.1.8. Ebûzerê Misircî………………..……………………………………......…...28

**BEŞA DÛYEM**

**JIYAN Û BERHEMÊN SALIHÊ QUBÎNÎ**

**2.1. JIYANA SALIHÊ QUBÎNÎ**………………………………………………………...31

2.1.1. Malbata Salihê Qubînî …………………………………………………………...32

2.1.2. Dengbêjiya Salihê Qubînî……………………………...…………....………...33

**2.2. BERHEMÊN SALIHÊ QUBÎNÎ**……………...…………………………………36

2.2.1. Berhemên Mêrxasî/Şer……………………………………………….…….…….37

2.2.1.1. Behçetê Dawid………………...………………………………...………...38

2.2.1.1.1. Mijara Berhemê……………………………………..……….……...40

2.2.1.1.2. Naveroka Berhemê…………………………………………......……40

2.2.1.1.3. Lehengên Berhemê…………………...……………………...…..……41

2.2.1.1.4. Zimanê Berhemê……………………….…………………...…….41

2.2.1.1.5. Teşe û Cûreya Berhemê…………………………………...…...42

2.2.1.1.6. Dahûrîna Berhemê…………………..…..…………………..…….42

2.2.1.2. Xelîlê Reysê û Emerê Birahîm…………….……………………...…42

2.2.1.2.1. Mijara Berhemê…….……………………………………...……...44

2.2.1.2.2. Naveroka Berhemê……….………………………………..………..44

2.2.1.2.3. Lehengên Berhemê…….………………………………….……...44

2.2.1.2.4. Zimanê Berhemê……………………….…………………....…….44

2.2.1.2.5. Teşe û Cûreya Berhemê …………………………………......……44

2.2.1.2.6. Dahûrîna Berhemê…….…………………………………...……...45

2.2.1.3. Şerê Dêrûnê…………………………………………….…………………45

2.2.1.3.1. Mijara Berhemê…….…………………………..………………...47
2.2.1.3.2. Naveroka Berhemê…….……………………….……………..47
2.2.1.3.3. Lehengên Berhemê….…………………………………..…………..47
2.2.1.3.4. Zimanê Berhemê ………………………………………...………48
2.2.1.3.5. Teşe û Cûreya Berhemê ………………………………...……..…48
2.2.1.3.6. Dahûrîna berhemê……………………………………….……….48
2.2.1.4. Hadî Lawo………………………………………….………..…49
2.2.1.4.1. Mijara Berhemê…….……………………………….………...49
2.2.1.4.2. Naveroka Berhemê…….……………………………..……..…49
2.2.1.4.3. Lehengên Berhemê…….……………………………..………..50
2.2.1.4.4. Zimanê Berhemê……………………………………...………..50
2.2.1.4.5. Teşe û Cûreya Berhemê ………………………………….....…..50
2.2.1.4.6. Dahûrîna Berhemê………………………...…………………..……50
2.2.2. Berhemên Evînî/Dilan…………………………………………............51
2.2.2.1. Lawikê Dêmanî û Keçika Koçer……………………………….….52
2.2.2.1.1. Mijara Berhemê………………………………………...……...54
2.2.2.1.2. Naveroka Berhemê…………………………………………..…..54
2.2.2.1.3. Lehengên Berhemê……………..…………………………....…54
2.2.2.1.4. Zimanê Berhemê……………….……………………………….54
2.2.2.1.5. Teşe û cûreya Berhemê ………………………………………...55
2.2.2.1.6. Dahûrîna Berhemê…………..……………………...…………..55
2.2.2.2. Gorî Sebrê………………………………………………………...55
2.2.2.2.1. Mijara Berhemê…………..……………………………...………57

2.2.2.2.2. Naveroka Berhemê……………………………………………………………..57

2.2.2.2.3. Lehengên Berhemê…………………………………………………………..57

2.2.2.2.4. Zimanê Berhemê………………………………………………………….….57

2.2.2.2.5. Teşe û cûreya Berhemê ……………………………………………….…...57

2.2.2.2.6. Dahûrîna Berhemê…………………………………………………….…...57

2.2.2.3. Bavê Şikran û Zînê…………………………………………………………….58

2.2.2.3.1. Mijara Berhemê…………………………………………………..……...59

2.2.2.3.2. Naveroka Berhemê……………………………………..……………..59

2.2.2.3.3.Lehengên Berhemê………………………………………..……………...59

2.2.2.3.4. Zimanê Berhemê……………………………………………...…………..59

2.2.2.3.5. Teşe û Cûreya Berhemê …………………………………..……………..60

2.2.2.3.6. Dahûrîna Berhemê…………………………………..……………...60

2.2.2.4. Delîl Yadê……………………………………………………..………………...60

2.2.2.4.1. Mijara Berhemê……………………………………...…………………...61

2.2.2.4.2. Naveroka Berhemê…………………………………...……………..61

2.2.2.4.3. Lehengên Berhemê……………………………………..........………..61

2.2.2.4.4. Zimanê Berhemê……………………………………………………………….62

2.2.2.4.5. Teşe û Cûreya berhemê ……………………………………………...……...62

2.2.2.4.6. Dahûrîna Berhemê…………………………………………...………...62

2.2.2.5. Çavreşê Birû Qorê…………………………………………...……………..62

2.2.2.5.1. Mijara Berhemê…………………………………………………………...63

2.2.2.5.2. Naveroka Berhemê………………………………………………………..63

2.2.2.5.3. Lehengên Berhemê……………………………………………………..63

2.2.2.5.4. Zimanê Berhemê……………………………………………………….……..63

2.2.2.5.5. Teşe û Cûreya Berhemê ……………………………………………….……..63

2.2.2.5.6. Dahûrîna Berhemê……….……………………………………………………...64

2.2.2.6. Dîlber…………………………………………………………………………..64

2.2.2.6.1. Mijara Berhemê……………………………………………………………65

2.2.2.6.2. Naveroka Berhemê……….……………………………………………..65

2.2.2.6.3. Lehengên Berhemê……….……………………………………………..66

2.2.2.6.4. Zimanê Berhemê…………………………………………………….…..65

2.2.2.6.5. Teşe û Cûreya Berhemê ……………………………………………….……..65

2.2.2.6.6. Dahûrîna Berhemê……….……………………………………………………...66

2.2.2.7. Şêxa Dînê…………………………………………………………………66

2.2.2.7.1. Mijara Berhemê……….……………………………………………………...69

2.2.2.7.2. Naveroka Berhemê……….……………………………………………..…69

2.2.2.7.3. Lehengên Berhemê……….……………………………………………………..69

2.2.2.7.4. Zimanê Berhemê………….……………………………………………….……69

2.2.2.7.5. Teşe û Cûreya Berhemê …………....……………………………………..…..70

2.2.2.7.6. Dahûrîna Berhemê……….……………………………………………………...70

2.2.2.8. Sebrê Bihar e…………………………………………………...………...71

2.2.2.8.1. Mijara Berhemê……….………………………………………………...…72

2.2.2.8.2. Naveroka Berhemê……….……………………………………………………..72

2.2.2.8.3. Lehengên Berhemê……….……………………………………………………..73

2.2.2.8.4. Zimanê Berhemê……………………………………………………….......73

2.2.2.8.5. Teşe û Cûreya Berhemê ……………………………………...………73

2.2.2.8.6. Dahûrîna Berhemê……..…………………………….………..……74

2.2.3. Berhemên Şînê/Zêmar………………………..……………………………74

2.2.3.1. Loqman Birazî………………………………………………………………75

2.2.3.1.1. Mijara Berhemê…….………..………………………….………76

2.2.3.1.2. Naveroka Berhemê…….…………………………………...………76

2.2.3.1.3. Lehengên Berhemê…….……………………………….……...…76

2.2.3.1.4. Zimanê Berhemê……….………..…………………………..…..……77

2.2.3.1.5. Teşe û Cûreya Berhemê ……..……...…………………………...……77

2.2.3.1.6. Dahûrîna Berhemê…………………………………………………....…77

2.2.3.2. Bav û Qîz……………………………………………………………………77

2.2.3. 2.1. Mijara Berhemê…………………………………………………………...78

2.2.3.2.2. Naveroka Berhemê……………….……………………………………..…78

2.2.3.2.3. Lehengên Berhemê…………….………………………………………..79

2.2.3.2.4. Zimanê Berhemê……………………………………………….……..…79

2.2.3.2.5. Teşe û Cûreya Berhemê ………………………………………….……..…79

2.2.3.2.6. Dahûrîna Berhemê………….………………………………………...…79

2.2.3.3. Şêx Şabedîn û Seyîd Elî………………………………………………..…80

2.2.3.3.1. Mijara Berhemê………….…………………………………………....…82

2.2.3.3.2. Naveroka Berhemê………..…………………………………………..…82

2.2.3.3.3. Lehengên Berhemê………..……………………………………………..83

2.2.3.3.4. Zimanê Berhemê……………..………………………………….….……83

2.2.3.3.5. Teşe û Cûreya Berhemê ……….…………………………………….….…83

2.2.3.3.6. Dahûrîna Berhemê……………..………………………………..……...…84

**ENCAM……………………………………………………………………………..85**

**ÇAVKANÎ………………………………………………………………………..…87**

**KURTEJIYAN…………………………………………………………………...90**

**ÖZGEÇMİŞ……………………………………………………………………...91**

# ÖZET

**YÜKSEK LİSANS TEZİ**

**DENGBÊJ SALİHÊ QUBÎNÎ YAŞAMI VE ESERLERİ**

**Beşir GÜÇLÜ**

**Tez Danışmanı: Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ**

**2019, 104 sayfa**

Dengbêjlik Kürt sözlü kültüründe önemli ve özel bir role sahiptir. Dengbêjlik sayesinde dil, adet, töre ve birçok Kürt kültür öğesi ayakta kalabilmiş ve nesilden nesile aktarılarak günümüze kadar ulaşabilmiştir. Dengbêjlik sanatının kahramanları da şüphesiz dengbêjlerdir. Dengbejler bu sanatın temsilcileridir. Dengbêjler, güçlü hafızaları, toplumsal ve edebi kişilikleri sayesinde bu rollerini eksiksiz bir şekilde yerine getirmektedirler.

Dengbêjler eserlerinde sosyoloji, tarih ve edebiyat gibi disiplinlerin farklı ve renkli öğelerini barındırırlar, başka bir ifadeyle bir dengbêj, aynı zamanda toplumda bir sosyolog, bir tarihçi, bir edebiyatçı rolünü de üstlenmektedir.

Salihê Qubînî "Hayatı ve Eserleri" adlı tezimizde, Garzan Yöresine yönümüzü çevirip burada ki dengbêjlere kulak vermeyi amaçladık. Özellikle yörenin en meşhur dengbêji olarak bilinen ve aynı zamanda tezimizin başlığı olan Salihê Qubînî üzerinde duracağız. Onun hayatı ve eserleri üzerine detaylı bir analiz yapacağız.



**Anahtar Kelimeler:** Sözlü kültür, Dengbêjlik, Garzan yöresi, Salihê Qubînî

# KURTE

## TEZA MASTIRÊ

## DENGBÊJ SALIHÊ QUBÎNÎ(JIYAN Û BERHEM)

**GÜÇLÜ, Beşir**

**Şêwirmend: Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ**

**2019, 104 Rûpel**

Dengbêjî, di Çanda Kurdî ya Devkî de xwedî roleka girîng û taybet e. Bi saya dengbêjiyê ziman, adet, tore û gelek hêmanên çanda kurdî li ser piya mane, ji nifşekî derbasî nifşekî din bûne û heya dema me hatine. Lehengên hunera dengbêjiyê jî bêguman dengbêj in. Dengbêj, nûnerê vê hunerê ne. Ew bi rêya bîra xwe ya xurt, kesayeta xwe ya civakî û edebî vê rola xwe bi awayekî serkeftî pêk tînin.

Dengbêj, di berhemên xwe de gelek hêmanên cuda û bireng yên disiplînên wek edebiyatê, dîrokê û civaknasiyê jî dihewînin, ji ber vê yekê em dikarin bibêjin her dengbêjek di heman demê de di civakê de rola edebiyatnasekî, diroknasekî û civaknasekî jî dilîze.

Di vê xebata xwe ya bi navê Salihê Qubînî (Jiyan û Berhem) de me xwest ku em berê xwe bidin herêma Xerzanê û guhê xwe bidin dengbêjên vê herêmê. Bitaybetî jî em li ser dengbêjê herêmê yê herî navdar, ku di heman demê de serenavê teza me ye jî, Salihê Qubînî rawestin. Li ser jiyana wî û berhemên wî em ê dahûrîneka berfireh û kûr bikin.



**Peyvên Sereke:** Çanda devkî, Dengbêjî, herêma Xerzanê, Salihê Qubînî

# ABSTRACT

**MASTER'S THESIS**

**THE DENGBÊJ SALİHÊ QUBÎNÎ(HIS LIFE AND WORKS)**

**Beşir GÜÇLÜ**

**Advisor: Dr. Öğr. Üyesi Canser KARDAŞ**

**2019, Page: 104**

Folk poet has an important and special role in Kurdish verbal culture. Thanks to folk poet many culturel subjects such as language, tradition can have stand todays and it has reached today by delievered generation by generation. Folk poetry is the fund of this work. Thanks to strong memory, social and literature personality folk poetries apply their roles precisely.

Folk poetries contains different and colorfull subjects such as sociology, history and literature in their Works. So we can say that a folk poetries apply the role of sociologist, historian and man of letters.

İn this thesis that named " Salihê Qubînî(Jiyan û Berhem)" have intented to give our ears and turn our face to the folk poetries in Garzan region. We specially focus on Salihê Qubînî that gave his name to our thesis. We will have a deep and wide analysis on Salihê Qubînî's life and Works.

**Key Words:** Verbal Culture, Folk Poetry, Garzan Area, Salihê Qubînî

## PÊŞGOTIN

Di Edebiyata Kurdi ya Gelerî de xebatên li ser zargotinê, li ser folklorê û bitaybetî jî li ser mijara çanda devkî pir hewce û hêja ne. Mixabin bi qasî hêjabûna xwe û hewcedariya xwe hejmarên van xebatan ne zêde ne. Gelo çima çanda devkî ewqas gîring e û hewceyê lêkolinan e? Li gor me ji bo Edebiyata Kurdî qada herî berfireh, dewlemend û bikêrhatî qada çanda devkî ye.

Ji ber ku tiştê em dizanin ji berê heya niha Kurdan ji ber hin sedeman çand, ziman, gelek adet û toreyên xwe bi rêya axaftinê, çirokbêjî û sitranbêjîyê anîne ziman, parastine û heya dema me neqil kirine, bi saya vê yeke jî ev çanda xwe ya qedîm ji mirinê xelas kirine. Nûnerên vî karê pîroz jî çîrokbêj û dengbêj in.

Di vê xebata xwe de me hewl da ku em li ser mijara dengbêjiyê rawestin. Lê belê armanca me ew e ku ji xeynî hin tez û xebatên ku piranî li ser dengbêjiya herêma Serhedê hatine kirin, behsa dengbêjiya herêma Xerzanê bikin û bitaybetî jî dengbêjê herî navdar yê herêmê Salihê Qûbînî, biberfirehî bidin nasîn û bi saya wî hin taybetî û xweseriyên dengbêjiya herêma Xerzanê jî derxin holê.

Ez hêvidarim ku ev xebata me ya teza mastirê ku serenavê wê dengbêjê navdar “Salihê Qubînî(Jiyan û Berhem)”e, dê di vê mijarê de cihê valahiyekê dagire û ji bo xebatên li ser herêmê jî ji lêkolîneran re bibe çavkanî û rênîşanek.

Di vê xebatê de keda gelek dost, heval û mamosteyên min hene. Dibe ku ez li vir navê tevan nikaribim bînim ziman. Li ser navên wan jî di serî de şêwirmendê min birêz Canser Kardaş, Dengbêjê hêja Salihê Qubînî û dengbêjên min bi wan re hevpeyvîn kirin, hevalên min yên hêja mamosteyên Zimanê Kurdî Netice Bozkur û Cihan Turşak ku tez xwendin û kêmasî sererast kirin, hevalê min ê hêja mamosteyê kurdî Necat Gümüş ku di deşîfrekirina kilaman de pir bû alîkarê min, spasiyê xwe ji dil û can ji wan re pêşkêş dikim.

**Muş-2019** **Beşir GÜÇLÜ**

**KURTEBÊJE**

| | | |
|---|---|---|
| AMD. | : | Amedekar |
| HB. | : | Heman berhem |
| HEJ. | : | Hejmar |
| hwd. | : | Her wekî din |
| hzl. | : | Hazırlayan |
| r. | : | Rûpel |
| s. | : | Sayfa |
| vd. | : | Ve diğerleri |
| weş. | : | Weşanxane |

## DESTPÊK

Xebatên li ser edebiyata gelerî, zargotin, folklor û bitaybetî çanda devkî pir biqedr in. Di van xebatan de arîşeyeke mezin ev e ku, çavkanî pir kêm in. Çavkaniyên hene jî mixabin ji ber hin sedeman her diçe hejmara wan kêmtir dibe. Wekî ku tê zanîn çavkaniyên vê qadê yên herî xurt û dewlemend çîrokbêj û dengbêj in. Dengbêj û çîrokbêj bingeha çanda devkî pêk tînin. Bitaybetî ji bo civakên wek Kurdan ku ziman û çanda wan ji ber hin sedemên polîtîk di pergala perwerdeyê de cihekî xurt negirtine û wek nivîs zêde nehatine tomar kirin vê valahiyê çanda devkî ango çîrokbêj û dengbêjan dagirtiye.

Dema em li xebatên li ser folklorê hatine kirin dinerin, xuya dibe ku li ser mijara dengbêjiyê xebatên hatine kirin pir kêm in. Piraniya xebatên di lîteratûrê de jî, li ser herêma Serhedê û dengbêjên vê herêmê ne. Li gorî lêkolînên me di vê mijarê de li ser dengbêjiya herêma Xerzanê hema bibêje xebat tune ne. Ev xebatên hene jî piranî bi awayekî amatorî hatine amade kirin, tenê di asta gotaran de mane û di hin kovaran de hatine weşandin. Li gor lêkolînên me di lîteratûra Edebiyata Kurdî û Çanda Kurdî de kirine li ser vê herêmê, em leqayî tu tezan jî nehatin. Hejmara gotarên akademik yên li ser vê herêmê jî pir kêm in. Dema em lê dinêrin di hin xebatan de jî em leqayî agahiyên xelet û xwedî kêmasî tên.

Li gor me sedemê van kêmasiyan jî ev in ku, an agahî ne bi rêya xebatên qadê tên berhev kirin an jî hevpeyvîn rasterast ne bi kesên çavkanî re tên kirin. Ji ber vê yekê agahiyên nezelal derdikevin holê. Di gotara bi navê "Şerên Eşîran Di Kilamên Karapetê Xaço û Salihê Qubînî de" ku ji aliyê Hasan Karacan û Rıdvan Nayman ve hatiye amadekirin de dema behsa berhemên Salihê Qubînî tê kirin, di agahiyên derheqê berhemên wî de kêmasî hene. Di vê xebatê de berhemên Salihê Qubînî wisa hatine rêz kirin: " Kilamên bi navê Filîtê Quto, Filehên Koxan, Êzîdiyên Hemdûna, Şerê Mala Faro û Seyîdên Badayê, Batmana Şewitî, Bişêriya Kambax, Eliyê Ûnis, Keremê Qolaxasî, Şêxên Zoqeydê, Begên Eyndarê û Koçerên Kanîgewrkê, kilamên Salihê Qubînî yên sereke ne."[1] Tê xuya kirin ku lêkolînerên vê xebatê an rasterast bi Salihê Qubînî re hevpeyvîn nekirin e, an jî di derheqê berhemên wî de pirs jê nekirine. Ev yek

[1] Hasan Karacan ve Rıdvan Nayman, **Dengbêj Salihê Qubînî ile Karapetê Xaço'nun Şarkılarında Aşiret Kavgaları: " Filîtê Quto ile Elî Etmanki Kavgası**", Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 2014, c.16, Sayı 2. s. 371.

jî bûye sedemê neqilkirina agahiyên xelet di derheqê berhemên wî de. Ev navên li jor diborin hin lehengên girîng yên ji vê herêmê ne hin jî navên bûyerên li herêmê qewimî ne. Ev nav di heman demê de di naveroka hin berhemên wî de derbas dibin lê belê li gor lêkolîna me wek serenavê berhemeka dengbêj Salihê Qubînî em leqayî van navan nehatin.

Teza me ji destpêk û du beşan pêk tê. Di beşa yekem de wek teorî em li ser mijara çanda devkî û çanda nivîskî rawestiyan. Di nav vê beşê de me serenavek jî ji dengbêjiya herêma Xerzanê û danasîna çend dengbêjên herêmê re veqetand. Di beşa dûyem de me behsa jiyana dengbêj Salihî Qubînî kir û bi awayekî berfireh em li ser pazdeh berhemên wî yên xweser rawestiyan.

Ji vê xebata me armanca me ya ewil danasîna dengbêjê navdar Salihê Qubînî û dahûrîna berhemên wî ne. Di warê dengbêjiyê de, ji xeynî Salihê Qubînî bi rêya hin nûnerên vê herêmê yên sereke danasîna dengbêjiya herêma Xerzanê jî wekî armanc derdikeve holê. Ji ber ku Salihê Qubînî dengbêjekî ji herêma Xerzanê ye, em bitaybetî li ser vê herêmê û dengbêjên vê herêmê rawestiyan. Sînorên herêma Xerzanê di beşa yekem de, di bin serenavê dengbêjiya herêma Xerzanê de hatiye diyar kirin.

Ji ber ku herêma Xerzanê gelekî berfireh e, derfet tune ye ku em li ser herêmê tevî bisekinin. Em bitaybetî li ser dengbêjên navçeya Sêrtê ya bi navê Misircê[Kurtalan], gundên wê û beldeya girêdayî navçeya Sêrtê ya bi navê Hawêl [Baykan] rawestiyan. Belde û gundên ku me dengbêj ji wan hilbijartin û hevpeyvîn bi wan re kirin ev in: Eyndarê, Sihiya, Seherta, Zoqeydê, Comaniyê, Girê Hemdo. Ji ber ku piraniyên dengbêjên me ji navçeya Misircê[Kurtalan] û gundên wê ne, ev nav di gelek cihên tezê de derbas dibe. Me di tezê de ji bo navê navçeyê "Misirc" bikar anî.

Me di xebata xwe de ji bo berhevkirina çavkanî û agahîyan bi metoda "xebata qadê" ya di piraniya xebatên edebiyata gelerî de tê bi kar anîn, tercîh kir. Di nav vê xebata xwe de teknîkên wek "hevpeyvîn" û "çavdêrî" jî hatin bikaranîn. Me di demên cûda de çar caran bi dengbêj Salihê Qubînî re hevpeyvîn kirin. Ji xeynî Salihê Qubînî me li cihên cuda bi dengbêjên ku niha jî li jiyanê ne; Teyîboyê Sehertî, Hisamedînê Zoqeydî, Mihemed Eliyê Comanî, Ebuzêrê Misircî û re jî hevpeyvîn kirin.

Ev cûre xebatên ku bi taybetî mijara wan çanda devkî û dengbêjî ne di Edebiyata Kurdî de xwedî cihekî girîng in. Ji ber ku bi saya van xebatan, folklor û zargotin bi awayekî sistematik tê tomar kirin û di lîteratûrê de cih digire. Ger kesên çavkanî yê ku xebat li ser wan tê kirin, li jiyanê bin ev yek ji bo xebatê pir girîng e. Ji ber ku dengbêj Salihê Qubînî li jiyanê ye û me gelek agahiyên xwe jî rasterast ji, hevpeyvînên pê re kirî, bi dest xistin, ev yek ji bo xurtbûn û zelalbûna çavkaniyan ji me re bû derfetek mezin.

# BEŞA YEKEM

# AWIRTÊDANEK GIŞTÎ LI SER ÇANDA DEVKÎ

## 1.1. AWIRTÊDANEK GIŞTÎ LI SER ÇANDA DEVKÎ

Di edebiyata gelerî û zanistên wek folklorê de dema lêkolînek bête kirin çavkanîya herî girîng bêguman çanda devkî ye. Çanda devkî di vî warî de gelekî xurt û dewlemend e. Çanda devkî danehevên bi salan bi rêya hin kesên wek çîrokbêj û dengbêjan zindî dihêle û digihîne heya dema me. Herçiqas çanda devkî di van salên dawî de li hember geşedanên teknolojik û çanda nivîskî bêqedir bûbe jî wenda nebûye. Li jêr digel çanda devkî em ê bi kurtasî behsa çanda nivîskî jî bikin.

### 1.1.1. Çanda Devkî

Di xebatên li ser folklor an jî zargotinê de karê ewil pênasekirin û şîrovekirina çanda devkî ye. Ev birastî jî karekî hewce ye, çewa me li jor jî anî ziman çanda devkî bi her awayî bûye qada xebatên folklor û zargotinê. Ji bo ku çanda devkî baş bête fam kirin divê têkiliya wê û çanda nivîskî jî bête zanîn.

Li ser têkiliya çanda devkî û nivîskî tespîta Fırat Taş gelekî di cîh de ye. Taş vê yekê wisa tîne ziman: “ Çanda devkî ku weke civandina hemû danehev û zanîna civakî ya mirovan û berdewamiya wê ya bi riya veguhestina devkî û vejandina wê ya kêrhatî ya di nav jiyana rojane de, dikare bê te pênasekirin, bingeh û palpiştê nivîsê ye. Mirov ku nivîsê di dewrên pir dereng ên dîroka mirovahiyê de keşf kiriye, pêşî bi çanda devkî afiriye û afirandiye.”[2]

Walter Ong, li ser çanda devkî pir xebat kirine. Ong, çanda devkî wek du beşan vediqetîne û ya yekemîn bi navê ‘Çandên devkî yên yekemin’ ya duyemîn jî bi navê “Çandên devkî yên dûyemîn” pênase dike û vê yeke wisa tîne ziman: “Min çandên ku haya wan ji hebûna nivîs û matbaayê tuneye û di wan de ji bo rêya ragihandinê tenê zimanê axaftinê tê bi kar anîn bi navê ‘Çandên devkî yên yekemîn’pênase kir. Li hemberî vê jî bi rêya teknolojîya pêşketî amûrên ketine jiyana me wek mînak; telefon, radyo, televîzyon û amûrên din yên elektronîk ji ber ku wesfên wan yên ‘devkî’,

[2] Fırat Taş, **Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler**, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi, SBE, Ankara, 2015, s. 5.

hilberîna wan û fonksiyona wan a ewil ji nivîs û metnê derket û veguherî zimanê axaftinê, li gor min ev yek jî 'Çandên devkî yên dûyemîn' pêk tînin".[3]

Ji nêrînên Walter Ong diyar dibe ku çanda devkî herçiqas ne wek forma xwe ya berê be jî niha jî digel pêşveçûna teknolojî, matbaa û nivîsê hebûna xwe berdewam dike. Tenê navê wê hatiye guhertin lê belê kêm be jî fonksîyona xwê ya berê berdewam dike.

Özkul Çobanoğlu nêrînên xwe yên di derheqê mijara çanda devkî de wisa tîne ziman: "Em ji qada ku bê bikaranîna teknolojîya peyv û dengê bi rêya matbaa û ceyranê bi mekanê ve girêdide, ragihandina xwe bideng û rû bi rû pêktîne re qada çanda devkî dibêjin."[4]

Her weha Çobanoğlu di edebiyatê de ji bo girîngbûna çanda devkî jî wisa dibêje: "Wekî ku tê zanîn çanda edebiyatê ya terza aşiqan bi tevahî bûyerek ku qada çanda devkî derxistiye holê."[5] Li gorî Çobanoğlu çanda devkî bi bingeha xwe ya xurt û dewlemend bi tena serê xwe ji bo edebiyata gelerî şaxek ava kiriye.

Li gorî Canser Kardaş peywîra çanda devkî ev e: "Tevahiya agahiyan, di encama serboriyan de tên bidestxistin, bi rêya berhemên devkî agahî tên veşartin û sazkirin û dîsa bi rêya van berhemên devkî ji nifşên nû re tên neqilkirin anku agahî, di berhemên devkî de tên arşîvkirin. "[6]

Li ser mijara çanda devkî Abidin Parıltı nêrînên xwe wisa tîne ziman: " Çanda devkî çandên ku haya wan ji hebûna têgehên nivîs û matbaayê tuneye, ger hebe jî wan bi kar naynin an jî di jiyana xwe de ewqas jî cih nadin vê yekê û tenê ragihandina ku bi rêya zimanê axaftinê û bi rêya bîra dîrokî pêk tê re tê gotin."[7]

Jack Goody ji bo çanda devkî wisa dibêje: "Çanda devkî têgeheka nediyar e. Civakeke ku xwendin û nivîsandina wan tune be, di nav wê civakê de çanda devkî wek

---

[3] Walter J.Ong, **Sözlü ve Yazılı Kültür**, İstanbul: Metis Yayınları, 2014, s. 23-24.
[4] Özkul Çobanoğlu, **Aşık Tarzı Kültür Geleneği ve Destan Türü**, Ankara: Akçağ yayınları, 2000, s. 124.
[5] Çobanoğlu, **h.b**. ,s. 129.
[6] Canser Kardas, **"Dengbêjlik Geleneği ve Aşık Edebiyatı ile Karşılaştırılması"**, Yayınlanmamış Doktora Tezi, Fırat Üniversitesi SBE, 2013, s. 24.
[7] Abidin Parıltı, **Dengbejler Sözün Yazgısı**, İstanbul: İthaki Yayınları, 2006, s. 18.

her tiştên ku bi rêya gotinê ji nifşan derbasî nifşan dibe, wate digire ango bi gotineke din çanda devki, tevahiya çandê di nav xwe de dihewîne."[8]

Di Çanda devkî de neqilkirina agahiyan, bûyeran û serpêhatiyên ku di nav xwe de dîrok, çand, ziman, adet û toreyên gel jî dihewînin tenê ne bi xêra dengbêj an jî çîrokbêj çêdibe. Ev kar di eslê xwe de karekî kolektîf ango civakî ye. Vê yekê Barry Sanders wisa tîne ziman: "Di çanda devkî de agahî ne bûyereke takekesî, bûyereke civakî ye. Ji ber vê yekê tu kes ji kesekî dîn ehmeq an jî zîrek nayê hesibandin. Efsane, çîrok û meselokên ji zarokan re di nav qebîleyê de tên gotin, agahî li derdora herkesî hişmendiyeke hevpar pêk tîne. Bi alîkariya herkesî mirov dikare bigihêje agahiyê."[9]

Li ser vê yekê nêrînên Pertev Naili Boratav ji yên Sanders zêde ne cuda ne. Nêrînên Boratav wisa ne : "Herçiqas berhemên aşiqan wek berên takekes bin jî, ew taybetiya wan ji berhemên hunermend û rewşenbîrên qedirbilind yên ku bi rêya belgeyên nivîskî gihaştine me, ji aliyê gelek taybetiyên xwe ve cuda ne. Ev berên ji ber ku di çanda devkî de pêk hatine, xurt bûne û bi hêmanên ragihandinê ango bi ragihandina devkî ya aşiqan ji nifşan derbasî nifşan bûne, piştî demekî takekesiya xwe wenda kirine."[10]

Li gor Sanders mirovên di nav çanda devkî de dijîn gelekî xwedî siûd in. Ji ber ku çanda devkî gelek tiştan hînî wan dike. Sanders vê yekê di pirtûka xwe de wisa tîne ziman: "Mirovên ku di nav çanda devkî de dijîn pir tiştan hîn dibin, xwedîyê gelek agahiyan dibin û dikarin van agahiyan bi kar bînin, lê belê vê zanyariyê ne bi teknîka 'xebat' a ku em dizanin pêk tînin. Ew vê yekê di têkiliya ku şagirtekî pir nêzikî hostayê xwe, bi rêya guhdarîkirinê, bi rêya dûbarekirinê, gotinên pêşiyan bipejirîne û bikaribe wan bi awayên cuda bîne ber hev, hin agahiyên ku qalibgirtî bi rêya têgihiştinê, bi têketina nava bibîranîneka giştî hîn dibin."[11]

Li ser mijara çanda devkî hima bêje nêrînên gelek lêkolîneran dişibin hev. Tev jî di behsa mijara çanda devkî de; tunebûna ceryanê, teknolojiyê, matbaayê û nivîsê derdixin pêş. Dema em li gor îro bifikirin herçiqas ev tunebûn û kêmasî ji bo

---

[8] Jack Goody, **Sözlü Kültür**, Milli Folklor, Ankara: 2009, Sayı 83, s. 129.
[9] Barry Sanders, ***Öküzün A' sı*, Elektronîk Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi**, çev. Şehnaz Tahir, İstanbul: Ayrinti Yayınları, 2013, s. 23.
[10] Pertev Naili Boratav, **100 Soru da Türk Halk Edebiyatı**, İstanbul: Gerçek Yayınevi, 1982, s. 23.
[11] Sanders, **h.b.** , s. 30.

berdewamkirina jiyana mirovan pir biqedir bin jî, bi saya avakirina çanda devkî, mirovan ji bo pêşerojê bingehek esas danîne. Ji ber vê yeke em dizanin ku çanda devkî ev bingeha xwe ne niha pêk anîye, ji xurtbûna wê jî diyar e ku dîroka vê bingehê pir kevin e.

Lêkolîner Selda Öztürk di teza xwe ya mastirê ya ku li ser dengbêjên jin yên herêma Wanê amade kiriye de balê dikşîne ser kevinbûna berên çanda devkî û vê yekê wisa tîne ziman: "Tê xuya kirin ku ji ber pêşveçûna guherînên civakî, çandî, aborî û polîtîk hin civak zûtir derbasî çanda nivîskî bûne, hin civak jî niha jî çanda xwe ya devkî didomînin. Digel vê yekê em dikarin bibêjin ku hemû çand bingeha xwe ji çanda devkî distînin; zanîn, danehev û tecrûbeya mirovatiyê ya bi hezar salan bi rêya vê çandê ango çanda devkî hatine neqil kirin. Berên çanda devkî di heman demê de ji bo metnên nivîskî yên di dîroka mirovahiyê de wek çavkaniyên ewil in."[12]

Li gor nêrînên li jor yên di derheqê çanda devkî mirov dikare bibêje, çanda devkî ji bo civakekî wek nan û av pêwist e. Ji ber ku çanda devkî bi rêya hêmanên xwe yên xweser bitaybetî wek çîrokbêj û dengbêjan çanda gel her tim xwedî dike, xurt dike û bi saya neqilkirina vê çandê ji bo dahatuyê, wê ji mirinê xelas dike.

### 1.1.2. Çanda Nivîskî

Wekî ku tê zanîn berê peyv û gotin hebûn ango nivîs tunebû. Lê belê piştî demekî nivîsê bi saya gûherînên di civakê de, pêşketina amûrên wek radyo, televizyon û înternetê li hemberî peyv û gotinê xwe gihand asteka bilind. Peyv û gotin ango çanda devkî herçiqas wenda nebu jî, li hemberî çanda nivîskî qels bû û gelekî li paş ma.

Li gor Walter Ong him berê him jî niha çanda devkî û çanda nivîskî bi hevre ne. Her du her tim alikarê hev in û tu car ji hev naqetin. Ong vê yekê wisa tîne ziman: "Di nav hemû derfetên bi saya nivîsê hatine de peyva ku tê dengdayîn niha jî cihê xwe digire. Metneka nivîskî ji bo ku mebesta xwe vebêje, rasterast an jî nerasterast divê bi dinyaya dengê ku dibe qada xwezayî ya ziman re têkîliyekê deyne… Nivîs tu caran têkiliya xwe ji keyfiyeta devkî nabire."[13]

---

[12] Selda Öztürk, **Kadın Kimliği Bağlamında Kültürel Bellek ve Van Merkezdeki Kadın Dengbêjliği Yansımaları**, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, İstanbul Teknik Üniversitesi SBE, 2012, s. 6.
[13] J.Ong, **h.b.** , s. 20.

Çewa ku ji nêrînên Ong tê fam kirin çanda devkî û ya nivîskî hem bi hevre hebûna xwe berdewam dikin û ji gelek alîyan ve jî di nav danûsitandinekê ne. Lê belê her dû jî li gor xwe xwedî hin taybetmendî û cûdahiyan in.

Li ser vê mijarê Tuğçe Erdal di teza xwe ya mastirê de nêrînên xwe wiha tîne ziman: "Cûdatiya herî girîng a di navbera çanda devkî û çanda nivîskî de ji beriya neqilkirina agahiyan, bi dest xistina agahiyan de xwe dide nîşan. Di çanda nivîskî de yek û yek jiberkirin bi gelemperî ji metnekî çêdibe û kesê ku jiberkirinê dike, dema hewce bibe dikare vegere û jiberkirina peyvê di metnê de kontrol bike. Ji berê lêkolînerên ku xwendin û nivisandina wan hebû, wisa tê digehiştin ku di çanda devkî de jiberkirin wek jiberkirina metnê ango wekî dûbarekirina peyvê ye."[14]

Ong, di pirtûka xwe de ya ku mijara wê çanda devkî ye nêrînên Ferdinand Saussure yên di derheqê nivîsê de wisa neqil dike: "Nivîs di heman demê de hem bikêr hem kêm hem jî xeternak e. Ji bo Saussure nivîs ne rêbazeka ji bo guherîna vegotina devkî ya ramanê ye, tenê ji perçeyeke ku axaftinê temam dike pêk tê." [15]

Ji lêkolînên li ser vê mijarê tiştê em fêm dikin li hemberî çanda devkî mezinkirina çanda nivîskî ewqas jî ne tiştekî di cîh de ye. Ji ber ku berhemên çanda nivîskî piraniya bingeha xwe jî ji berhemên çanda devkî distînin.

### 1.1.3. Dengbêj û Dengbêjî

Ji bo ku em van herdu têgehên zargotina kurdî ango dengbêj û dengbêjîyê baş fam bikin divê em di Edebiyata Kurdî de, lêkolînên ku li ser çand, zargotin, folklora kurdî û ferhengên kurdî de pênase û nêrînên ku di derheqê van her dû têgehan de hatine kirin binêrin. Pênaseyên li ser dengbêj û dengbêjiyê hatine kirin bêguman gelek in, em ê li jêr hinekan rêz bikin.

Dr Îzolî di ferhenga xwe ya bi navê 'Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî' de ji bo van her du têgehan wisa dibêje:"Dengbêj; hûnermendê deng, stranbêj. Dengbêjî jî hûnermendiya deng e."[16]

---

[14] Tuğçe Erdal, **Sözlü ve Yazılı Kültür Tartışmaları Açısından Fuzûlî Eserlerinde Varyatnlaşma**, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Bozok Üniversitesi SBE, 2013, s. 15.
[15] J.Ong, **h.b.** , s. 17.
[16] D.Îzolî, **Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî**, Köln: Weş. Deng, 1992, r. 111.

Di ferhenga ji aliyê Zana Farqînî ve hatiye amadekirin de, di derheqê van her du têgehan de pênase wisa ye: “Dengbêj hozanê gel, helbestvanê gel. Dengbêjî jî hozantiya gel, helbestvaniya gel e.”[17]

Di pirtûka Ziman û Edebiyata Kurdî ya di bin kordînatoriya Weqfa Dîrokê ya Tirkiyê ya bi alîkariya Komîsyona Yekîtiya Ewrûpa û Serkonsolosiya Swedê ya Stenbolê derketiye de pênaseya dengbêjiyê wisa dibore: “ Peyva dengbêj, di kurdî de ji kîteyên deng(ses) û bêj(söz) pêk tê. Peyva dengbêj jî ew kesê ku deng bi ahengekî bi kar tîne re tê gotin.”[18]

Li gorî Canser Kardaş di dengbêjiyê de mijarên sereke ev in: “ Şerên di navbera eşîran de, bûyerên dîrokî wekî şerên eşîr û desthilatdaran; bûyerên xwezayî yên wekî erdhej, lehî hwd;  evîn, jihevcudabûn, keçrevandin, vegotina çîrokên gel, bi awayekî ahangî pêkanîna hunera herêmî ya bi amûr an jî bêamûr; civaknasiya gel ya bi her awayî, anîna ziman erênî û neyiniyên civakê di berhemên xwe de, bi rêya gotinê neqilkirina adet û toreyan.”[19]

Remezan Alan di gotareka xwe ya bi navê “Dengbêj(î) û Helbesta Gelerî” de ji bo van her du têgehan wisa dibêje: “Derbarê dengbêj û dengbêjiyê de ferhenga me bi belaxatê tije ye. Dema ev peyv tên ser ziman, gotinên wek “lehengê çandeke qedîm”, “avakarê hişekî civakî”, “hosteyê peyvê”, “ hêza kelamê”, “dengê çanda bav û kalan li pey hev rêz dibin… Belê ev taybetiyên ha ji bo dengbêj û karê wî, carna ji belaxatekê wêdetir nebe jî, rast û durist in.”[20]

Hayrettin Ekinci di xebata xwe ya bi navê “Dengbêjî” de pênaseya dengbêjan wisa dike: “ Dengbêj; bi gotinên xwe, bi dengê xwe ku kesên kilam, strana dibêjin re tê gotin.”[21]

Mihemed Ava di xebata xwe ya li ser mijara dengbêjî yê de ji bo dengbêjan wisa dibêje: “ Dengbêj,  stûnên bingehîn yên jiyana kurdan e, dengbêj pirtûkên dîroka zindî ne… Dengbêjî bi jiyana gel ve girêdayî ye, ne şahî bê kilam dibe ne jî şîn.”[22]

---

[17] Zana Farqînî, **Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî,** İstanbul: Weş. Enstîtuya Kurdiya Stenbolê, 2010, r. 152.
[18] Çakar, Mehmet Sait, Fehim Işık, vd. , **Orta Öğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders kitabı**, İstanbul, Tarih Vakfı Yayınları, 2010, s. 45.
[19] Kardas, **h.b**, s.19
[20] Remezan Alan, **Dengbêj(î) û Helbesta Gelerî**, Kovara Wêje û Rexne, Diyarbakır, 2015, Hej. 4, r. 9.
[21] Hayrettîn Ekîncî, **Dengbêjî**, İstanbul:  Weş. J&J, 2013, r. 17.

Mehmed Uzun dengbêjan wisa dide nasîn: “Dengbêj kesê ku nefes û jiyanê dide deng, dengbêj ji deng kelam, ji kelamê kilam, ji kilamê jî stranê çêdike, dengbêj kesê hem dibêje û vedibêje ye.”[23]

Necat Keskin dengbêjî yê wisa pênase dike: “Dengbêjî di nav civaka kurdan de wek formeke veguhastinê cihekî sereke digire û îro ji hêla kurdan ve bêhtir wek formeke [netewî] tê nirxandin. Dengbêj kî ye? Çi dike? Dengbêj ew kese ku bi dengê xwe rih û can dide serpêhatiyên bere, û wan serpêhatiyan careke din bi denge xwê û carinan jî bi alîkariya bilûra xwe di hafîzeya çandî ya gel de zindî dike.”[24]

Lêkolîner Rohat Cebe di gotara xwe bi navê “Teknîka Melîzma û Dengbêjî” de ji bo dengbêjan û dengbêjiyê wisa dibêje: “Dengbêj, kesên bi salan êş, şahî, hesret, hêrsbûn, pesinandin, coş, evînên veşartî, lihevxistin, îxanet, mêranî û qehremanî, gul û çîçek, hesret, rewşa şer, berberî, penaberî, tenêtî bi kurtasî hemû hestên ku bi mirov ve girêdayî di bîra xwe de dihewîne û bi dengê xwe ve girêdide û di heman demê de çîrokbêjên xwedî bîreka xurt in. Dengbêjî jî bûyereke hûneri ye ku bingeha esas a çanda kurdan pêk tîne û civaknasiyê, feylesofiyê, edebiyata devkî, siyasete û mîsyoneka dîrokî jî di nav xwe de dihundirîne.”[25]

Zerî İnanç di pirtûka xwe ya bi navê “Denga Kurdan Di Radiyoya Erîvanê de”de ji bo dengbêjan wisa dibêje: “Sazbend û dengbêj profesyonel nebûn, jiyana xwe da neçûbûn studyo û mikrofon nedîtibun. Dihatin bi hostatî distiran û bêminet vedigeriyan cî-warên xwe. Ermenî, xebatkarên radyoyê ser karê civandin û dengnivîsandina stranên kurdî şaş û metal diman, carna jî hewsûdiyê lê dikirin.”[26]

Sibel Yiğittekin ji bo mijara dengbêjiyê wisa dibêje: “Dengbêjî hûnera deng e. Ji bo girêdana deng bi deng ve hewcedariya vê hunerê bi jîriyeke çalak û bîreka xurt heye. Dengbêjekî baş sitraneka ku li cihekî bihîstiye divê têxe bîra xwe, bi vesaziya qirika xwe û ji xwe jî hinek tiştan lê zêde bike û neqil bike cihê ku diçe. Ev performansa edebiyata devkî ya ku di nav kurdan de pir berbelav e; mirina gelen kurd, dawetên wan,

---

[22] Mihemed Ava, **Dengbêj Çirokên Kilaman Radyoya Erîvanê**, Ankara: Weş. Ar, 2016, r. 8.
[23] Mehmed Uzun, **Dengbêjlerim**, İstanbul: Weş. İthakî, 2012, s. 11-12.
[24] Necat Keskin, **Di Çarçoveya Teoriya Performansê De Nirxandina Vegotinên Gelerî,** Kovara Lêkolînên Kurdî yên Navnetewî, 2016. r. 51-66.
[25] Rohat Cebe, **Teknîka Melîzma û Dengbêjî**, Batman Üniversitesi Uluslararası Katılımlı Bilim ve Kültür Sempozyumu, Batman, 18-20 Nisan 2012, r. 1155.
[26] Zeri İnanç, **Dengê Kurdan Di Radiyoya Erîvanê de**, Stenbol: Weş. Weqfa Îsmaîl Beşikçi, 2016, r. 28.

evînên wan, cihêtiyên wan, hesretên wan, şerên wan bi kurtasî hestên wan yên bi cîh, xweza û bi mirovatiyê ve girêdayî tîne ziman."[27]

Çewa Yiğittekin jî aniye ziman dengbêj her tim di nav civaka xwe de ne, çi şîn be çi jî şahî be xwe tu car jê qut nakin. Tevlîbûna bûyerên di civaka xwe de, çareserkirina pirsgirêkên di civaka xwe de ji xwe re wek peywirekî dibînin. Ango di civakê de hestiyar û xwedî berpirsiyarî ne. Dengbêj bi saya vê yekê helbet ji bo hûnera xwe jî gelek amûran berhev dikin û têxin tûrikên xwe ango bîra xwe.

Sedat Ulugana vê yeke wisa tîne ziman: "Wekî ku tê zanîn dengbêj kesên gerok in. Ji bo ku hûnera xwe bi awayekî xurttir pêk bîne divê li deverên cuda bigere û bi ketine têkiliya bi kes û civakên cuda re hin çîrokan û bûyeran bibine."[28]

Peyvên çîrokbêj û dengbêj di civakê de pir caran di şûna hev de jî tên bi kar anîn. Herçiqas wateya van her dû peyvan cûda be jî, peywîra wan û berpirsiyariya wan a di nav gel de bêgûman pir nêzîkî hev e. Ji ber ku her du jî çavkaniya xwe ji heman cihî ango ji çand, dîrok, adet û zimanê gel distînin.

Ji bo çîrokbêjan Walter Benjamin wisa dibêje: "Çavkaniya hemû çîrokbêjan tecrûbeyên ku bi rêya dev ango gotinê tên neqilkirin in. Di çavê gel de çîrokbêj ew kesên ku ji dûr ve tên in. Kesên ku ji dûr ve tên tiştên van yê ku yê vebêjin hene. Lê belê guhdarkirina kesên ku li mala xwe ne, binamûsa xwe debara xwe dikin û di mijara adet û çîrokên herêma xwe de serkeftîne jî bikêf e."[29]

Dema mirov baş li vê şîroveya Benjamin a ku ji bo çîrokbêjan dinêre birastî jî mirov dikarê heman tiştî ji bo dengbêjan jî bibêje. Ji ber ku çewa me li jor jî anî ziman dengbêjan jî wek çîrokbêjan bi rêya gotinê tiştên ku di nav gel de berhev kirine û xistine tûrikên xwe ji bo nifşên dahatuyê di bîra xwe de diparêzin û dema civatek gûncav dibînin, van tecrûbeyên xwe bi gel re parve dikin.

Piştî pêşkêş kirina pênaseyên ku ji bo dengbêj û dengbêjîyê hatine kirin, em dikarin bibêjin ku dengbêj ew kese ku bi saya bîra xwe ya xurt, çand, adet û kevneşopiyên gelê xwe bi rêya hûnera xwe û tevlî tecrûbeyên jiyanê yên ku him li

---

[27] Sibel Yiğittekin, **Allah Hiçbir Kavmi Dengbêjsiz Bırakmasın**, Popüler Kültür Esmer Dergisi, 2006 sayı 22, s. 19.
[28] Sedat Ulugana, **Dengbêjler Şahı Reso,** Kürt Tarih Dergisi, 2016, sayı 26, s. 41.
[29] Walter Benjamin, **Son Bakışta Aşk**, sun. Ve hzl. Nurdan Gürbilek, İstanbul: Metis Yayınları,1995, s. 78.

herêma xwe him jî bi rêya gera li herêmên cuda bidestxistî tîne ziman. Dengbêjî jî ew hunera ku ji aliyê dengbêj ve bihostatî, bicoş tê kirin û dibe sedemê aramî û hevgirtinê di nava gel de.

### 1.1.4. Di Civakê De Rola Dengbêjiyê

Ger em bifikirin ku niha çiqas di jiyana mirovan de pêwistiya hêmanên teknolojîk ango telefon, radiyo, televizyon û înternetê heye û hima bêje jiyana mirovan bi van amûran ve hatiye girêdan. Nifşên niha xwe di nav jiyanek ferazî û dijital de dîtin û bi vê jiyanê ve hatin girêdan. Helbet demên berê ev yek newisa bû. Em dikarin birehetî bibêjin peywira van amûrên teknolojik hin adet û toreyên civakî yên wek dawet, dîlan, lîstik, şevbuhêrkan digirt.

Lehengên sereke yên van hêmanan jî bêguman çîrokbêj û dengbêj bûn. Dengbêjan bi dengê xwe yên xweş ew civata ku diketin navê sermest dikirin û bi rêya bîra xwe ya xurt bi kilam û sitranan mejiyê mirovan ronî dikirin, agahiyên şîlo yên di serê wan de jî zelal dikirin. Ango di heman demê de bi dengê xwe bi vê hûnera xwe civak perwerde jî dikirin.

Sedat Ulugana di gotara xwe bi navê “Tradîsyon û Duajoyên Evdalê Zeynikê de” ji bo peywîra dengbêjan a di civakê de wisa dibêje: “Yên ku Edebiyata Kurdiya devkî pêş xistine û parastine jî dengbêj bixwe ne. Ji bilî vê mîsyoneka wan a din jî heye ku wan Edebiyata Kurdî ya devkî heya îro anîne.”[30]

Birastî jî berê dengbêjan di civaka xwe de cihekî gelekî girîng digirt, haya civakê jî ji vê yeke hebû û gelekî qedir didan dengbêjên xwe. Mehmed Uzun vê yekê wisa tîne ziman: “Her civakek, her gundek, her eşîrek, her malbatek mezin, her begekî navdar, axa û serokê eşîran xwedî dengbêjekî bûn. Dengbêj sedemê pesinandina civakan û eşîran, deng û nefesa dîwanan bûn. Began, serokên eşîran bi dengbêjên xwe re şanaz dibûn û ji bo ku dengbêjên wan û yên eşîrên din werin li hemberî hev kilaman bibêjin dîwan li dar dixistin. Herkesî dizanibû ku dengbêj bêzerer in. Dizanibun ku tenê karê wan kilam û çîrok in. Ji ber vê yekê derî tev ji dengbêjan re vekirîbun, herkesî wan dihewand, guh didan deng û kilamên wan.”[31]

---

[30] Ramazan Pertev, **Edebiyata Kurdî ya Gelerî**, Stenbol: Weş. Avesta, 2015, r. 162.
[31] Uzun, **h.b**, s. 28.

Dengbêj ji ber ku her tim di nav civakê de ne û ew jî wek herkesî ji bo debara xwe karên civakî dikin û ji aliyê gel ve gelek tên hez kirin. Piraniyên wan ji aliyê aborî ve xîzan in. Lê digel vê xîzaniya xwe ji ber mîsyona wan a dengbêjiyê gelek mutewazî ne. Ango em dikarin bibêjin dengbêj jiyana ku ew bixwe jî dijîn dikin çîrok û dibêjin.

Fırat Taş di gotara xwe de vê yekê wisa tîne ziman: "Dengbêj dema ku hûnera xwe pêşkêş dikin ew bixwe jî çîroka ku dibêjin dijîn û li der dora xwe jî didin jiyandin. Ji ber vê yekê guhdarvan her cara ku kilam tên gotin dibin bandora wê de dimînin û mijara dîrokî ya kilamê dubare bibîr tînin, ev yek jî dibe sedemê bihevgirtina mirovên ku êşên wan hevpar in."[32]

Di civaka kurdan de ji ber hin sedeman çanda nivîskî pêşneketiye. Ji ber ve yekê peywîra parastina çand, ziman û gelek hêmanên din yên zargotina kurdan bi rêya çanda devkî ango dengbêjan hatiye parastin û xwe gihandine dema me.

Hayrettin Ekincî vê yekê wisa tîne ziman: " Dengbêjiya Kurdan bi kilam û stran, di jiyana civakê de jiyaneke herî pêşketî ye. Bi sed salan e tenê dengbêj bi zimanê xwe yê dayikê kilaman dibêjin, çîroka dibêjin. Ziman û çîrok bi kilamên wan li ser lingan mane."[33]

Di pirtûka "Folklora Kurmanca" ya ji aliyê Emînê Evdal û Heciyê Cindî ve hatiye amade kirin de tespîtên gelek hêja yên li ser girîngî û hewcedariya çîrokbêjî û dengbêjiyê hatine kirin. Yek ji wan tespîtan jî ev e:

> "Zarbêjî, çîrokbêjî, dengbêjî jiyana gel ve girêdayîne û wek hewa, nan û avê her dema jê ra pêwist in. Gelê kurd çîrokbêj û dengbêj e. Dîwanên mîr û hakiman, odên gundan time ciyê çîrokbêj, dengbêj, aşiq û dewrêşan bûne. Ne şînê kurdan bê zarbêjî dibin ne jî şayî… dema tenêbûnê kilam kurd ra heval e. Civaka kurdî bê kilam û dîlan, mesele û metelok, laqirdî û henek nameşe. Dema evîntiyê hogirê herî dilsoz kilam e, dema bêgumaniyê kilam guman e. Dayîk bi kilaman lorandinê zarokên xwe şa dibin, bi çîrok û kilaman zaroka radizînin. Bi kilaman bûka siyar dikin, bi kilaman mêrxwesên xwe dişînine ber şer, heta bi kilaman miriyên xwe verê dikin. Şivan bi kilam û bilûrê kerê xwe diçêrînin, cotkar bi kilaman xeta cotê xwe li ser axê dikişinin,

[32] Fırat Taş, **Bir Sözlü Gelenek Olarak Dengbêjlik ve Tarihi Anlatımı**, Kürt Tarih Dergisi, 2016 İstanbul, sayı 27, s. 37.
[33] Ekîncî, **h.b.** , r. 33.

kilam xerîb ra dilbînî ne, ew kilaman agirê hisreta dile xwe ker dike. Kurd bi kilaman laqirdiya dikin, bi kilam dikenin, bi kilama digrîn."[34]

Zerî İnanç di pîrtûka xwe a bi navê "Dengê Kurdan Di Radyoya Erîvanê de" ji bo girîngiya muzîkê ango dengbêjiyê di civaka kurdan de van tespîtan dike: "Kurd ji zikmakî ve dengbêj û hunermend in. Derdên xwe, birînên xwe, şahî û şînen xwe bi rêya muzîkê anîne ziman, Kurdan bi rêya muzîkê xwe parastine, muzîk ji kurdan re tenê ne çek di heman demê de li hemberî rimên dagirkeran bûye mertalek jî."[35]

Şerefxan Cizîrî jî ji bo dengbêjan wisa dibêje: "Dengbêjên ku şahide dema xwe bûn, diviyabû serpêhatiyên gelên xwe, mêrxwasî û xayîntiya di nava mirovan de, derbasbûna gelî ya dîrokî, şerê navxweyî, evîna trajedîk, bûyerên girîng di dîroka gel de, nasnama grûb û kesên xwe, şerê gruba xwe bi grûbên din re û hwd, bîanîba ser zimên."[36]

Qedrê çanda dengbêjiyê di dema me de mixabin wek demên berê nemaye. Di navbera dengbêjên berê, dengbêjiya berê û ya niha de gelek cûdahî hene. Helbet bandora pêşketina amûrên wek teknolojî, radiyo, televizyon û înternetê jî gelek e. Lê belê ji xeynî van sedeman gel bi xwe jî di vê mijarê de nankor e. Ji ber ku mirovan mixabin tiştên dengbêjan ji bo gelê xwe kirine zû jibîrkirine û niha ewqas jî li dengbêjên xwe û çîrokbêjên xwe xwedî dernakevin. Piraniya dengbêjên ku niha li jiyanê ne ji vê rewşê gilîdar in. Ji aliyekî din ve jî li gor demên berê piraniyên dengbêjên niha xîzan in û rewşa wan ya aborî gelekî nexweş e.

Roger Lescot di pirtûka xwe ya bi navê "Memê Alan" de di derheqê vê mijarê de wisa dibêje: "Hunerê dengbêj li ber hilweşînê ye. Ewên ku îro vî navî, amatorên dengbêjiyê ne. Yanê çi eleqeya van tune bi wan kesan re ku dengbêjî ji bo wan meslekek bû û bi xwe di bin xizmeta mîr an jî serokeşîrekî de bûn. Ev dengbêjên ku heta berî demeke nêzîk jî bûn, piraniya destan û stranên kurdî ji ber dizanibûn, di ser re jî eger car caran hin gotin nehatana bîra wan, xwedî wê qabiliyetê bûn ku tavilê gotinên nû biafirînin."[37]

---

[34] Emînê Evdal, Heciyê Cindî, **Folklora Kurmanca**, İstanbul: Weş. Avesta, 2008, r. 23-24
[35] İnanç, **h.b.** , r. 78.
[36] Şerefxan Cizîrî, **Edebiyat an jî Kultura Devkî**, Kovara Nûdem, 1999, hej 29, r. 41
[37] Roger Lescot, **Memê Alan**, İstanbul: Weş. Avesta, 2010, r. 8.

## 1.2. LI HERÊMA XERZANÊ DENGBÊJÎ

Berî ku em behsa dengbêjiya herêma Xerzanê bikin divê em biçekî behsa erdnîgariya herêmê jî bikin. Ji ber ku Xerzanê ji aliyê erdnîgariya xwe ve cihekî girîng e. Bitaybetî di nav herêmê de beşa ku wek ‘Deşta Xerzanê’ tê binavkirin, li ser navenda rojhilat û rojava hatiye ava kirin. Ji demên berê ve û niha jî bi saya rêgeha xwe ya girîng ji bo bazirganiyê û aboriyê jî bûye qadek bêhempa.

Li ser Herêma Xerzanê mixabin çavkanî kêm in. Zeynelabidîn Zinar, ji ber ku ew bixwe jî ji vê herêmê ye, li ser çand û foklora vê herêmê jî gelek xebat kirine. Zinar di pirtûka xwe ya bi navê “Jînewariya Derwêşê Sado” de wisa behsa sinorên herêma Xerzanê dike:

> “Cihê ku niha Eşîra Pencînaran lê cîwar e, Çiyayê Gurdilan û Deşta Xerzanê e. Ew herêma ku bi navê Deşta Xerzanê tê binavkirin, behnava wê weha ye: Ji binê bajarê Hezo dest pê dike û berûber bi Çemê Xerzanê re ber bi başûr ve dikişe, rast çûye di keviya herêma Reşkotan re dibihûre û li binê bajarê Qubînê berê xwe daye Rojhilat û çûye di Ridwanê re derbas bûye, gihaye ser keviya çemê Dicle û Botanê. Ji wirê bigir ber bi bakûr ve di quntara çiyayê Reşan re çûye xwe gehandiye herêma Babosiyê û dîsa ber bi Rojava ve çûye gehaye binê bajarê Hezo keviya çemê Xerzanêê.”[38]

Tahir Eren jî di pirtûka xwe ya bi navê “Cemîlo Çeto û Serhildanên Herêma Xerzanê” de wisa behsa sinorên erdnîgariya Xerzanê dike:

> “Sinorên Xerzanê Ji Bakûrê çiyayê Mereto ve heya Güroymak[Nurşin] ê, ji wir Tetwanê, ji Hîzan digihêje heya çemê Botan. Ji çemê Botan ji aliyê Başûr ve li Tilê ya Navro digihêje çemê Dicleyê. Ji çemê Dicle yê ji aliyê Rojava ve digihêje çaya Batmanê, ji çaya Batmanê jî xwe digihîne çiyayên Sasonê. Sê aliyên Herêma Xerzanê ji aliyê çeman ve hatiye dorpêç kirin. Li aliyê Rojhilat çemê Botan, li aliyê başûr çemê Dîcleyê û li aliyê rojava jî çaya Batmanê heye.”[39]

Çewa ku ji agahiyên li jor jî diyar dibe herêma Xerzanê gelekî berfireh e. Hin navçeyên Batmanê û Bedlîsê jî dikevin nav sînorê vê herêmê. Dengbêjên ku me bi wan re hevpeyvîn kirin û jiyana wan jî bikurtasî li jêr daye tenê ji herdu navçeyên Sêrtê; Misirc[Kurtalan] û Hawêl[Baykan], gund û beldeyên girêdayî van navçeyan hilbijartin.

---

[38] Zeynelabidîn Zinar, **Jînewariya Derwêşê Sado**, Stenbol: Weş. Ajans Nas, 2011, r. 21.
[39] Tahir Eren**, Cemîlê Çeto û Serhildanên Xerzanê**, Diyarbekir: Weş. J&J, 2016, r. 13.

Piştî danasîna Herêma Xerzanê û agahiyên di derheqê erdnîgariya wê de, divê em behsa dengbêjiya herêmê bikin. Hêrema Xerzanê di dîrokê de bûye qada gelek şer û pevçûnên di navbera eşîrên herêmê û dewleta Osmanîyan, herwiha şerên di navbera eşîran de jî qewîmîne li vê herêmê pir in. Ev yek bûye sedemê ku dengbêj di berhmên xwe û kilamên xwe de zêde cih bidin van mijaran. Bitaybetî Şerê Melha û şerê Sasonê ku di navbera Xerziyan û Osmaniyan de qewimîne û gelek şerên dijwar in, ev şer ji kilaman re bûne mijarên sereke. Wek mînak şerê Melha di kilamên dengbêjan de wisa dibore: "

*Payîze li zozana berfê lê kir*

*Qasim Axa emir dabû Eşîra giran,*

*Mala rakir, koç bi rê kir…*

*Berê xwe da deşta Xerza, qesta banê Eyndarê kir*

*Qasim axa tevlî sed suwarî hucûmê ser Zoqê kir*

*Kete daîra Ebdurrehman Paşa*

*Serê Ebdurrehman Paşa û dozde mufetîşan di ber de jê kir…*"[40]

Li gor gotinên Zeynelabidîn Zinar, di vê kilamê de behsa şerê Eşîra Pencînariyan û Osmaniyan tê kirin. Qasimê Osman serokê Eşîra Pencînaran bû. Ebdurrehman Paşa jî serbazekî Osmaniyan bû. Wê demê Zoq jî li herêmê navenda mîrektiya Xerzanê bû. Ev bûyer li wir diqewime.

Nezîrê Cibo, di pirtûka xwe ya bi navê "Di Dîroka Kurdan de Pencînarî û Xerzanê" de wisa behsa dengbêjiya herêmê dike: "Çanda Dengbêjiyê ya civaka Kurdan ku hêmaneka çanda muzîkê û edebiyata devkî ya herî girîng e, li herêma Xerzanê gelekî dewlemend û berbelav e. Buyêrên girîng yên dema berê qewimîne, lihevxistin, tekoşîn, destanên qehremaniyê yên Bişarê Çeto, Cemîlê Çeto û yên kesayetên eşîrên din, bûyerên qewimîne, çîrokên evînî piranî ji xwe berê bi rêya stranan tên ziman."[41]

Wekî ku Nezîrê Cibo jî behs kiriye dema behsa herêma Xerzanê dibe bêguman ewil kesayetên dîrokî yên wek Bişarê Çeto û Cemîlê Çeto tên bîra mirov. Her du jî di

---

[40] Zinar, **h.b.** , r. 36.
[41] Nezîrê Cîbo, **Kürt Tarihinde Garzan ve Pencinarîler**, İstanbul: İBV Yayınları, 2016, s. 229-230.

dîroka Kurdan û Xerzanê de du kesayetên girîng in. Serpêhatiyên wan di gelek kilamên dengbêjên herêma Xerzanê û herêmên din de cih girtine. Zeynelabidin Zinar di pirtûka xwe de wisa behsa wan dike:

> "Dibêjin ku Bişarê Çeto mirovekî pir zana, bîrewer, zîrek û tijîfehm bûye. Herweha ew mirovekî kurdperwer, adil, xwenas, mirovnas, mirovperwer û nefsibiçûk bûye. Tu carê wî cewr û niheqî nekirine, hertim qencî û mirovatiyê meşandiye. Lê piştî ku Bişarê Çeto bûye axayê Pencînaran, hertim wî û leşkerên Împeratoriya Osmanî şer kirine û gelek caran lihevûdû xistine… Li gor gotinan, Cemîlê Çeto, zilamekî pir delal, lihevhatî, edilî, spehî û lewend bûye. Herweha peyayekî kej, çavkesper, simbêlpanik, bejnkurt, stûr û dagirtî bûye; beşera wî xweş, hertim devliken û xeberxweş bûye. Herweha gelekî bi rehm, camêr, nandayî, xeberxweş û comerd bûye."[42]

Dengbêj Salihê Qubînî kilama gelerî ya bi navê "Silêmanê Mistê" de him behsa herêma Xerzanê him ji behsa her heft bavikê Pencînaran û Cemîlê Çeto dike û vê yekê wisa tîne ziman: "

…

*Cemilê Çeto bavê Feremez di Qesra Eynqesrê de runîştin*

*Şewr û mişêwireteke giran danîn*

*Lê qirara kuştina silêmanê Mistê*

*Bavê Xelîl Gula mala Dibo lawo bi xwe re hilanîn*

*Xwe berdaye Deşta Xerzanê dayê bi giranî*

*Ewî qîrekî dabû li Mûsikan, li Weliyan, li Kejikan*

*Li Ferxikan, li Terxaniyan, li Miradan, li mala Şemdîn*

*Li heft bavê Pencînaran xwe berdane deşta Xerzanê"*[43]

### 1.2.1. Danasîna Çend Dengbêjên Herêma Xerzanê

Di vê beşê de me xwest em bi kurtasî hin dengbêjên sereke yên herêmê jî bidin nasîn. Lê belê wekî me li jor jî diyar kir herêma Xerzanê gelekî berfireh e. Lewra derfet tuneye ku em behsa tevahiyên dengbêjên herêmê bikin. Me dengbêjên ku jiyana wan li

[42] Zinar, **h.b.** , r. 29-30.
[43] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 20.03.2018.

jêr daye ji Misirca navçeya Sêrtê û beldeya Zoqeydê ku ew jî girêdayî Misircê ye, bajarokê Comaniyê ku girêdayî navçeya Sêrtê ya binavê Baykan hilbijartin.

Ji bo di derheqê dengbêjên ku me hilbijartin de em agahiyên rast û zelal peyda bikin me bi dengbêjên ku li jiyanê ne re rû bi rû hevpeyvîn kirin. Tenê Xalitê Xerzî ji ber ku nexweş bu, derfet çênebû ku em pê re hevpeyvînê bikin. Agahiyên di derheqê wî de em jî antolojîya dengbêjan û xwarziyê wî dengbêj Ebûzerê Misircî hîn bûn. Ji xeynî yên ku li jiyanê me behsa çend kesên wefat kirine jî kiriye. Li jêr jiyana heşt dengbêjan hene. Ji van dengbêjan Dengbêj Recêyê Sihî û Dengbêj Nazî Beg wefat kirine. Dengbêjên din jî yên ku me bi wan re hevpeyvîn kirine û jiyana wan li jêr e ev in: Dengbêj Teyîboyê Sehertî, Hisamedînê Zoqeydî, Mihemed Eliyê Comanî, Emerê Xatê, Xalitê Xerzî û Dengbêj Ebûzêrê Misircî.

Ji xeynî van dengbêjan helbet li herêmê hin dengbêjên din jî hene. Lê belê ji bo mijara me zêde belav nebe me xwest ku em behsa yên sereke bikin. Wek mînak Derwêşê Binovî jî dengbêjek navdar e ku di herêmê de tê naskirin. Temenê wî li dora heştêyîye û niha jî li Misircê dijî. Hevpeyvînek kurt me bi hevre kir lê belê di derheqê dengbêjiyê de me tu agahî jê nesitandin.

Di hevpeyvînê de dema me di derheqê dengbêjiyê de pirs jê kir, wî wisa bersiv da me: “Ez di derheqê dengbêjiyê de tu tiştî nizanim, lê belê li ser mijarên olî tu çi dixwazî dikarî ji min bipirsî.”[44] Ji gotinên wî diyar dibe ku dev jî dengbêjiyê berdaye û di vê mijarê de naxwaze biaxive. Nezîrê Cibo jî di berhema xwe ya ku ji lêkolînên li ser herêmê pêk tê wisa behsa Derwêşê Bînofî kiriye: “Derwêş di van salên dawî de ji ber telqînên şêxên herêmê tobe kiriye, bi hinceta ku dengbêjî ji aliyê dîn ve ne caiz e dev ji dengbêjî berdaye.”[45]

#### 1.2.1.1. Nazî Beg (1914-1992)

Dengbêj Nazî Beg, apê dengbêj Salihê Qubînî ye û li gor gotinên wî, di warê dengbêjiyê de Salihê Qubînî di bin bandora wî de jî maye. Herçiqas di derheqê jiyana wî dengbêjiya wî de zêde agahî tune jî me xwest ku behsa wî jî bikin. Ji ber ku Nazî Beg, ne li jiyanê ye, agahiyên di derheqê wî de em ji kurê wî Enver Yorulmaz hîn dibin. Kurê wî di derheqê jiyana wî de van agahiyan dide me: “Di nasnameyê de navê wî

[44] Derviş İleri, Dengbêj, “Li ser mijara dengbêjiyê”, Misirc, 17.05.2018.
[45] Cîbo, **h.b.** r. 230.

Nazim Yorulmaz e. Li gundê Eyndarê ku girêdayê Misircê ye hatiye dinyayê. Ji begên Bêkendê ye. Di nav gel de wek " Nazî Beg" dihate nas kirin. Di sê saliya xwe de bavê wî wefat kiriye. Piştî wefata bavê xwe çûye gundê Gozelderê li cem apê xwe Hamê mezin bûye. Temenekî ciwan de ji apê xwe jî veqetiyaye û piştî li gelek gundên wek Bîmêrê û Xatma jî maye. Dema li gundê Xatma bu li saziya TPO(Ofîsa Petrola Tirkiyê) yê dest bi kar kiriye.

Di bîst saliya xwe de zewicî ye. Pênç kur û du keçên wî hene. Bi awayekî çalak zêde dengbêjî nekiriye. Lê bele di ciwaniya xwe de di şevbuhêrkên gundan, dawet û dîlanan de gelek caran kilam gotine. Band û cd yên wî yên fermî tune ne. Dengbêjê navdar Salihê Qubînî biraziyê wî ye û ji aliyê dengbêjiyê ve di bin bandora wî de maye û jê kilam jî girtine."[46]

### 1.2.1.2. Teyîboyê Sehertî (1933- …)

Di derheqê jiyana dengbêj Teyîboyê Sehertî de di antolojiya dengbêjan de ev agahî hene: "Li gundê Zêwikê ku girêdayî navçeya Sêrtê, Misircê hatiye dinê. Navê wî yê di nasnameyê de Tayyip Taymaz e. Di sala 1940' î de malbata wî koçî gundê Seherta dike. Dibistan nexwendiye. Bi eslê xwe ji navçeya Bedlîsê, Motka [Mutki] ye. Ji eşîra Babosiyan e. 25 salan li gundê Seherta dimîne. Di sala 1970'yî de mala xwe bar dike diçe gundê Marîbê û du salan li wir dimîne. Di sala 1973'an de koçî bajarê Sêrtê dike û li wê derê wekî karker dikeve saziya avadaniyê. 12 salan li Sêrtê dimîne û careke din sala 1985'an de vedigere gundê Marîbê Du caran zewicî ye. Ji deh saliya xwe ve stranan dibêje û dengbêjiyê dike. Gelek stranên ku wî bixwe çêkiriye hene. Di salên dawîn de qesîdeyan çêdike û distrê. Di nava gel de gelek kasetên wî hene."[47]

Dengbêj Teyîbo ji aliyê dengbêjiya xwe ve pir di bandora bapîrê xwe û bavê xwe de jî maye. Ji ber ku her du jî dengbêj bûn. Di hevpeyvîna me ya ku me bi hev re kirî de li ser vê yekê Teyîbo wisa dibêje:

> " Bapîrê min ku navê wî Muaz e, dengbêjê Fettah Paşa bû. Him wekîlê wî him jî dengbêjê wî bû. Bavê min Faris jî dengê wî pir xweş bu, kilamên pir xweş digotin. Niha jî hin kilamên wî bi min re hene û ez carna dibêjim. Min piranî kilamê şeran digotin. Ji ber ku di dema me de li herêma me şerên pir giran çêdibun, xasma jî ev kilam di navbera eşîran de bûn. Lê belê

[46] Enver Yorulmaz, Karmend, " Li ser Dengbêj Nazî Beg", Kurtalan, 20. 08. 2018.
[47] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antolojiya Dengbêjan,** c.1, Stenbol: 2007 s. 402.

ji ber ku kilamên me dîsa nebin sedemê şerekî din di navbera malbatan û eşîran de me piranî ev kilamên xwe yên şeran li derveyê herêmê digotin. Wek mînak dema em diçûn herêma Serhedê, di divanên wan de me digotin, wan jî ev kilam pir diecibandin û ji me digirtin û digotin. Kilamên herêma Xerzanê li Serhedê pir dihatin ecibandin û biqedir bûn.”[48]

Dengbêj Teyîbo digel gotina gelek kilamên anonîm, wî bixwe jî gelek kilam çêkirine û di nav gel de gotine. Kilamên wî çewa ku me li jor jî anî ziman hem li herêma Xerzanê hem jî li gelek herêmên Kurdan û derveyê welat jî belav bûne. Em ê wek serenav hinek berhemên wî pêşkêş bikin û wek nimûne kilameka wî jî li jêr parve bikin.

Li gor dengbêj Teyîbo kilamên wî yên sereke ev in: “Silêmanê Mistê, Şerê Baximsê, Şerê Xelîlê Simê û Ehmed, Xal û Xwarzî (Teyar û Derwêş), Şerê Hamûdê, Bişarê Çeto, Mûsê Meleka, Resûlê Zave, Evdilê Îso, Bavê Elî Beg, Seyrê û Biro, Erebê Feto, Şêxo û Meyro, Ji Wanê Têm Gundekî Çi Mezin e, Zerê, Kolosê Ako, Kilama Mêşa.”[49] Kilama wî ya bi binavê “Kolosê Ako” li jêr e.

Lê hayê, hayê hayê hê hayê

Fatma digo: Koloso lawo sibe ye,

Ez ê bi diyarê Şemza bavê Misto diketim di kortê de lewo rê di gun de

Fitimê digo: lo lo Koloso lawo sibe ye, ez ê bi diyarê Şemza bavê Misto diketim,
Di kortê de lawo di gund de.

Mi dî Osmanê Emer bavê Wezîr gamêşê qerboz, ji mal siwar bû lawo canikî sê salî

çakî beşî nêr di bin de

Hato li dîwana Kolosê Aqo bavê Bişar mîrê zirav sekini lawo

Li mil hebû ebakî Hezoyî berdaye ser saqa gizmê paniya ling da

Mi dî selamekî li Dîwana Kolosê Aqo bavê Bişar mîrê zirav werda

Topa alemê hazir rabû ji ber da

Kolosê Aqo bavê Bişar mîrê zirav tenê enîşkê berdaye ser baliyê

[48] Tayyip Taymaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Kurtalan, 22.04.2017.
[49] Tayyip Taymaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Kurtalan, 22.04.2017.

Nazbaliyê şamqutnî lo lawo çima ranabî ji ber da

Fatimê digo: Koloso lawo ne carek mi digo ti bere xwe nedî Osmanê Emer

Ji dilê bavê Wezîr dernayê heyfa Gaza Şorikê Çemê Delav warê şex e hilda

Kîna Osmanê Emer kîneka kevn e lawo, mînanî birîna ku ragire ji bin de

Lê derbeka wê bide bejna bala Kolosê Aqo bavê Bişar mîrê zirav

Bi deste xwe bistîne heyfa Gaza Şorikê Çemê Delav kula Osman Mihê ma di dil da lê hayê, hayê hayê hê hayê hayê

Fatimê digo: Koloso lawo ne carek mi digo ti bere xwe nedî Osmanê Emer

Bêberiya bavê Wezîr ji te nayê

Mi zanibû roja ti bere xwe bidî Osmanê Emer bavê Wezîr

Dê wê rojê sivnê bavê min biqedînî hey lawo ji dinayê

Fatma digo: Koloso lawo sibe ye,

Ez ê bi diyarê Şemza bavê Misto diketim di kortê de hayê li berî kaşa

Tilî û pêçiyê Osmanê Emer bavê Wezîr gamêşê qerboz dara navê ji

Gustîla lawo sê pa ji qaşa

Fatimê digo: Koloso lawo ne carek mi digo ti bere xwe nedî Osmanê Emer

Ji dilê bavê Wezîr dernayê heyfa Gaza Şorikê Çemê Delav lula Osmanê Mihê roja çar aşa..."[50]

#### 1.2.1.3. Emerê Xatê (1955- …)

Di derheqê jiyana dengbêj Emerê Xatê de di antolojiya dengbêjan de ev agahî hene: "Emerê Xatê di sala 1955'an de li gundê Baciriyê yê bi ser navçeya Gurdilan/Misircê ya Sêrtê ji dayîk bûye. Ji heft bavikên pencînariyan ji weliyan e. Ajovaniya kamyonê kiriye û bi kamyonê çûye Îran, Iraq, Kuweyt, Urdûn û Erebistana Sîudî. Piştî ku di sala 2004 an de di qezayeka trafîkê de linge wî şikestiye, dev ji

[50] Ava, **h.b.** , r. 132-133.

ajokariya kamyonan berdaye. Ji 17 saliya xwe stranan dibêje. Ji bavê xwe dengbêj Hesenê Emer fêrî stranan bûye. Kaseteke wî belav bûye. 5 keç û 2 kurên wî hene."[51]

Di antolojîya dengbêjan ya ku ji aliyê Şaredariya Amedê ve hatiye amadekirin de digel jiyana Dengbêj Emerê Xatê du kilamên ku ev dibêje jî li bin jiyana wî hatine dayîn. Em ê jî yek ji wan kilaman ku bi navê "Were Domam" e li jêr pêşkêş bikin.

"Were Domam

Were domam were domam were domam

Sing û bere te spî ne, berfa çiyakê zoman,

Ez ê rabim destê domama xwe bigrim birevînim bavêm nava eşîr û koman

Way de domamê wî de domamê, wî de domamê,

De rabe zerî kubarê, wî dil evîndarê

Wahêêêêêê,

Domam heyran nizanim navê domama min ê çi ya?

Domam heyran nizanim navê domama min ê çiya?

Bejna domama min bilind e, ela bestê Çiyayê Şengalê Êzîdiya

Ez ê rabim herim domama xwe yê ji apê xwe bixwazim,

Heke apê min domama min nedî min,

Ez ê destê domama xwe bigrim birevînim bavêm ser dewletê ecnebiya,

Way de domamê wî de domamê, wî de domamê,

De rabe zerî kubarê, wî dil evîndarê,

Wahêêêêêê.

Domam heyran navê domama min Gulsin e

Domam heyran navê zerî domama min Gulsin e,

[51] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan,** c.3, Stenbol: 2007 s. 188.

Şewq û şemalê xwe daye Ziyaboka serûbin e,

Ez ê rabim herim domama xwe yê ji apê xwe bixwazim,

Heke apê min domama min nedî min,

Ez ê bejim apo tu qatilê serê min î,

Way de domamê wî de domamê, wî de domamê,

De rabe zerî kubarê, wî dil evîndarê,

Wahêêêêêê.

Domam heyran ava çemê me şerbet e,

Domam heyran ava şetê me şerbet e,

Xwedê pêla navê ser diket e,

Revandina qîz û xorta li kambaxê gundê me adet e,

Wele ya min û zerî domama min tenê eyb û şerm û fedî û qebehet e,

Way de domamê wî de domamê, wî de domamê,

De rabe zerî kubarê, wî dil evîndarê,

Wahêêêêêê.

Domam heyran navê domama min Xêlya ye,

Domam heyran navê zerî domama min xêlya ye,

Bi Xwedê gul û rîhana nav bexça ye,

Îro sê roj çavê xwe digerînim, nagerînim nexuya ye,

Way de domamê wî de domamê, wî de domamê,

De rabe zerî kubarê, wî dil evîndarê,

Wahêêêêêê."[52]

---

[52]Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan,** c.3, Stenbol: 2007 s. 191.

### 1.2.1.4. Recêyê Sihî (1895-1990)

Recêyê Sihî di sala 1895'an de li gundê Sihiya ku girêdayî Misirca navçeya Sêrtê hatiye dinê. Recêyê Sihî sê jin anîne. Ji jina wî ya ewil ku navê wê Henîfe ye kurekî wî yê navê wî Sadık û keçeka wî ya navê wê Fexriya çêbuye. Ji jina wî ya dûyem ku navê wî Rindê ye, bi navê Nûrî û Tahir du kur; Himra, Perîxan û Gulê jî sê keçê wî hene. Ji jina wî ya dawî Hediya jî zarokên wî çênebûne.

Receyê Sihî di dema xwe de li herêmê dengbêjekî navdar bûye û di civakê de ji ber vê kesayeta xwe ya hûnerî pir caran bûye pêşek jî. Kurê wî Nûrî ji aliye dengbêjiyê ve di bin bandora wî de maye û niha jî dengbêjiyê dike. Dengbêj Nûrî di hevpeyvîna me de, di derheqê dengbêjiya bavê xwe de wisa dibêje:

> " Dema bavê min de ceryan tune bu, ji bo ronahiyê çira hebûn. Wek niha radyo û televizyon jî tunebun. Li gundê Sihiya û li gundên derdorê wek Kendala, Bişêrê, Hiseyniyê biçuya kuderê gundiyan ji bo wî şevbuhêrk li dar dixistin. Wê demê em mirîde mala şêx bûn. Dema şêx dihat Sihiya gazî bavê min jî dikir, digot bila werî civata me. Şêx ji bavê min re digot ji me re kilaman bibêjê lê belê bila kilamên te ne yên şeran bibin. Li ser vê yekê bavê min jî lawik, dilik û qesîde digotin. Mijara wan jî piranî evin û şahî bûn. Bavê min wek kar, cotkarî û rezvanî dikir. Ji ber ku di civakê de qedrê wî zede bû pir caran xelkê jê re diyarî ji dianîn. Xelkê genim û ceh jî didayê. Ji bo mirovatiyê, xelkê dema qîz ji zarokên xwe re bixwestana wî dixistin pêşiya xwe. Dema ew biçûya ji ber qedrê wî kesî ew nedişikand."[53]

Li gor gotinên kurê wî Nûri kilama navdar ya "Bavê Fexriya" cara yekemin wî çekiriye û ew kilam a wî ye. Vê yekê jî bi navê xwişka xwe ya Fexriya bibingeh dike. Kurê wî Nûrî dibêje ku: "Ji xeynî kilama Bavê Fexriya, kilama ku behsa Şerê Elikiya dike "Qasêyê Osman" û gelek kilamên ku behsa şerên ku li herêma Xerzanê qewîmîne jî cara ewil wî gotine."[54]

### 1.2.1.5. Hisamedînê Zoqeydî (1953- …)

Hisamedînê Zoqeydî di sala 1953' an de li gundê Arincê hatiye dinyayê. Navê wî di nasnameyê de Hüsamettin Nas e. Piştî ku ji Arincê derdikevin malbata wan belav dibe. Hinek ji wan tên gundê Zoqê hinek ji wan jî gundê Delava ava dikin li wir bi cih dibin, hinek diçin gundê Mellekendê ku girêdayî navçeya Mûşê (Qop)ê ye, hinek jî diçin Suriyê binxetê.

[53] Nuri Taşkın, Karmend, " Di derheqê jiyana Dengbêj Recêyê Sihî de", Batman, 16.04.2018.
[54] Nuri Taşkın, Karmend, " Di derheqê jiyana Dengbêj Recêyê Sihî de", Batman, 16.04.2018.

Li gor gotinên wî, berê karê cotkariyê dikir. Piştre li Amedê di saziya Bağkur ê de 23 sal dixebite û ji wir malnişîn dibe. Piştî karê xwe yê Amedê vedigere Zoqeydê, li vir jiyana xwe berdewam dike. Li vir digel zavayê xwe dengbêj Suleyman, Mahfûzê Keşkolî, Mikaîl, Şîlan û Dîlan ekîba dawetê ava dikin. Ew bixwe him kilamgotin him jî ji lêxistina erbaneyê re pir jêhati ye. Dengbêj Hisamedin ji biçûktiya xwe ve bala wî li ser dengbêjiyê bûye. Ji ber ku bavê wî Emer jî dengbêjek navdar buye. Ji xeynî bavê xwe di bin bandora dengbêj Zahiroyê Muşî, Keremê Melezgirî û ji dengbêjên Herêma Xerzanê Salihê Qubînî û Teyîbo de jî maye.

Di hevpeyvîna me de ji bo dengbêj Salihê Qubînî nêrînên xwe wisa tîne ziman: "ligor min Salihê Qubînî dengbêjekî herêmê yê gelek hêja ye û ew bixwe kaniya dengbêjiyê ye."[55]

Dengbêj Hisamedin ji xeynî gotina kilamên gelerî, kilamên wî bixwe çêkirine jî hene. Ji ber ku derfetên wî tune bûne çiqas xwestibe jî band û cd dernexistine. Di hevpeyvîna me de li ser vê yekê wisa dibêje: " Min xwest ku ez ji bo kilamên xwe band an jî cd yekî derxim. Lê belê ji bo vê ji min çar sed milyon hate xwestin. Ji ber ku wê demê ev pereyekî zaf bû û derfet tunebû, ji ber vê yekê min nikaribu ez band an jî cd ji xwe re derxim."[56] Kilama bi navê "Bavê Silo" ku dengbêj Hisamedîn ji bavê xwe hîn buye û dibêje li jêr e:

"Heylor heylor heylor heylor hê hê

Zeyno dibe Keyno lê xayê ji xêtê heyran ji xêtê

Ez dên û bala xwe didimê dengê tivingê bavê Silo

Kejê makûla tê ji gazê şemlo ji pozê zer ne xêtê wayêêê

Lê serê şeveqê min serê xwe xiste kuleka û şebaka

Ez dinêrim hirêne hespê Bavê Silo keyê makûla dayê ji hewşê tê wayêêê

Min digo hûnê rabin cîkê bavê Silo derxin serbanê xênî serbanê vir çekin

Ez dên û bala xwe didimê hespê Bavê Silo dikule

---

[55] Hüsamettin Nas, Dengbêj , "Li ser dengbêjiyê", Kurtalan(Zoqeyd), 12.05.2018
[56] Hüsamettin Nas, Dengbêj , "Li ser dengbêjiyê", Kurtalan(Zoqeyd), 12.05.2018

Ez ê nizanim ne ji bizmêr e ne ji ber xezeba siwêrane

Lê mi qîrekî dida li qîz û bûkê malbatê mi digo hunê

Rabîn zêrê situyê xwe ji hespê Bavê Silo re bikin cotek nale

Keziyê serê xwe jê re bikin dox û hevsar e

Eman heylor heylor heylor heylor heylor lo li mi nemayêêê."[57]

#### 1.2.1.6. Mihemed Eliyê Comanî (1954-…)

Dengbêj Mihemed Eliyê Comanî jî dengbêjekî xwedî temen yê herêma Xerzanê e. Di derheqê jiyana wî de agahiyên ku em jê hîn dibin ev in: " Dengbêj Mihemed Elî di sala 1954 'an de li gundê Comaniyê ku navçeya Hawel [Baykan] a girêdayî Sêrtê hatiye dinê. Navê wî yê nasnameyê Mehmet Ali Yüksekbağ e. Dibistan nexwendiye. Wek karmend di saziya Türk Telekom ê de xebitiye û ji vê derê malnişîn bûye. Şeş zarokên wî hene.

Dengbêj Mihemed Elî ji diwazdeh saliya xwe kilaman dibêje û dengbêjiyê dike. Kilamên ku dibêje pirani gelerî ne. Kilamên gelek dengbêjên navdar jî jiberkirine û dibêje. Ji zaroktiya xwe ve di nav civatên mezin de maye, di van civatan de hînî gelek kilaman bûye. Jiyana wî heya 1993'an li Comaniyê derbas bûye. Piştî vê salê bi malbatî tene Misircê ku ew jî navçeyek Sêrtê ye. Niha jî li vê derê digel zarokên xwe jiyana xwe berdewam dike."[58]

#### 1.2.1.7. Xalitê Xerzî(1937-…)

Xalitê Xerzî weke ku ji nasnavê wî jî diyar e dengbêjekî herêma Xerzanê e. Niha li Amedê dijî, derfet çênebû em bi hevre hevpeyvînê bikin. Dengbêj Xalitê Xerzî di heman demê de xalê Dengbêj Ebûzerê Misircî ye. Di hevpeyvîna me a bi dengbêj Ebûzêr re em di derheqê wî de hînî çend agahiyan bûn. Li gor gotina Dengbêj Ebûzêr, Xalitê Xerzî ji ber temenê wî yê dirêj û hin nexweşiyên wî niha di nav ciyan de ye û hişê wî jî nemaye.

Jiyana dengbêj Xalitê Xerzî di Antolojiya Dengbêjan a Şaredariya Amadê de wisa derbas dibe: " Li gundê Herbenûsê yê navçeya Hezoya Êlihê hatiye dine. Navê wî

[57] Deşîfrekirina berhemê ji aliyê Beşir Güçlü ve hatiye kirin.
[58] Mehmet Ali Yüksekbağ, Dengbêj, " Li ser dengbêjiyê", Kurtalan, 12.05.2017.

yê di nasnameyê de Halit Kayık e. Dibistan nexwendiye. Di sala 1953'yan de ji gundê xwe koçî Gundê Zengoviyê kiriye. Deh salan li Zengoviyê dimîne û di sala 1963' yan de koçî Diyarbekirê dike. Di fakulteya perwerdekariyê de wekî xedeme xebitî ye û malnişîn bûye. Niha bi karê bazirganiyê re mîjûl e. Şeş zarokên wî hene. Ji diya xwe û şevbihêrkan fêrî çîrokbêjiyê bûye. Dengbêj Seîdê Kelê, Zahiro, Keremê Batmanî, Teyîbo û Derwêşê Misircî diecibîne. Bêhtir stranên wan dengbêjan distrê."[59]

Li ser navê Dengbêj Xalitê Xerzî Kilama bi navê [ Heyla Dayê] me li jêr pêşkêş kir:

Heyla Dayê

Hê hê hê…

Lê lê Fatê digo; rinde lawo pora serî kur be bi giranî,

Hê hê hê hê… lê lê dikir nezanî,

Bila kula serê sibê bi sê kula bî, têkevî mala Hesoyê Brahîm vî neyarî bavneyar,

Roja cerdê qîrê li diyarê xwe tanî,

Li serdê Wêranşarê şêwrekî giran tanî,

Ezkerê Êzidiya topa xwe girt û bi xwe re tanî,

Şevekî nîvê şevan û pê ve berdaye kûraniya Bişêriyê, Kanîka Badêreşê, ser Hedhedka

Mala bavê mi porkurê hê hê hê koşk û xanî,

Serê malê cotekî kêmîn danî,

Peyakî sivik derketiye serê xanî,

Tifinga xwe teqande, digo;

Hewar e Hesoyê Brahîm talanê Bolindê hê hê lê ji gund deranî,

Selexana ji mala bavê mi datanî,

Roja cerdê qîrê heyfa kevn û nû bi deste hê daye xwe helanî,

[59] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya dengbêjan**, c.1, Stenbol: 2007. r. 414.

Heyla daye heyla daye heyla daye…

Weyla dayê weyla daye weyla daye ax weyla daye

Weyla daye weyla daye weyla dayê korê nemayê

Hê hê hê…

Fatê digo; lê lê Rindê lawo pora serî kur be, derdkeve sere xanîkiye,

Hema gazî dike hê hewar e, hê

Gazî dike li şivan û gavanê Receban û Xisakan û Dermanka mala Edo kurî mir

Lo Hey hawar e,

Win ê xwe bi deriyê Hacî Mihemedê Mistê bigînin hê, tevî lalê,

Temoyê Îbo fenanî kevanê ji kevanê lebûniya ji mala bavê mi ji xwar e,

Resûlê bira vî pismamê henûn roja mêr dikeve xwîn dirije, xayîn e, hevalê

Sar e, daye weyla daye weyla daye weyla daye ax weyla daye

Weyla daye weyla daye weyla daye lê korê çavrijiyayê.”[60]

### 1.2.1.8. Ebûzerê Misircî (1975…)

“Ebuzerê Misircî di sala 1975’ an de li gundê Girê Hemdo yê bi ser navçeya Misircê ya Sêrtê, ji dayîk bûye. Malbata wî beriya 150 salan ji alî Heskîfê hatiye û Girê Hemdo ava kiriye. Hemdo kalikê wan e. Ji eşîra Babosî ne. Heya di sala 1992 yan de li gund maye. Di zaroktiya xwe de stran gotiye. Bavê wî berê di şahî û dawetan de li elbanê xistiye. Ji Ebûzer re jî elbaneyeke biçûk çêkiriye. Wî jî li wê elbanê xistiye. Di bandora dengbêj Keremê Batmanî de maye. Stranên ku dibêje ji Derwêşê Bînofî hîn bûye. Derwêşê Bînofî, Keremê Batmanî, Teyîbo û Mihemedê Hafiz ji Kela Meranê diecibîne. 2 keç û 3 kurên wî hene.”[61]

Dengbêj Ebûzêr niha jî li Misircê jiyana xwe berdewam dike. Li Liseya İmam Xetîba Qîzan a Misircê wek karmend dixebite. Di hevpeyvîna ku me bi hevre kirî de di derheqê xwe de wisa dibêje: “ Ji biçûkayî ya xwe ve ez di civatan de mame û min dest

---

[60] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya dengbêjan**, c.1, Stenbol: 2007. r. 419

[61] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya dengbêjan**, c.3, Stenbol: 2007. r. 304

bi gotina kilaman kiriye. Çend caran di kanalên wek Dîcle û TRT Kurdî de ez derketime bernamayan. Dengbêjî li gor min dîrok e. Ji ber ku bûyerên kevîn û yên berê qewimîne bi saya dengbêjan tên bibîranîn."[62] Kilama bi navê "Bavê Mintezimê" ya ku di antolojîya dengbêjan de li bin navê dengbêj Ebûzerê Misircî hatiya dayîn û di heman demê de di hevpeyvîna me de jî ji me re gotî em ê jî li jêr pêşkêş bikin.

Bavê Mintezimê

De yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo

De Mîro ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

De bego ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

Ez ê bi êsîrê Evdalê Mistê kuştiyê çepera Kilîskendê me hey bavo,

Oy yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo

Hezê kire gazî dibe sirê daye îsal siyasetek li me rabû bi giranî,

Osman Nûrî Paşa li Enqere radibû li Îzmîrê tesdîq danî,

Li Kopê li Vartoyê li qeza Kilîsekendê li ber deriye mala bavê Mintezimê çadir

Kuta ji xwe ra hêwir danî, Mistoyê Qilikî neyar e xwe daye Kela Xinûsê, têlê li ser têlê dikşînê Enqerê Esker dixwest bira şi xwe ra îmdad tanî,

De Mîro ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

De bego ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

Ez ê bi êsîrê Evdalê Mistê kuştiyê çepera Kilîskendê me hey bavo,

Oyo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo yo

Hezê kire gazî dibê Sirê daye havîna sere min dêşê, porkurê dilê min di xemê da,

Osman Nûrî Paşa rabû, li Enqere li Îzmîrê li Kopê li Vartoyê ketye qeza

Çebeqçûrê şi xwe ra ekser tînîw tê pê da pê da,

[62] Abuzer Sak, Dengbêj, " Li ser dengbêjiyê", Kurtalan, 10.08.2018.

Le serê Kerem û Zahar jêkirine cenaze wan xweşmêra maye li Kendalbestê biraw

Di xewê da,

Heyfa min ê li kuştina egîdan û xweşmêra nayê,

Heyfa min ê têyê herdû xanimê mala Emer seetkî di huzura hakim û sawcî de li

Îstiqlalê di îfadê da,

Le sere jin û zarokê wana xistine pêşiya sûtalê kûçikbavê cendirma li şarê Îzmîrê

Şi xwe ra mane di zelîliyê da,

Gelekî siwar û peyayê Hesena giran e, di sûr û bedena kafirê Emirtûman de şi

Xwe re mane di maserê da,

Silêmanê Ehmed bavê Kazim mîrê zirav tîne tasê avê j imin dixwaza, av tinine

Xwayê kor ê di sûrê da,

Gule li mile rastê ketiye qeweta mile çepê tune, nakşînî surmê de,

Gulê li mile bavê Kazim mîrê zirav ketiye,

Qeweta mile çepê tune nakşînî sirmê de,

Le Evdal di sê denga dikir gazî, dibe Kerem mala te bişewite,

Kerem dibe Evdal mala bişewite bila mala min jî pêda,

Evya hayê ne şerê mew û Heyderan e, ne şerê Cibîran e, ne şerê eşîrê giran e,

Şerê mew kafirê Emîrtûman e,

Dewleta romê ji me ra xayîn e, le îşev sê şev û sê roj e, wez ê lêdixim dikim

Nakim taqeta kambaxa modoliyê bira nare pê re,

De Mîro ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

De bego ez ê bi rebena bavê Mintezimê me,

Ez ê bi êsîrê Evdalê Mistê kuştiyê çepera Kilîsekendê me hey bavo."[63]

## 2.1. JIYANA SALIHÊ QUBÎNÎ

Li gor agahiyên em ji Salihê Qubînî hîn dibin ew, di sala 1949'an de li gundê Eyndarê ku girêdayî Misirca navçeya Sêrtê hatiye dinê. Piştî Eyndarê demekî li gundê Bastoka, heya sêzdeh saliya xwe li gundê Badayê maye. Piştre çûne gundê Kanisorkê û heya şazdeh saliya xwe jî li wir maye. Di sala 1965'an de ji gund derketine û hatine Qubînê ku evder navçeyek Êlihê(Batmanê) ye.

Ji ber ku demek dirêj li Qûbînê maye û li vir dengbêjî jî kiriye, navê wî wek Salihê Qubînî di nav Kurdan de belav bûye. Li ser mijara navê Qubînê di hevpeyvîneka me de dengbêj Salihê Qubînî wisa behsa bîranînek xwe dike:

> "Di bernameyeka televîzyonê de Şemdîn ji min pirsî, tiştê ez dizanim tu ne ji Qubînê yî, gelo çima di nav gel de ji te re Salihê Qubînî tê gotin? Min jî got belê ez ne ji wir im. Lê belê ji ber ku zaroktiya min li wir derbas bû, wek dengbêjek herêmê her tim ez bûm nûnerê Xerzanê û navçeya Qubînê. Ji ber vê yekê navê min wisa belav bû. Dîsa li ser vê mijarê di bernameyekî de Hecî Ehmed Karabulut ji min re got. Li ser Qubînê kevirek nema ku xwîna me lê neket Qubîn nebû ya me. Hingî ku li ser Qubînê me mêran ji hev kuşt, me zikê erdê tije laş kirin dîsa jî Qubîn nebû ya me. Lê bele te sê çar kilam li ser Qubinê gotin tu dibê qey Qubîn li ser te tapû bû. Li ser vê yekê min jî wisa bersiv da wî: Min got: Hecî Mihemed tu jî qîra derbasî vî alî bibî navê Qubînê di nexşeyan de tune bû. Tu kesê Qubîn nas nedikir. Min navê Qubînê bir şerqê, Şam ê, li çar aliyê dinyayê gerand, Qubîn bi min hate nas kirin ne bi kuştinên we." [64]

Li ser mexlesên dengbêjan Canser Kardaş van agahiyan dide:

> "Dengbêj li herêmekî dema tên naskirin, di encama vê naskirinê de ji aliyê gel ve bi hin navan tê binav kirin. Em ji van navan re dibêjin mehles. Ev mehles bi rêya; bi navê welatê dengbêj, bi navê eşîra wî, bi navê dê û bavê wî carna jî tenê bi navê wî an jî bi peyva dengbêj û hozan tê çêkirin. Wek mînak mehlesên ku bi rêya qertafa mensûbiyetê ku tê dawiya navê dengbêj çêdibe. Wek mînak Hesen Cizîrî/Cizrawî (Cizreli Hasan), Mihemed Arif Cizrawî (Cizreli Mehmed Arif), Mihemed Salihê Beynatî (Beynatli Mehmet Salih), Hanifa Şirnexî (Şırnaklı Hanife), Salihê Qubinî (Beşirili Salih), Evdirehmanê Mûşî (Muşlu Abdurrahman), Salihê Şirnexî (Şırnaklı Salih)."[65]

---

[63] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya dengbêjan**, c.3, Stenbol, 2007. r. 307-308
[64] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 20.03.2018.
[65] Kardas, **h.b.** , s. 27.

Di Antolojiya Dengbêjan a ku ji aliye Şaredariya Amedê ve wek sê cild hatiye amadekirin de jî di beşa ku ji jiyana Salihê Qubînî re hatiye veqetandin de di derheqê vê mijarê de wisa hatiye gotin: "Ji ber ku Salihê Qubînî demeke dirêj li navçeya Qubînê (Beşiri) jiyana xwe berdewam kiriye bi vî navî hatiye nas kirin."[66]

Salihê Qubînî nêzî deh salan li Qubînê maye û di sala 1975'an de hatiye Batmanê û li vir bi cîh bûye. Ji Batmanê jî mala xwe dibe Stenbolê. Piştre ji wir dîsa vedigere Batmanê. Piştî vegera Batmanê demekî li gundê Girikê Boto jî dimîne. Niha jî dora pazdeh salan e li Batmanê bi malbatan xwe re dijî.

### 2.1.1. Malbata Salihê Qubînî

Navê bavê wî Mihemed e. Bi eslê xwe ji gundê Bêkendê ya girêdayî Misircê ne. Lê belê zêde li gundê Eyndarê man e. Gundê Eyndarê berê mezraya Bêkendê bû. Berê li gundê Bekendê beg hebûn. Ew jî ji malbata began tên hesibandin. Mîr Qasim an jî Qasim beg bavikê wan yên nehan e û ji herêma Botan wek peywirdar hatiye herêma Xerzanê û li vir bi cîh bûne. Karê wan heya ku li gundan mane cotkarî û paletî bu ye.

Salihê Qubînî dibistan nexwendiye. Hinek xwendin û nivîsandina wî hebe jî li gor gotina wî dema li leşkeriyê bi saya nivîsandina nameyan hîn bûye. Salihê Qubînî fêrbûna xwe ya nivîsê wisa tîne ziman: "Dema ez çûme leşkeriyê min qet xwendin û nivîsandin nizanibû, min nikaribû bi zimanê Tirkî navê xwe jî binivîsim. Ji hevalên min re name dihatin. Ev yek ji min re jî bû meraq. Hevalekî min tenê tîpên alfabeya Tirkî fêrî min kirin û di nava bîst û pênç rojan de min nameyek nivîsand û ji malbata xwe re şihand."[67]

Salihê Qubînî xwedî du jina û çardeh zarokan e. Heft qîz û heft kurê wî hene. Navên kurên wî ev in: Sileyman, Weysî, Şikrî, Kerem, Hadî, Recep, Hebîb. Navên keçen wî jî ev in: Şikran, Muazzez, Meyrem, Amîne, Helîme, Leyla û Elîf.

Di nav zarokên wî de ya ku ji aliyê dengbêjiyê ve di bin bandora bavê xwe de maye tenê keça wî Meyrem e. Li ser vê yekê Salihê Qubînî wisa dibêje: " Keça min Meyrem jî carna li mal kilam digotin û dengê wê jî pir xweş bû. Lê mixabin ji ber ku di civakê de dengbêjiya keçan bi awayekî erênî nedihate qebûl kirin me jî destûr neda

[66] Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan**, c.337, Stenbol: 2007, r. 337
[67] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 20.03.2017.

Meyremê ku di civatan de jî kilaman bibêje. Nexwe qabiliyeta wê hebû ji kilamgotinê re û hestên wê jî hebûn, dilê wê pir dixwest dengbêjiyê bike."[68]

### 2.1.2. Dengbêjiya Salihê Qubînî

Salihê Qubînî ji biçûktiyê ve dest bi karê dengbêjiyê kiriye. Li gor agahiyên ku em Ji Salihê Qubînî hîn dibin bavê wî herçiqas ne dengbêjek navdar be jî carna hin kilam gotine. Lê belê birayê wî Qasim dengbêjek navdar bûye. Li gor agahiyên em jê hîn dibin, Salihê Qubînî bixwe jî dengbêjiya birayê xwe Qasim pir diecibîne. Salihê Qubînî destpêkirina kilam gotinê ango dengbêjiya xwe ya ku di civakê de bi bîranîneka xwe wisa tîne ziman:

> "Ez gelekî biçûk bûm temenê min nayê bîra min. Daweta mala xalê min bû, bavê min xwe kar kir ku here dawetê. Dilê min jî pir dixwest ku ez jî herim. Ji ber vê yekê ez jî ketim pey bavê xwe ku pê re herim dawetê. Lê belê çûna min ne bi dilê bavê min bû. Hetta du sê caran li pişt xwe vegeriya û xwe bi min re xeyîdand û got: Ger tu li pey min werî ez dê li te bixim. Wî çiqas xwe aciz kir jî min dev ji vê mereqa xwe berneda û ez dîsa ketim pey wî. Piştî ku em qederekî ji gund dûr ketin, li min vegeriya û gazî min kir got: Were were. Serê ewil ez tirsiyam min got belkî li min bixe jî, hetta min got: Ez werim tê li min bixî got: Na na were. Em bi hev re çûn koçka mala xalê min. Civatek giran rûniştibû. Ez çûm cem xalê xwe li ser çoka wî rûniştim. Xalê min, ji min pir hez dikir. Ez li ser çoka xalê xwe rûniştibûm. Di civatê de kilam hatin gotin. Dema dora Sofî Resulê Herbelûsî hat, min xwe ji ser çoka xalê xwe berda xwarê û min bi dengekî bilind dest bi gotina kilama "Salihê Nûrê" kir. Ev yekem car bû ku min li ber civatekî kilam digot. Piştî gotina min civatê tevî berê xwe dabûn Sofî Resûl û lê dikeniyan. Ew jî ji şerma sor û zer bibû. Çewa ku dengbêjekî zor derketibe li hemberî wî. Helbet min ev yek ne bi zanîn kiribû. Ji dilê min wisa hat û min xwe negirt û kilam got."[69]

Salihê Qubînî ji xeynî bavê xwe di bin bandora dengbêjê herêma Xerzanê apê xwe Nazî de jî maye. Ji wî û ji hin dengbêjên navdar yên herêmê wek Teyîboyê Sehertî, Derwêşê Binofî, Remezanê Silêmanê Faro jî kilam girtine û gelek caran di civat û dîvanên wan de maye. Mihemed Ava di xebata xwe ya bi navê "Çîrokên Kilaman Radyoya Erîvanê de" jiyana Salihê Qubînî bi kurtasî pêşkêş dike li ser vê mijarê û wisa dibêje: "Apê wî jî dengbêj bû di bin bandora apê xwe, dengbêj Teyîbo yê Sêrtê de dimîne nêzîkî 20' kilamên wî ku bixwe çêkirî hene."[70]

---

[68] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 20.03.2017.
[69] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 19.08.2017.
[70] Ava, **h.b.** , r.114.

Salihê Qubînî ji bo dengbêjiyê dibêje ku em dikarin bibêjin bi kurtasî dengbêjî bîbîranîne. Li gor gotinên wî ger dengbêjî tune bûna dê hin kesên wek Huseyîn Paşa, Nadir Beg, Xalid Begê Cibrî, Cemîlê Çeto, Bişarê Çeto, Silêmanê Ehmed û Keremê Qolaxasî ku di dirokê dê xwedî cihekî girîng in dê nehatana naskirin û dê bihatana jî bîr kirin. Piştre jî karê dengbêjiyê li gor xwe dike du şax: Dibêje yek ji wan "Dertbêjî" ye. Ya din jî "Dilbêjî" ye. Van her dû şaxan jî wisa şîrove dike:

> "Dema ku dengbêj dest bi kilama xwe dike, mijar evînî be şahî be an jî êş û elem be, her wekî ku mirov xwe di nava kilamê de bibîne. Ango mirov jî wan bûyeran bibîrbîne û bikeve bin bandora wan. Li gor min du şaxên dengbêjiyê hene yek 'dertbêjî' ye ango kilamên ku mijara wan êş, elem û şewat in. Ya din jî 'dilbêjî' ye ku mijara van kilaman jî evîn û şahî ne. Ji kilamên dilbêjiyê qesta min ne tenê evîna xort û qîzekî ye. Dibe ku mirov evîndarê bexçeyekî şîn, tije gûl û reyhan an jî çiyayekî hertim biberf jî bibe. Ango qesta min ev e ku mirov çi di dilê xwe de bihebîne dikare li serê kilamêkî bibêje. Kilamên dertbêjiyê jî piraniya wan pîrek an jî qîz êşên, elemên bûyerên nexweş yên di sere wan de hatine bi dilekî bişewat dibêjin pêk tên. Pir caran van kilaman li ser navê wan ango bi devê wan dengbêjên mêr dibêjin."[71]

Salihê Qubînî ji aliyê dengbêjiya xwe ve di herêmê de xwedî cihêkî taybet e. Lê belê ew vê yekê tu car nayne ziman, divê mijarê de pir mutewazî ye. Dema mirov jê dipirse, ji bo dengbêjiya xwe wisa dibêje: " Ez ne nîvdengbêjek im jî. Ji dengbêjên Kurdan tevan gelekî hez dikim û tu carî nahesidim wan. Dema ku ez dengbêjekî bibînim, çewa ku ez yekî ku ji malbata xwe bibînim. Bi dengbêj Zahiroyê Muşî re hevaltiyeka me ya pir baş heye. Her tim em li hev digerin û pirsa hev dikin."[72]

Dengbêj Zahiroyê Muşî niha li bajarê Aydînê dijî. Ji ber ku derfet tunebû em rû bi rû hev bibinin bi rêya telefonê me bi hev re hevpeyvînek kurt kir. Di vê hevpeyvîna me de Dengbêj Zahiro di derheqê dengbêjiya Salihê Qubînî de ev agahî dan me: "Bi Salihê Qubînî re nêzî çil sal e hevaltiya me heye. Cara ewil li Batmanê me hev dît. Salihê Qubînî li herêma Xerzanê hunermendekî pir mezin e. Li gor min hunermend ew kese ku tenê ne berhemên hin kesan dibêje, ew bixwe jî berheman diafirîne. Salihê Qubînî jî di warê dengbêjiyê de ji aliyê afirandina berheman ve navdar e."[73]

Ji xeynî Zahiroyê Muşî, dengbêjekî din yê navdar yê Herêma Serhedê Bekirê Idirî û Salihê Qubînî jî hevalên hev in û bi hev re di bernameyan de kilam gotine.

---

[71] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 16.09.2017.
[72] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 16.09.2017.
[73] Zahir Koçu, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê" , 03.11.2018.

Dengbêj Bekirî Idirî di hevpeyvîna me ya ku li Idirê li mala wî me pêk anî de di derheqê hevaltiya xwe û Salihê Qubînî û dengbêjiya wî de ev agahî dane me : “Min cara ewil Salihê Qubînî li Stenbolê, di bernameyaka dengbêjan de nas kir. Wek nûnerê herêma Xerzanê ew ji hatibû vexwendin. Piştî ku kilama xwe got birastî jî min gelek dengê wî eciband. Li gor min dengbêjekî hêja ye. Piştî bernameyê çend rojan min wî vexwend mala xwe, hat bajarê Idirê û bû mêvanê min.”[74]

Di hevpeyvîneka me de Salihê Qubînê behsa bîranîneka xwe û dengbêjê navdar Karapetê Xaço jî dike û wisa dibêje:

> “ Min tu car Karapetê Xaço nedîtiye lê belê du caran bi rêya telefonê em bi hevre axivîne. Carekî lêkolîner Salihê Kevirbirî telefonê min kir û got niha apê Karapet li cem min e û dixwaze bi te re biaxive. Karapet ji min pirsa rewşa welêt û dengbêjiya welêt kir, min jî got ku wek berê qedrê dengbêjiyê nemaye. Wî jî got pir heyf û ji min re got ez dê kilamekî ji te re bibêjim. Min fam kir ku dixwaze dengbêjiya min biceribîne. Dest bi kilamekî kir û piştî çend bendan sekînî û ji min re got fermo tu berdewam bike. Min jî ji cihê ku wî dev ji kilamê berdayî berdewam kir û kilam qedand. Birastî jî ne kilamek hesan bû. Piştî çend rojan Salihê Kevirbirî li min geriya û got: Apê Salih welle apê Karapet dengbêjiya te pir eciband û got welle ew dengbêjek zor e.”[75]

Mihemed Seîd Temel di berhema xwe ya bi navê “Eşîra Reşkotan (Eşîreka Navdar- Warê Dengbêjan)” de Salihê Qubînî jî ji ber ku bi navê Qubînî hatiye naskirin wek dengbêjekî Reşkotî daye naskirin û di derheqê dengbêjiya wî de wisa dibêje: “ Di roja îro de jî Salihê Qubînî, Dengbêjekî pir bi nav e, gelek caran bernameyên wî di TV yên cûrbecûr de derdikevin. Dengekî bilind, zîz û zahf şîrîn li ser heye.”[76]

Salihê Qubînî gelek kilam çêkirine û hin kilamên xwe re klîp jî kişandine. Şeş bandên wî hene. Bi awayê cd jî çar qeydên kilamên wî di nav Kurdan de belav bûne. Di vê xebata xwe ya ku em bitaybetî li ser jiyana wî û berhemên wî sekinîne de me pazdeh kilamên wî hilbijartin û me li ser wan dahûrînek berfireh kir. Salihê Qubînî di gelek qanalên Kurdî de derketiye gelek bernameyan. Wek mînak dunya tv, zagros tv û war tv ji van qanalan hinek in.

---

74 Bekir Akkuş, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Idir, 25.06.2018

75 Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Batman, 13.07.2018.

76 Mihemed Seîd Temel, **Eşîra Reşkotan(Eşîreka Navdar-Warê Dengbêjan)**, İstanbul: Weş. Nûbihar, 2016, r. 30.

Li gelek bajarên Kurdan beşdarî festîvalên çandî û hunerî jî bûye. Wek mînak em dikarin hinek cihan wisan rêz bikin. Du caran festivala çand û hunerî li ser helbestvan û nivîskarê nemir Ehmedê Xanî ku li bajarê Bazîdê hatibu li dar xistin, her yekî carekî li bajarên wek Patnos, Erdîş, Adilcewaz, Nisêbin, Mêrdin, Qoser û Meletî. Her yekî du caran bajarên wek Mêrsin, Qurtalan, Qubînê. Sê caran çûye bajarê Edenê. Gelek caran jî li Stenbol û Batmanê beşdarê festivalên çandî û hunerî bûye.

## 2.2. BERHEMÊN SALIHÊ QUBÎNÎ

Salihê Qubînî di nav civaka Kurdan de gelek kilam û stran gotine. Dema mirov di înternetê de lêgerîn dike di gelek siteyan de kilamên Salihê Qubînî derdikevin pêşberî me. Digel kilam û stranên gelerî yên wî bixwe jî çêkirine hene. Wekî ku me di jiyana wî de jî behs kiribû şeş band û çar qeydên dengê wî wek cd jî derketine. Mihemed Ava di pirtûka xwe de bi kurtasî behsa jiyana Salihê Qubînî dike û li ser hejmara berhemên wî wisa dibêje: “ Nêzîkî 20’ kilamên wî ku bixwe çêkiriye hene.”[77]

Me jî xwest ku em li ser berhemên Salihê Qubînî yên wî bixwe çêkirine bisekinin û li ser wan dahûrînek berfireh bikin. Di hevpeyvînên me de jî dengbêj Salihê Qubînî navê bîst berhemên xwe ji me hejmartin û piraniyên wan wek deng jî ji me re gotin. Ji ber ku di nav van berheman de 5 heb zêde polîtîk bûn, li gor daxwaza dengbêj me cih neda van. Me di nav berhemên wî de 15 heb hilbijartin û ev berhem ji aliyê cûreya wan ve wek sê beşan. “ Berhemên şer/mêrxasî, berhemên evînî /dilan, berhemên şîn/zêmar” senifandin. Berhemên wî yên ku me li jêr pêşkêş kirine û dahûrîna wan kirine ev in: Hadî Lawo, Loqman Birazî, Şerê Dêrûnê, Xelîlê Reysê Emerê Birahîm, Behçetê Dawid, Bavê Şikran, Sebrê Bihar e, Gorî Sebrê, Lawikê Dêmanî û Keçika Koçer, Şêxa Dînê, Çavreşê Birû Qorê, Delîl Yadê, Dîlber, Bav û Qîz, Şêx Şabedîn û Seyîd Elî.

Ji van berheman Şêxa Dînê, Çavreşê Birû Qorê, Dilberê û Delîl Yadê gelerî ne û ji aliyê hin dengbêjên navdar yên herêmên cûda ve jî hatine gotin. Lê belê li gor lêkolîna me her dengbêjî naveroka kilamê li gor xwe guhertiye û li gor honandina xwe bi tarzek nû ev kilam gotin e. Berhema Şêxa Dînê tiştê ku me tespit kiriye ji aliyê Dengbêj Elî Nas, Dengbêj Newaf Bavê Ehmed û Mihemedê Meskenî bi navê “Şêxa Dînê”; ji aliyê Mihemed Arifê Cizrewî, Dengbêj Huseynê Omerî û Mirado[Miradê

[77] Ava, **h.b.** , r. 114

Kinê] ve jî bi navê "Şêxa Delal" hatiye gotin. Kilama "Delîl Yadê" ji aliyê dengbêj Salihê Şirnexî bi navê "Delîl Dayê", dengbêj Zahiro jî bi navê "Delîl Yadê" li gor terza xwe dibêjin. Heman kilamê dengbêj Şakiro jî bi navê "Delîl Yadê" dibêje û gelek dengbêjên Kurd jî bi terza û meqama Şakiro vê kilamê dibêjin.

Ji ber ku Salihê Qubînî jî hin cihên van kilaman guherandine û li gorî xwe lê zêde kirine, me ev berhem jî di nav berhemên wî de pêşkêş kirin. Di vê mijarê de Mahmut Beğik ku teza xwe li ser Dengbêj Reso amadekiriye wisa dibêje: "Mijareka din ya li ser dengbêjiyê de, kilam hene ku tenê ji devê jinek an zilamek, tenê du an sê rêzik hatine gotin lê dengbêj bi xeyala xwe ya fireh, ji nuh de kilamê li hev honandiye, li ser zêde kiriye û gotiye. Di haleteka wisa de ew kilam dibe ya dengbêjî."[78]

### 2.2.1. Berhemên Mêrxasî/Şer

Di berhemên wek kilam, stran, zêmar hwd. ku ji aliyê dengbêjan ve hatine amadekirin û gotin de mijara mêrxasiyê û bitaybetî ya şeran her tim xwedî cihekî girîng in. Ev yek bêguman bi çandê ve jî girêdayî ye. Bitaybetî jî ji ber hin sedemên polîtîk û civakî berhemên bi vê cûreyê di nav Kurdan de zêde ne.

Wek mînak ji berê ve di civaka Kurdan de pergalên wek eşîrtî û axatî xwedî cihekî girîng bûn. Li ser hin sedeman gelek şer di nav eşîran de diqewimîn. Em dikarin bibêjin piraniyên van berhemên dengbêjan mijara xwe ji van şer û serpêhatiyên di nav gel de qewînîne sitandine ango her berhemek xwedî çîrokeka rasteqîn e.

Fehmî Yeşîlçınar jî di teza xwe ya ku li ser dengbêj Ahmedê Alîksan amadekiriye de vê yekê wisa tîne ziman: " Ev şerana hin caran di navbera du malbatan an du eşîran carînan jî wek serhildanên hember desthilatdaran ve derdikeve pêşiya me. Mijara van kilaman ser bûyerên qewumî hatiye ristin."[79]

Canser Kardaş dema behsa cûreyên berhemên dengbêjan dike wisa behsa vê cûreyê dike: "Wek nav Stranên Mêranî [yiğitlik şarkıları], kilamên mêrxasî [yiğitlik şarkıları], kilamê siwaran [yiğitlik-süvari şarkıları], kilamê Şeran [savaş şarkıları], delal

[78] Mahmut Beğik, "**Dengbêj Resoyê Gopala(Jiyan û Berhem)",** Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Mardin Artuklu Üniversitesi TYDE, 2013, s. 55.
[79] Fehmî yeşîlçınar**, "Dengbêj Ahmedê Alîksan'ın Hayatı ve Eserleri"**, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Muş Alpaslan Üniversitesi SBE, 2016, s. 32.

jî tê gotin. Mijarên wan ji şerên di navbera eşîran, malbatan an jî bi desthilatdariyan re pêk tê. Di şeran de esasen behsa lehengiyê tê kirin."[80]

Di pirtûka bi navê "Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî" de, di gotareka bi navê " Folklora Mûzîka Kurdî" de ji bo vê cûreyê wisa hatiye gotin: "Di vê çandê de stranên mêrxasiyê xwedî cihekî girîng in. Delal[güzel] û lawikê siwaran ji aliyê çiyayiyan ve tên gotin."[81]

#### 2.2.1.1. Behçetê Dawid

Were lê hê hê hê hê hê hêêê

Naciya hayê hayê hayê dibê Hafîzê lê xwehê hê hê hê Nisafê hê lê dayê hê hê hê

Lê wezê hê hê birebenim hê hê hê ezê bi rebena hê hê rebena mêra me hê hê

Lê wezê hê hê hê bi dêrana hê hê mêra me hê hê hê hê

Ez ê bi rebena Behçetê Dawud kuştiyê di xew da me dayêê ûûû way ûû

Naciya dibê Hafîzê lê xwehê Nisafê lê dayê

Sibe ye hê hê hê dayê çiqa dilê min tirsiya hê hê hê hê

Lê siet hê hê ji nehê şevê pê de li guhê min xweş tê lê dengê miratê balçîqa hê hê teqerifa hê

Ji bireka bavê min rebenê hê hê ji rexê zêwikê ve dayê diteqiya hê hê

Lê kula hê hê xwedê bi kul be bikeve derê mala ber û pismamê xayîn hê hê

Lê teva hê hê xwe berdane bin xêniya hê hê hê hê

Jî xêra hê hê mala xwediyê xwedê re hê hê li çaxê li Behçetê dawud hê hê hê

Li axayê Şekirî dibû pêsîrtengî hê hê hê

Lê bila tê da derketa hê hê hê serê birayê hê hê

---

80 Kardas**, h.b**. , s.162.

81 Mehmet Bayrak, **Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî**, Ankara: Weş. Özge, Cild 1, 2002. r. 133

Na wile hê hê tê derketa hê hê serê cotê kura

Lê belkî bi kuştana hê hê hê şopê rast kirna hê hê na weka şopê ziya

Lê wezê hê hê hê bi rebenim ez ê bi rebena hê hê mêra me

Lê wezê wê bi dêrana hê hê mêra me hê hê hê

Ezê bi rebena Behcetê Dawid kuştiyê di xew da me daye wayê ûû

Were lê hê lê lê lê lê

Naciya hê hê dibê Hafîzê lê xweyê Nisafê lê daye hê hê

Rebenê hê hê hê sere mi diêşî hê hê çiqa dile hê hê min hê hê di xemê de hê hê

Lê seet hê hê li nehê şeve û pê de hê hê hê li gohê min xweş tê lê dengê

Mîratê balçîqa teqerifa ji bireka bavê min rebenê ji rexê

Zêwikê ve daye hê hê hê diteqiya hê hê hê

Ji xêra mala xwediyê xwedê re hê hê hê çaxê li Behcetê Dawid

Li axayê Şekirî hê hê hê wê dibû pêsîrtengî

Lê bila tê de derketa serê cotê kura hê hê hê

Lê weka şerê Mîrek û Çerkeza şer xweş bikirana hê hê di odê de hê hê hê

Lê belkî hê hê çend hebekê bikuştana hê hê law di ber heyfê de hê hê

Lê wezê birebinim ezê bi rebena mêra me

Lê wezê bi dêrana mêra me

Ez ê bi rebena Behçetê Dawid kuştiyê di xew da me daye

Naciya dibê Hafîzê lê xwehê Nisafê lê daye

Serê dêşe dilê min weka seetê mîna seetê lê da

Li seet li nehê şeve şûn de li gohê min xweş tê lê denge

Mîratê balçîqa teqerifa ji bireka bavê min rebenê ji rexê

Zêwikê ve daye diteqiya.

Ji xêra mala xwedê ve kuştina Behçetê dawid

Axayê Şekirî kêmayê her heft bavê Elikan ne heyfa her kesî lê tê

Kesekî xwedanî xêra tine cewabekê bide sêrtê vê şeve

Mala te xirabe kuştine Behçetê dawud axayê şekirî îro di xewê de."[82]

**2.2.1.1.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhema bi awayek bêbextî kuştina mêrxasekî ye.

**2.2.1.1.3. Naveroka Berhemê**

Li gor agahiyên em ji dengbêj Salihê Qubînî hîn dibin, Behçetê Dawid ji Eşîra Elikan e. Salihê Kevirbirî wisa behsa vê eşîrê dike: " Her wekî ko tê zanîn, Eşîra Elikan ji çend malbatên wekî Mala Remo, Mala Dîbo, Mala Sîno, Cindikan, û Mala Xelîlê Simê pêk tê û li Herêma Xerzan eşîreke berfireh û mezin e."[83]

Behçetê Dawid, wek serokê malbata 'Mala Remo' dihate naskirin. Navê wî di nasnameyê de Behçet Apaydin e. Navê jina wî Nisafê ye. Du keçên wî hene, navê yekî Naciya ya din jî Hafîzê ye. Sê kurê wî bi navê Şefîq, Nafî û Recep hene.

Dengbêj Salihê Qubînî di hevpeyvîna me de wisa behsa Behçetê Dawid dike: "Behçetê Dawid zilamekî mêrxas û ewqas jî nefisbiçûk bû. Çar gurçikên wî hebûn. Dema dihat sûka Qubînê diçû firinê bin çengên xwe tije nan dikirin û diçû dikana Fethullah sê çar kilo helaw dikirî dihat dirûnişt, gazî kesên di wan deran de diboriyan dikir û digot kerem bikin werin em bi hev re nan bixwin."[84]

Behçetê Dawid çewa ku me le li jor jî li gor agahiyên Salihê Qubînî anî ziman digel mêrxasiya xwe, haya wî ji derdora wî jî hebû, li feqîran xwedî derdiket, kesên jê gilîdar tunebûn. Lêkolîner Salihê Kevirbirî jî di pirtûka xwe de cih dide hevpeyvîna xwe ya bi kurê Behçetê Dawid Nafî û wisa neqil dike: " Dema babê min hate kuştin, ez 18

[82] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.
[83] Salihê Kevirbirî, **Filitê Quto**, Stockholm: Weş. Nefel, 2002, r. 83-84.

[84] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 13.07.2018.

salî bûm. Babê min mirovekî gelekî baş bû. Herkes jê qayîl bû. Ne zalim bû, neheqiyek li kê bihata kirin, qîma xwe nedianî. Jixwe tim wî digot: Ez qesasê zulmê me. Mirovekî dilşewat bû, li ser herkesî dilê wî dişewitî. Çend caran ji ber ku zulm nepejirand kete hepsê."[85]

Li gor agahiyên em ji dengbêj Salihê Qubînîn hîn dibin, Behçetê Dawid rewşa wî ya aborî jî pir xweş bûye. Du xaniyên wî hebûn e. Yek li gundê Baximsê yek jî li gundê Zêwikê buye. Behçetê Dawid dema li gund li cem jina xwe û kurê xwe yê biçûk Recep bûye ji aliyê kesên nediyar ve tê kuştin. Ji ber ku kûjerê wî di paceyê de gulle berdanê û wê demê kurê wî li ser çoka wî bûye, xwe siparteye ser kurê xwe û kujerê xwe nedîtiye. Niha jî malbata wî nizanin ku Behçetê Dawid ji aliyê kî ve hatiye kuştin.

### 2.2.1.1.2. Lehengên Berhemê

Behçetê Dawid, Nisafê, Hafîzê, Naciya

### 2.2.1.1.4. Zimanê Berhemê

Dema mirov ji aliyê ziman ve li berhemê dinêre hin gotinên qalib yên ku di berhemên gelek dengbêjan de jî hene derdikevin hemberî me. Ev gotin di derheqê naveroka berhemê de jî gelek agahiyan di nav xwe de dihewînin û wateyê jî xurt dikin. Wek mînak di rêzika 'Ezê bi rebena Behcetê Dawud kuştiyê di xew da me daye wayê ûû' de gotina "kuştiyê di xew de" ji bo vegotina kuştina Behçetê Dawid hatiya bikaranîn û ev gotin tenê bi serê xwe ji bo naveroka berhemê jî gelek nîşaneyan dihundirîne.

Ji xeynî vê dîsa di rêzika 'Lê kula hê hê xwedê bi kul be bikeve derê mala ber û pismamê xayîn hê hê' de ji bo "xayîntiya ber û pismaman" ku di civaka Kurdan de gelekî xuya ye û tiştekî balkêş e. Dengbêj dîsa wek gotineka qalib nerazîbûna wê rewşê aniye ziman. Di rêzikekî de jî bi gotina "Axayê Şekirî" pesn û wesfê lehengê berhemê ango Behçetê Dawid hatiye dayîn.

### 2.2.1.1.5. Teşe û Cûreya Berhemê

[85] Kevirbirî, **h.b.** , r. 85.

Cûreya berhemê mêrxasî ye. Dema mirov ji aliyê teşeyê ve li berhemê dinêre ev tên xuya kirin. Berhem ji çar bendan pêk hatiye û di bendan de hejmara rêzikan jî ne wek hev e. Kêşa berhemê serbest e. Di rêzikên berhemê de serwa û paşserwa jî hatine bi kar anîn. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvan de tîpa “r” yê serwa ye, tîpa “a” yê jî paşserwa ye.

“Na wile hê hê tê derketa hê hê serê cotê ku**r***a*

Lê belkî bi kuştana hê hê hê şopê rast kirna hê hê na weka şopê ziy*a*

Lê wezê hê hê hê bi rebenim ez ê bi rebena hê hê mê**r***a* me

Lê wezê wê bi dêrana hê hê mêr*a* me hê hê hê”

**2.2.1.1.6. Dahûrîna Berhemê**

Di tevahiya berhemê de bi awayekî bêbextî kuştina Behçetê Dawid bi devê keça wî Naciya tê vegotin. Behçetê Dawid ji ber ku yekî mêrxas û jêhatî bû ev kuştina wî ya bêbext û nediyarbûna kûjerê wî, heyfa wî di dilê malbata wî de hiştiye. Ev yek ji aliyê salihê Qubînî ve di berhemê de jî wisa tê vegotin: “

*Ji xêra mala xwediyê xwedê re hê hê hê çaxê li Behcetê Dawud*

*Li axayê Şekirî hê hê hê wê dibû pêsîrtengî*

*Lê bila tê de derketa serê cotê kura hê hê hê*

*Lê weka şerê Mîrek û Çerkeza şer xweş bikirana hê hê di odê de hê hê hê*

*Lê belkî hê hê çend hebekê bikuştana hê hê law di ber heyfê de hê hê*”[86]

**2.2.1.2. Xelîlê Reysê û Emerê Birahîm**

Lê axaoo û û

De şer e ûû maqûlo de şer e

Ê ne dibe şerê tere û yewnan e ê ne dibe şerê Esrail û Ereb e

Ez îro sekî ne me pirsa vî şerî giran dibê li Qubînê li taxa xwarî lawo li serê Dêrokê şer e û û way ax ax

---

86 Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Batman, 13.07.2018.

Wele ji vir e virê qetê dar û kevira kesek nikare li taxa xwarî vegere

Heçî Birahîmê mele ye êê xweyiyê kopalê gilover e

Evdirehmanê mele ye bi sê telaqê Eyşo sond dixwe ê ê dibê heçî li vê taxa xwarî îro vegere

Ez exîftekê bi sere wî rakim waliyê sêrtê li texsiya xwe siwar be bi xisûsî di imdada wî de were ûû ax

Lê axao dinyayê dû dûman e mij û moran e

Bi serê Dêrokê ketin xweş tê qîrînê kur û bavan e

Xelilê Reysê Bavê Emer xwe daye ser dara mirata wenexdarê

Derbekî da ye li bejn û bala Emerê Birahîm lawo îro li çavê çepê

Wele sê tîrêjê xwîna sor giran e xwe berda ser bejna vî lawo kosteka vê seetê

Cinazê vî xweşmêrî maye li serê Dêrokê li ser sergo lawo li ber siya vê qubikê û wa û ax

Belê Eyşo dibê Melo lê lawo li min û li vê Dobetê xwezila bi dû sala eskeriya vê dewletê

Bi şeş sal û heft sala firar û qaçax û mahkumiyeta binya xetê

Lê ew roja şerê dêrokê bi kula Xwedê bi kul be bikeve derê mala bavê Xelîlê Reysê Bavê Emer xwe daye ser darê mîratê wenexdarê

Lê derbekî dayê li bejn û bala Emerê Birahîm lawo li çavê çepê

Wele sê tîrêjê xwîna sor giran e xwe berdaye ser bejna vî lawo kosteka vê seetê

Cinazê vî xweşmêrî birin serê Dêrokê na wele ser ber siya vê qubikê.”[87]

[87] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

#### 2.2.1.2.1. Mijara Berhemê

Mijara berhemê şerê di navbera malbata gavan û şivanê gund de ye.

#### 2.2.1.2.2. Naveroka Berhemê

Şer di navbera mala Xelîlê Reysê û Emerê Birahîm de diqewime. Xelilê Reysê gavanê gund bûye. Ew ji eşîra Terxaniyan bûye. Hiseyn û Enver du kurê wî ne. Enver di şaredariyê de dixebite. Emer jî şivanê gund e. Salihê Qubînî bi kurtasî wisa behsa şerê wan dike: "Şer di navbera van her dû malbatan de taxeka ku Qubînê em dibêjin Dêrokê, li vir êvarê dema dewar û pez tên li vir li nav hev dikevin û xirecir çêdibe her malbat jî dikevin nav hev. Bi kevira bi dara bi tarên rîxê li hev dixin. Ji ber ku mala me jî li hafa şerê wan bû min ev kilam avêtiye li ser şerê wan."[88]

#### 2.2.1.2.3. Lehengên Berhemê

Xelîlê Reysê, Emerê Birahîm, Hiseyn, Enwer, Evdirrehman, Eyşo

#### 2.2.1.2.4. Zimanê Berhemê

Dengbêj ji bo dijwarbûna şer bîne ziman ev şerê biçûk yê di navbera her dû malbatan de çewa şerekî mezin ê di navbera du dewletan de be anîye ziman bi vî awayî: "Ê ne dibe şerê tere û yewnan e ê ne dibe şerê Esrail û Ereb e" şibandiye hev. Rewşa kesên birîndarbûyî jî awayekî hurgulî bi vî awayî hatiye teswîr kirin: 'Wele sê tîrêjê xwîna sor giran e xwe berdaye ser bejna vî lawo kosteka vê seetê'.

#### 2.2.1.2.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa bi hev re hatine bi kar anîn. Berhem ji çar bendan pêkhatiye. Du bend ji çar, yên din jî şeş rêzikan pêk hatine. Cûreya berhemê jî şer e. Di rêzikên berhemê de serwa û paşserwa jî hatine bi kar anîn. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşan kirin de " an" serwa ye. Tipên "e" û "ê" jî di nav xwe de paşserwa ne.

"Lê axao dinyayê dû dûman e mij û mor**an** *e*

Bi serê Dêrokê ketin xweş tê qîrînê kur û bav**an** *e*

---

[88] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 13.07.2018.

Xelilê Reysê Bavê Emer xwe daye ser dara mirata wenexdarê

Derbekî daye li bejn û bala Emerê Birahîm lawo îro li çavê çepê

Wele sê tîrêjê xwîna sor giran e xwe berda ser bejna vî lawo kosteka vê seetê

Cinazê vî xweşmêrî maye li serê Dêrokê li ser sergo lawo li ber siya vê qubikê û wa û ax”

**2.2.1.2.6. Dahûrîna Berhemê**

Di berhemê de şerê di navbera malbata gavan û şivan de diqewime tê behs kirin. Sedemê şer jî tiştekî biçûk e. Ango êvarê di vegera şivan û gavanan de li têketina gund pez û dewar li nav hev dikevin. Ev yek dibe sedemê niqaşan di navbera her dû malbatan de. Mixabin ji berê ve û niha jî di civaka Kurdan de li ser mijarên biçûk di nav malbatan, eşîran de bûyerên wisa diqewin û dibin sedem kuştinê jî.

Dengbêj Salihê Qubînî vî şerî di nav her du malbatan de herçiqas di encama şer de kuştin çênebûbe jî çewa ku ji hev kes kuştibin aniye ziman û şer wek şerekî giran çewa ku di navbera Esraîl û Yewnan ango şerekî di navbera du dewletan de qewimî ye vegotiye. Wek berhemên gelek dengbêjan de Salihê Qubînî jî hunera mubalaxayê pir bi kar anîye.

**2.2.1.3. Şerê Dêrûnê**

Were de yar yar de yar yar de yar yar de yar yar

De yar yar de yar yar de yar yar de yar yar

Ax bira li me ferman e wîîiii

Biraa li me ferman e keko li me ferman e

Li me xira kirin bajar gund û cî û war e

Stara me nema stara me bû ye kevir kendal û zinar e

Berê zar û zêçê me temamî ketin e kuçe û kolanan e

Pêşiyê me derbas bû welatê ewropa ne

Wele kesek li me nabe xweyî xwedan e yar yar

De yar yar de yar yar de yar yar

Ax bira li me ferman e wî

Lê sibe yeeee ez ê bi diyarî gundê Farqînê bi diyar î Farqînê gundê Dêrûnê diketim ji kula dile min ve dayê wa bi dar e

Mi bala xwe dayê hermetekê li nava serê xwe dixist lawo lawo bira bira ji xwe re digot gelo kir hawarrr e

Mi go xweyikê dayikê li bextê te û xwedê me çi bû çi qewimî nizam gelo çi ciriya ye

Di go keko lo bira ewê hatiyê serê me bila newê serê gurê çiya ne

Ji êvara xwedê ve giran e leşkerê Romê bi top û panzêrê xwe de kişiya ye ser e

Li jorê gum e gumê firoka ne tîmê teybetî ketin nava malan e

Ji mala me derxistin Cengiz xortekî ciwan e

Dikujin kalê heftê heştê salî kalê bavê dikujin gelo da ne ser e

Ji êvara xwedê ve mala me da ber gule bomba ne

Ji mala me dikişiya agir û pêtî gelo dû û dûman e

Wele şeş nifûsê me di xênî de şewitîn

Ji mala bavê min bêxeber û bêguman im

Ax de yar de yar yar de yar yar de yar yar

De yar yar de yar yar de yar yar

Ax bira li me ferman e

Lo bira li me ferman e keko li me ferman e

Li me xira kirin bajar gund û cî û war e

Stara me nema stara me bû ye kevir kendal û zinar e

Berê zar û zêçê me temamî ketin e kuçe û kolanan e

Pêşiya wa derbas bû welatê ewropa ne

Wele kesek li me nabe xweyî xwedan e yar yar

De yar yar de yar yar de yar yar

Ax bira li me ferman e wî[89]

**2.2.1.3.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhemê kuştin e.

**2.2.1.3.2. Naveroka Berhemê**

Dêrûnê, gundekî bi Farqînê ve giredayî ye. Cengiz, milîse partiyê bû. Tîm, bi cilên sivîl tên, dibêjin em jî hevalê we ne. Dibêjin ka texsiyê bîne em herin birîndarê me hene. Cengiz, fam dike ku ew ne ji wan e. Ewil dibêje mifte tune ye. Bi awayekî wî didin zorê. Ew jî diçe mifteya texsiyê bîne. Di vê navberê de meseleyê ji bavê xwe re dibêje. Dibêje welleh ez dizanim ku leyistikek heye lê ez mecbur im bi wan re herim. Ji bavê xwe re dibêje, dema min îşaret kir bi texsiyê, hun bizanin ez di xetereyê de me û bi hawara min ve werin.

Siwar dibin, diçin. Sed metreyî diçin, Cengiz niyeta wan fam dike û ji paş ve sinyal dide. Hacî Mihemed Elî bavê wî yê extiyar diçe çifteya xwe tîne û pê ve diçe. Heya bavê wî digihêje wan Cengiz li wir dikujin. Hacî Mihemed bi wan re dikeve lihevxistinê. Hacî mihemed jî tê kuştin. Herdu yan dixin texsiya wan û agir berdidin wan. Piştre leşker davêjin li ser gundê wan xaniyên wan jî xera dikin û dişewitînin. Di vê bûyera ku li gund diqewime de zarokek jî tê kuştin.

**2.2.1.3.3. Lehengên Berhemê**

Hacî mihemed, Cengîz

**2.2.1.3.4. Zimanê Berhemê**

Di rêzika "Ax bira li me ferman e wî" ku di berhemê de çend cihan tê dûbarekîrin de ev bûyera neyînî ku hatiye serê malbata Hacî Mihemed, çewa ku wek fermanek be û bi serê gelê Kurd tevan ve hatibe, bi vî awayî hatiye bilêv kirin.

[89] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

Ev Peyva "ferman"ê jî di gelek berhemên dengbêjan de jî bi heman wateyê tê bi kar anîn. Ji ber ku di dîrokê de gelek ferman di serê Kurdan de rabûne. Dîsa di van her du rêzikan 'Li me xira kirin bajar gund û cî û war e, Stara me nema stara me bûye kevir kendal û zinar e' de rewşa xirab ku malbat ketiye nav de bi rêya gotinên watedar hatiye teswîr kirin.

### 2.2.1.3.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa di dawiya rêzikan de xwe nîşan didin. Bi rêya dûberekirina peyvan ahenga berhemê jî hatiye xurt kirin. Di berhem de sê bend hene. Benda ewil deh, ya didoyan çardeh, ya dawî jî ji heşt rêzikan pêk hatiye. Cureya berhemê jî şer e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvan de tîpên "an" serwa ye, tîpên "e" jî paşserwa ye.

"Li jorê gum e gumê firoka ne tîmê teybetî ketin nava malan *e*

Ji mala me derxistin Cengiz xortekî ciw**an** *e*

Dikujin kalê heftê heştê salî kalê bavê dikujin gelo da ne ser *e*

Ji êvara xwedê ve mala me da ber gule bomba ne

Ji mala me dikişiya agir û pêtî gelo dû û dûm**an** *e*"

### 2.2.1.3.6. Dahûrîna Berhemê

Ji naveroka berhemê jî diyar e ku ji hin sedemên polîtîk Kurd ji dîrokê ve bi zilm, zordarî, şewitandin û kuştinê re rû bi rû mane. Bi sedan gundên Kurdan hatine şewitandin û Kurd hertim ji cih û warên xwe koç bûne. Di berhemê de dengbêj vê yekê wek fermanekî bi lêv dike û dibêje ku sedemê vê fermanê de ji ber neçarbûnê gelek Kurd revîyane û derbasî Ewrûpa bûne.

### 2.2.1.4. Hadî Lawo

Ax were lo lawo lo lawo lo lawo lo lawo lo lawo lo lawo lo lawo Hadî lawo

Kula li ser kula lawo derde lo li ser derdawo

Wela kula kulfetê hûr e giran cotê xanima destê Hacî Evdilmecîd kale ketî de mao lawo

Hacî Evdilmecîd dibê Hadî lawo berxê min lawo dilê min ji dila dilekî din e

Ti bidê xatirê Xwedê rebê jorîne ti işê xwe ji Bacetê neyine.

Gundê Bacetê ji me re lazim nîne

Ti here cem mala Hecî Evdirrezaq pismamê xwe yê henûn e

Belkî efiya te derîne.[90]

**2.2.1.4.1. Mijara Berhem**

Mijara berhemê mêrxasî, kuştin e.

**2.2.1.4.2. Naveroka Berhemê**

Li gor agahiyên ku Salihê Qubînî dide me, Hadî kurê Evdilmecîd e. Malbata Hadî ji mala Hemik tên hesibandin. Mala Hemik li Batmanê diman. Hadî mîrovekî jêhatî û mêrxwas bûye. Li gorî tê gotin emnîyeta Batmanê jî jê lome dikirin. Salihê Qubînî dibêje em dostê hev bûn û di hevpeyvîna me de wisa behsa biranînek xwe û Hadî dike: “ Rojekî li serê Esentepe polîsên trafîqê min û wî sekinandin û jê pirsin ka ehlîyet û rusxeta te heye? Wî jî demanca xwe derxist got ev rusxeta min e, deh mîlyonê hingî jî derxist da polîs got ev jî rusxeta min e. Polîs bela xwe ji me vekir em bi rêya xwe ve çûn.”[91]

Li gor agahiyên em ji dengbêj Salihê Qubînî hîn dibin, kuştina Hadî di encama şerekî li ser gundê Bacetê de çêdibe. Bacetê gundê şêxan bûye. Şêxan erdê gund hinek firotibûn hinek jî di destê mala Şêx Evdile de bû. Mala Bayrem jî daxwaza gundê Bacetê dikirin. Ew jî malbatek navdar û mêrxas bûn. Lê belê şêxan nedihişt mala Bayram bikeve gund. Ji ber ku mala Bayrem û Hadî ew hevalbendê hev bûn. Hadî jî beşdarî şerê ku di navbera Mala Bayrem û mala Şêx Evdile dibe. Di vî şerî de Hadî ji aliyê Mala Şêx Evdile de tê kuştin.

[90] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.
[91] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Batman, 13.07.2018.

#### 2.2.1.4.3. Lehengên Berhemê

Hadî, Hacî Evdilmecîd, Hacî Evdirrezaq

#### 2.2.1.4.4. Zimanê Berhemê

Dema mirov ji aliyê ziman ve li berhemê dinêre dîsa dengbêj hin gotinên qalib bi kar anîne. Wek mînak di rêzika "Hacî Evdilmecîd dibê Hadî lawo berxê min lawo dilê min ji dila dilekî din e" de ji bo hebûna rewşeka neyînî bîne ziman gotina "dilê min ji dila dilekî din e" bi kar anîye.

#### 2.2.1.4.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji du bendan pêk hatiye. Benda ewil ji sê ya din jî ji pênc rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê jî mêrxasî ye. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên "n" yê serwa ne, tîpên "e" jî paşserwa ne.

"Hacî Evdilmecîd dibê Hadî lawo berxê min lawo dilê min ji dila dilekî di**n** *e*

Ti bidê xatirê Xwedê rebê jorîne ti işê xwe ji Bacetê neyi**n** *e*.

Gundê Bacetê ji me re lazim nî**n** *e*

Ti here cem mala Hecî Evdirrezaq pismamê xwe yê henû**n** *e*.

Belkî efiya te derî**n** *e*."

#### 2.2.1.4.6. Dahûrîna Berhemê

Kuştina mêrxasekî wek Hadî di encama şerekî ku di navbera Şêxan û malbateka Gundê Bacetê Mala Bayrem de diqewime. Di civaka Kurdan de mijara Şêxan ji dîrokê ve xwedî cihekî girîng e. Ji aliyê civaknasiyê ev mijar hêjayî lêkolînan e. Ji ber ku Kurd qewmekî oldar bûne, gîrêdana wan ya şêxan zehmet nebûye. Lêbelê mixabin hin şêxan kedxwariyek mezin aniye serê Kurdan.

Niha jî dema mirov li nav civaka Kurdan, li gundên wan digerin, mirov dibîne ku piraniya gundan wek tapû jî yên şêxan in. Li ser pişta gundiyên xîzan hin şêx bûne xwedî erd û milk û gelekî dewlemend bûne. Li gor agahiyên ku em ji dengbêj Salihê

Qubînî hîn dibin, gundê Bacetê ku şer li ser diqewime jî gundê şêxan e. Şêx li gor dilê xwe erdê gund bi kar tînin û difroşin. Herçiqas bavê Hadî ji kurê xwe re dibêje, kurê min tu nekeve nav vê niqaşa li ser gund, dîsa jî Hadî vê yeka ku şêx dikin wek neheqî û zilm dibîne û xwe di nav şer de dibîne û ev yek dibe sedemê kuştina wî.

### 2.2.2. Berhemên Evînî/Dilan

Di berhemên dengbêjan de mijareke sereke jî evîn e. Mijara evînê her tim ji dengbêjan re bûye îlham. Evîna ku dengbêj di kilam û stranên xwe de cih didinê piranî jî evîna di navbera qîzeka bedew û xortekî qeşeng pêk tê. Carna jî dengbêj evînê wek mecaz bi kar tîne û eşqa xwe ya li ser xwezayê an jî ajalekî wek evînek rasteqîn dihone û vedibêje. Kendal Nezan di gotara xwe ya bi navê "Mûzîka Kurdî" de wisa behsa vê mijarê dike: " Besteya 'kilamên dilan' piraniyên wan ji aliyên jinan ve hatine çêkirin. Piranî kurt in, sade û bitevahî xwedî vesaziyeke serbest in."[92]

Hüseyin Gündüz behsa çîrokên evînê yên Kurdan dike de ji bo evînê di berhemên dengbêjan de wisa dibêje: " Dengbêjek di kilam an jî strana xwe de evînê ewqas xweş bi kar tîne ku guhdar mest dibin. Li Kurdan jin û keçên herî delal di kilamên dengbêjan yên evînî de cihê xwe digirin."[93]

Dengbêj Salihê Qubînî çewa me li jor jî diyar kir berhemên dengbêjan wek dertbêjî û dilbêjî dike du şax û di mijara evîna ku di degbêjiyê de wisa dibêje: "Ji kilamên dilbêjiyê qesta min ne tenê evîna xort û qîzekî ye. Dibe ku mirov evîndarê bexçeyekî şîn, tije gûl û reyhan an jî çiyayekî hertim biberf jî bibe. Ango qesta min ev e ku mirov çi di dilê xwe de bihebîne dikare li serê kilamêkî bibêje."[94]

Dengbêj di berhemên xwe yên evînî de bitaybetî li ser jîn û keçan teswîrên curbecûr û cuda dikin. Hêmanên erotîk yên bedena jin û keçan jî di kilam û stranên dengbêjan cihekî taybet digirin. Ev yek pir caran ji devê jinan jî di kilamê de tê gotin. M.Zahir Kayran vê yekê wisa tîne ziman û mînakekî jî dide: "Di destana Xelîl Bego de dengbêj dema pesnê delalekî[Edê] dide, hebûna wê bi awayekî hurgulî bi rêzê ve bi rêya şibandinê şênber dike.

*Nezera çavê wê kete kêrsim û didar û bejina Edê ye.*

---

[92] Mehmet Bayrak, **Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî**, Ankara: Weş. Özge, Cild 1, 2002. r. 55.
[93] Hüseyin Gündüz, **Çîrokên Evînê Yên Kurdan 1**, Stenbol: Weş. Do, 2009, r. 9.
[94] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 13.07.2018.

*Şewqa xwe dide çar terefê dinê ye.*

*Eniya wêne ji kokebê heyvê ye.*

*Çav û brûyê wêna hubra ser kaxitê ye.*

*Pozê wêna nukulê kewê ye.*

*Dev û lêvê wêna pelekî ji pelê Quranê ye.*

*Hinarê rûyê wê mîna sêvê Meletye, sor û sipî dike mîna pela berfa çiyê ye.*

*Diranê wê mina birincê Qerecdaxê ye.*

*Fistan nexişandiye ji pelê gulê ye.*

*Çar buhus û çar tilîya fistan dikeve erde ye.*

*Meşa wêna mina meşa werdeka ye.*

*Dertê ji golê ser mêrgê ye.*[95]

#### 2.2.2.1. Lawikê Dêmanî û Keçika Koçer

Eman were eman were lê wer koçerê lê wer koçerê

Gelo xwîn şîrînê Xwedê Rebî ax lo reng esmerê lê wer koçerê

Sing û berê vê telesê mîna bexçekî ji bexçê kurdîstanê

Gelo bi şev û rojê lê av li sere hê lê wer koçerê

Wele germa Temûz û tebaxê da vê lo mi xwe da berê lê wer koçêrê

Xaliq rebê alemê biqedîne miradê miradxwaza hazir û guhdara ser axret û îman û quranê û amîn rebî

Xaliq rebê alemê biqedîne miradê min û keçika koçer bike gavê koçer dagere ji zozanê jorî li devê riya Sêrtê gelo li goşê pira hayho vê Kezerê

Eman were eman were eman were eman were eman were

[95] Bayrak, **h.b. ,** r. 513-514

Keçika koçer di go were were lo dêmaniyo lo dêmaniyo

Gelo ne kurto ne dirêjo lo rihmaniyo lo dêmaniyo

Kuro şevekê ji nîvê şevan û pê de were binê konê mala bavê mi rebenê lo bi mêvaniyo lê dêmaniyo

Heyran wele konê mala bavê lo wa mi li jor e lo dêmaniyo

Were li bin konê mala bavê min tu rûnê çend kilama ji kalê bavê pîra dayka ax min re bêje lo dêmaniyo

Belkî rehma xwedê bikeve dile dê û bavê min evdala xwedê

Keçika koçer li lawikê dêmanî nayê ya ew kê dengbêj e

Lawikê dêmanî dibê keçika koçer heyra siya roja me derketî ji aliyê Siya

Şewq û şemala xwe da Kanîsorkê Hemdûna bexçê Êzidiya

Sibe bu ez ketime Geliyê Gûşana ez hatim pê de pê de ji xwe re dimeşiyam

Ez hatim sekinîm li ser Bîra Kirêdiya

Min bala xwe dayê sê zeriya sê esmera cêrê xwe hilandin lê ser Bîra Kirêdiya

Ez sekinîm li ber têlî Eyşê qîza Elî ye

Ev bêbava halê bilûb gaz bi ser min ketiye

Min ji paş ve deste xwe avêtê baqê reşkezi ya

Weke marê temûz û tebaxê na wele ji kevane ji kevanê lemûdiya

Min di qurpên bi vê bêbavê ket û hat û bi ser min de wergeriya

Min devê xwe xiste navbera mihêlê mircan û moriya

Şîrîne weka dimsa toriya

Gelek xweştir e ji helawa Sêrtiya

Zer dike weke mewîjê Babosiya

Spî ye mîna pelekê berfa Meretoyê

Zeraqê tavê da bû hat û bi ser dev û lêvê min diheliya”[96]

#### 2.2.2.1.1. Mijara Berhemê

Mijar evîna di navbera Lawikê Dêmanî û Keçika Koçer de ye.

#### 2.2.2.1.2. Naveroka Berhemê

Ev kilam, Salihê Qubînî li ser evîneka xwe ya ciwantiyê çêkiriye. Qesta wî ji Lawikê Demanî ew bixwe ye. Dema li gundê Kanîsorkê bûne ev bûyer qewimiye. Navê keçika koçer jî Eyşê buye. Navê bavê Eyşê jî Elî bûye. Salihê Qubînî di derheqê vê evînê de wisa dibêje: “ Ez, wê demê pir ciwan bûm. Mala me li Kanisorkê bû. Dema ez diçûm cot haya Eyşê jî ji min hebû, pir caran ji min re xwarin dianî. Hezkirina wê ji ya min zêdetir bû. Min wê revand em qederekî ji gund dûr bûn. Lê belê hatin wê ji min sitandin.”[97]

#### 2.2.2.1.3. Lehengên Berhemê

Lawikê Dêmanî, Eyşê, Elî

#### 2.2.2.1.4. Zimanê Berhemê

Di berhemê de ji bo xurtbûna ahengê ji aliyê dengbêj ve şibandin û teswîr hatine kirin. Wek mînak di rêzika ‘Gelo ne kurto ne dirêjo lo rihmaniyo lo dêmaniyo’ de ji aliyê keçika koçer ve bejna lawikê Dêmanî hatiye teswîr kirin. Lawikê dêmanî jî di van rêzikan de, gerdena keçika Koçer li gor taybetmendiyê xwe şibandiye dimsa Toriya, helawa Sêrtiya, mewîjên Babosîya û berfa spî ya çiyayê Meretoyê.

“*Min devê xwe xiste navbera mihêlê mircan û moriya*

*Şîrîne weka dimsa toriya*

*Gelek xweştir e ji helawa Sêrtiya*

*Zer dike weke mewîjê Babosiya*

*Spî ye mîna pelekê berfa Meretoyê*”.

---

[96] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.
[97] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Batman, 13.07.2018.

### 2.2.2.1.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji sê bendan pêk hatiye. Benda ewil ji heft, ya duyemîn ji heşt, ya dawî jî ji şazdeh rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê heyranok e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpa “i” serwa ye, tîpên “ya” jî paşserwa ne.

“Lawikê dêmanî dibê keçika koçer heyra siya roja me derketî ji aliyê S**i**_ya_

Şewq û şemala xwe da Kanîsorkê Hemdûna bexçê Êzîd**i**_ya_

Sibe bu ez ketime Geliyê Gûşana ez hatim pê de pê de ji xwe re dimeşiyam

Ez hatim sekinîm li ser Bîra Kirêd**i**_ya_”

### 2.2.2.1.6. Dahûrîna Berhemê

Berhem behsa evînê dike, Lawikê Dêmanî û Keçika Koçer li ser hev dibêjin. Di berhemê de behsa Sêrtê û hin gundan jî hatiye kirin. Gûşana, Kanîsorkê û Hemdûna çend gundên herêma Xerzanê in û niha jî ava ne. Ji van gundan Hemdûna xwedî cihekî taybet e. Ji ber ku ev gundê Êzidiya ye, niha jî Êzîdî li wir dijîn.

Dengbêj ji bo evîna xwe hin teswîrên xweser dike. Di heman demê de danasîna herêmê jî dike. Keziyên evîna xwe dişibîne marê temûz û tebaxê. Bi saya şibandinê em şîrînbûna dimsa Torîya, xweşbûna helawa Sêrtiya, zerbûna mewîjên Babosîyan hin dibin. Dengbêj mijar çi be jî gelek caran agahiyên cur be cûr jî dide guhdarvanê xwe.

### 2.2.2.2. Gorî Sebrê

Were gorî gorî gorî gorî gorî ax gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî gorî sebrê

Dilber heyran min go mala we li ser destê mala me ye

Kewê kûbarê dînê mi go mala me li binya destê mala we ye

Wele çavê min li rehma Xwedê li sîmayê bejna te ye

Wele dîtinê çava qinyata dila ji min û ji te re bêfayde ye

Ax gorî gorî gorî gorî gorî sebrê

Gorî heyran navê te nizanim ji te re dibêm filankesê
Weyla qam kinikê meş werdekê
Ez ê te bi qewlê resûlê Xwedê dixwazim
Heger te qebûl kir qebûl kir qebûl nekir çend saleka mîna xwişk û birayê hev û dinê di axretê
Ax gorî gorî gorî gorî gorî sebrê

Were gorî heyran na bi morî
Ez ê te dixwazim bi helalî ne bi kotek û ne bi zorî
Wele min te sipartiye rebê jorî
Gorî gorî gorî gorî Sebrê axx

Eman sebrê nav bi horî
Gerden spîya stû bi şûşe stû morî
Ez ê te dixwazim bi helalî ne bi kotekî ne bi zorî
Min te spartiye rebê jorî
Eman sebrê xwe li ba me ke xwe li wa me ke
Xwe ji bîr neke
Derd û kulê min raneke
Tu ya min î nizam Xwedê li jorê qeder neke."[98]

**2.2.2.2.1. Mijara Berhemê**

[98] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

Mijara berhemê evîn e.

#### 2.2.2.2.2. Naveroka Berhemê

Ev berhem jî, di encama evîneka dengbêj Salihê Qubînî de derketiye holê. Salihê Qubînî di derheqê naveroka berhemê de nexwest ku zêde agahiyan bide.

#### 2.2.2.2.3. Lehengên Berhemê

Sebrê,

#### 2.2.2.2.4. Zimanê Berhemê

Di berhemê de kesê aşiqê Sebrê wê şibandiye kewê. Dîsa di rêzikekî de bi gotina “stû şûşe”, stuyê hezkiriya xwe şibandiye şûşeyê. Bi gotina “Meş werdekê” jî meşa hezkiriya xwe wek meşa werdekê teswîr kiriye.

#### 2.2.2.2.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji çar bendan pêk hatiye. Benda ewil ji şeş ya dûyemin pênç, ya sêyemîn çar û ya dawî ji heşt rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê stran e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bikaranîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpa “e” yê serwa ye, tîpên “ye” jî paşserwa ne.

“Dilber heyran min go mala we li ser destê mala m**e** *ye*

Kewê kûbarê dînê mi go mala me li binya destê mala w**e** *ye*

Wele çavê min li rehma Xwedê li sîmayê bejna t**e** *ye*

Wele dîtinê çava qiniyata dila ji min û ji te re bêfayd**e** *ye*”

#### 2.2.2.2.6. Dahûrîna Berhemê

Di berhemê de behsa xwestina qîzê tê kirin. Li gor adetê Kurdan bi qewl û Resûlê Xwedê qîz tên xwestin. Tiştekî balkêş jî ev e ku revandin jî di nav adetên Kurdan de xwedî cihekî taybet e. Wekî ku di stranê de jî dibore ger keçik û lawik dilê wan bi heve be û xwestin çêbibe lê belê keçikê nedin lawik, gelekî caran revandin jî çêdibe. Revandina keçekî di nav gel de wek mêrantî, mêrxasî jî tê hesibandin.

### 2.2.2.3. Bavê Şikran û Zînê

Zinê dibê Bavê Şikran heyran bihar e

Ji kula dilê min re xweş bihar e

Mi di şeva nîvê şevê bavê Şikran kurikê bega li keçika êzîdî bûy mêvan e

Ez ê sala îsal bi qurbana bavê Şikran bim cim'ê feqîra topa lo êzîdxan e

Bavê Şikran heyran min û diyarê kevirbirê

Min ê bala xwe daye gulê daye ser nefelê

Xwezîka serê Bavê Şikran kurikê bega li min derê

Xwedê biqedîne miradê miradxwaza hazir û guhdara ser axretê îman û quranê

Xwedê biqedîne miradê min û bavê şikran bi hev û din li Qubînê li ser koçka dû tebeqê

Zînê dibê Bavê Şikran heyran çarçiya Qubînê diketim seranser e

Bejna bavê Şikran tak rihana gula zer e

Xelk aşiqê malê dinê dinyalix e

Ez evdala Xwedê bûm aşiqê Bavê Şikran kurikê bega yekî bejin bilind e reng esmer e

Zînê dibê bavê Şikran heyran çûm Qubînê devê va dikana

Bejna bavê Şikran zirav e mîna tak rihana nav bexça na

Ez pirsa bavê Şikran dikim

Dibê îro sê ro berê bavê şikran dane Sêrtê îfada ye.[99]

#### 2.2.2.3.1. Mijara Berhemê

Mijara berhemê evîn e.

[99] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

#### 2.2.2.3.2. Naveroka Berhemê

Mijara berhemê evîna di navbera Bavê Şikran û keçika Êzîdî ye. Ji bavê Şikran qest Salihê Qubînî ye. Şikran jî navê keça wî ye. Li gundekî Êzîdiya ku nêzî Batmanê ye bi navê Feqîran di nav hin gundîyan de şer çêdibe û di encama vî şerî de kuştin jî çêdibe. Ev kesên ku kuştinê dikin hin ji wan dikevin hepsê hin jî li gund dimînin. Lê belê dîsa jî bela xwe ji malbata din venakin û wan di gund de rehet nahêlin. Dema pîrekêN wan diçin ser avê, an jî diçin nav ajalên xwe bela xwe, li wan dixin.

Salihê Qubînî ji bo lihevanîna her dû malbatan dibe qasid, vê yekê wisa tîne ziman: “Ez wê demê li Qubînê dimam. Başçawîşê Qubînî ji bo ku van malbatan lihev bîne gazî min kir. Ji ber ku di nav civaka Kurdan de navê me hebû û gelek kesan me nas dikirin. Ez rabûm çûme gund. Camêran dema ez dîtim kêfxweşî li min dan, gelek qedir dane min û min neşikandin.

Ez derketim li ser xanîyekî min axaftinek biçûk kir. Piştî axaftina min li her dû malbat li hev hatin. Pênç şeş şevan min li gund kirin mêvan. Min û Zinê li gund hev dît û em dil ketin hev. Min dixwest pê re bizewicim lê nebû qismet. Vê paşiyê Zinê bû misilman, zewicî û hat li Batmanê bi cih bû.

#### 2.2.2.3.3. Lehengên Berhemê

Bavê Şikran, Zînê

#### 2.2.2.3.4. Zimanê Berhemê

Di berhemê de bi gotina “bejin bilind, reng esmer” Bavê Şikran ji aliyê hezkiriya wî ango Zînê ve hatiye teswîr kirin. Dîsa di rêzika “Bejna bavê Şikran zirav e mîna tak rihana nav bexça na” de Zînê jî bejna Bavê Şikran şibandiye tayek rihana ku di nav bexçeyan de.

#### 2.2.2.3.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa Berhemê Serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa jî hatine bi kar anîn. Berhem ji sê bendan pêk hatiye. Benda ewil çar ya dûyemîn pênç, ya dawî jî ji heşt rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê Heyranok e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên “an” serwa ne, tîpa “e” jî paşserwa ye.

“Zinê dibê Bavê Şikran heyran bihar *e*

Ji kula dilê min re xweş bihar *e*

Mi di şeva nîvê şeve bavê Şikran kurikê bega li keçika êzîdî bûy mêv**an** *e*

Ez ê sala îsal bi qurbana bavê Şikran bim cim’ê feqîra topa lo êzîdx**an** *e*”

#### 2.2.2.3.6. Dahûrîna Berhemê

Di berhemê de digel evîna di navbera du kesan de tiştekî yê bala mirov dikşîne ev e ku, armanca çûyîna dengbêj ya ji bo gundê Êzidiya. Çewa ku me li jor behsa rola dengbêjiyê di civatê kir, dengbêj ji bo her dû malbatên şer kirine wan li hev bîne tê peywirdar kirin. Ji vê yekê jî em fam dikin ku dengbêj di civakê de tên hez kirin û dema rewşak wisa derdikeve holê ew bi saya vê taybetiya xwe van pirsgirêkan çareser dikin û di civakê de dibin sedemê aşitî û biratiyê.

#### 2.2.2.4. Delîl Yadê

Delîl yadê heyran

Ez çûme Diyarbekir lo bi kevirê birî xirabo gundo

Mi dî siya serê sibê tava êvarê hat û lê li hev zivirî xirabo gundo

Mi dî kewa min î gozel derket ji Mêrg Ahmedê dest bi bazîn lo çavê bi girî xirabo gundo

Bira mi dî zeraqê tavê daye cotê memikê kewa min ê gozel

Mîna dû heb elektrikê berdaye sûrê de ji xwe re bi hikmê ceyranê

Ax lo dişixulî xirabo wayê

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Eman eman ax lê delil yadê xirabo gundo

Eman eman eman eman eman eman eman eman ax lo li vî dilî xirabo

Delîl yadê heyran bejina xelqa min a delal mîna çîçekan ax lo devê cadê lê delil yadê

Genimê mala bavê kewa min i gozel wile hatiye li ber bêjingê lo li ber seradê lê delil yadê

Bira yeqîna we ji xwedê bê heya dilem pê nekevê lo qîzê nadê

Eman eman eman eman eman eman eman eman neman

Ax lo li vî dilî xirabo gundo

Lo lo birawo mi go li vî sewdayî ax lo li vî aqilî

Wele çawa dev ji kewa gozel berda ye li qorê bergîla heftê heştê salî li êşiya konê reş ê erebî girêdayî

Dawiya emrê xwe de ji xwe re li vê qorbergilê lo dihesilî

Xiraboo."[100]

**2.2.2.4.1. Mijara Berhem**

Mijara berhemê evîn e.

**2.2.2.4.2. Naveroka Berhemê**

Berhem ji ber ku gelerî ye di derheqê naveroka wê de zêde agahî tune ne.

**2.2.2.4.3. Lehengên Berhemê**

Navê lehengan di berhemê de nediyar in.

**2.2.2.4.4. Zimanê Berhemê**

Di berhemê de lehengê veşartî hezkiriya xwe dişibîne kewê. Memikên hezkiriya xwe jî dişibîne du heb elektrîkê cereyanê. Di hin bendan de gotinên qalib hene û di nav xwe de wateyên weşartî dihewînin. Wek mînak rêzika "Genimê mala bavê kewa min i gozel wile hatiye li ber bêjingê lo li ber seradê lê delil yadê" tê wateya ku dem

[100] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

derbasbûye û wextê hin tiştan hatiye. Dîsa rêzika 'Dawiya emrê xwe de ji xwe re li vê qorbergilê lo dihesilî' du kesên ku li hev ne hatî lê li cem hev in tê qest kirin.

#### 2.2.2.4.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji sê bendan pêk hatiye. Bende ewil ji deh ya dûyemîn ji pênç ya sêyemîn jî ji çar rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê Lawik e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpa "d" serwa ye, tîpa "ê" jî paşserwa ye.

"Delîl yadê heyran bejina xelqa min a delal mîna çîçekan ax lo devê ca**d***ê* lê delil yadê

Genimê mala bavê kewa min i gozel wile hatiye li ber bêjingê lo li ber sera**d***ê* lê delil yadê

Bira yeqîna we ji xwedê bê heya dilem pê nekevê lo qîzê nadê

Eman eman eman eman eman eman eman eman neman"

#### 2.2.2.4.6. Dahûrîna Berhemê

Delîl Yadê wekî ku me li jor jî diyar kiribû berhemek gelêrî ye û ji aliyê gelek dengbêjan ve bi terzên cûda tê gotin. Lê belê Salihê Qubînî hin cihê berhemê li gor terza xwe guhertine, û cih lê zêde kirine.

#### 2.2.2.5. Çavreşê Birû Qorê

Dilber heyran te çavreşê lê birû qorê

Wele sing û bere te spî dike mîna pelekê berfa li zozanê jorî lê li Kosorê

Ez ê rabim te ji dê û bavê te bixwazim heke da ji xwe da heke ne da

Ez ê te birevînim bi kotek û lê bi darê zorê

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Ax neman neman ax lo li vî dilî

Dilber heyran mi go li te çavreşê lê birû pûşê

Wele sing û bere te spî dike mîna pelekê berfa zozanê jorî ax lê li çiyayê Mûşê

Bi qerar û qesem nadim terka bejina bilind çavê reş û belek nadim

Heya te nebinim li ser tara vê dergûşê

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Ax neman neman ax lo li vî dilî.[101]

**2.2.2.5.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhemê evîn e.

**2.2.2.5.2. Naveroka Berhemê**

Berhem gelerî ye û behsa evînê dike. Naveroka ji ber ku gelerî ye nediyar e.

**2.2.2.5.3. Lehengên Berhemê**

Lehengên berhemê wek nav nediyar in.

**2.2.2.5.4. Zimanê Berhemê**

Di berhemê de spîbûna singê hezkiriya xwe şibandiye pelekî berfê. Birûyên hezkiriya xwe jî şibandiye pûş ê. Ji qorbûna birûyan jî qest xweşikbûn û rêkûpêkbûna wan e.

**2.2.2.5.5. Teşe û Cûreya Berhemê**

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji du bendan pêk hatiye. Her du bend jî şeş rêzik in. Cûreya berhemê Lawik e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên “or” serwa ne, tîpa “ê” jî paşserwa ye.

“Dilber heyran te çavreşê lê birû q**or***ê*

Wele sing û bere te spî dike mîna pelekê berfa li zozanê jorî lê li Kos**or***ê*

Ez ê rabim te ji dê û bavê te bixwazim heke da ji xwe da heke ne da

[101] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

Ez ê te birevînim bi kotek û lê bi darê z**or***ê*"

**2.2.2.5.6. Dahûrîna Berhemê**

Ev berhem jî wek wan berhemên din yên gelerî ji aliyê Salihê Qubînî ve li gor şêwaza wî ji nû ve hatiye çêkirin. Dengbêj li gor terza xwe hin cihên berhemê guherandine û hin cihan jî lê zêde kirine.

**2.2.2.6. Dîlber**

Xelkê neman bê neman û wê eman eman

Wele çiyayê pişta mala gelo ji zinarê bilind lê ji kevirê qul tê neman lê neman wê neman li min

Rebî bi qurbana te me çiqa wele bedewiya li dinyayê wê heye lê çiqa lê tê wê neman bê neman eman li min

Wele ew cotê memikê kewa minê gozel gelo mîna ne du heb sêvê Ortemêtê

Mirov ji xwe re sipariş ke ji nav dewêla lê wecnebi tê

Neman bê eman neman li min

Eman dîlber heyran mi go

Ew qolê bava bişewite lê bi dar û bî ne neman bê neman

Wele lê diçêrin birek kavir lê sê qormî ne

Neman bê eman eman li min

Weyla mala min bi xulama bejina bilind

Wele tê ji mehela Jorî lê xwe dihejîne

Neman bê neman neman li min

Weyla mala min bi xulama bejina vê xulikê şîrîn

Wele çawa stêra ji belek çava hê lê dibarîne

Neman bê neman neman li min

Di go kurê malxiraba ji do de wele xwezginiyê min hatine şîraniya mi xwarine qelenê lo mi birîne

Neman bê neman neman li min."[102]

**2.2.2.6.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhemê evîn e.

**2.2.2.6.2. Naveroka Berhemê**

Berhem di eslê xwe de ji ber ku gelerî ye di derheqê naveroka wê de agahî tune ne.

**2.2.2.6.3. Lehengên Berhemê**

Lehengên berhemê wek nav nediyar in.

**2.2.2.6.4. Zimanê Berhemê.**

Di berhemê de şibandin heye. Wek mînak di rêzika 'Wele ew cotê memikê kewa minê gozel gelo mîna ne du heb sêvê Ortemêtê' de hezkiriya xwe dîsa wek hin berhemên din şibandiye kewê û memikên wê jî şibandiya sêvan.

**2.2.2.6.5. Teşe û Cûreya Berhemê**

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hene. Berhem ji sê bendan pêk hatiye. Benda ewil şeş ya dûyemîn heft ya sêyemîn jî ji pênç rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê Lawik e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpa "r" serwa ye, tîpên " îne" jî paşserwa ne.

"Weyla mala min bi xulama bejina vê xulikê şîrîn

Wele çawa stêra ji belek çava hê lê diba**r***îne*

Neman bê neman neman li min

[102] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

Di go kurê malxiraba ji do de wele xwezginiyê min hatine şîraniya mi xwarine qelenê lo mi bi**r***îne*

Neman bê neman neman li min.”

**2.2.2.6.6. Dahûrîna Berhemê**

Berhema Dilberê gelerî ye. Bi navê dîlberê kilamên gelek dengbêjan hene. Ev berhem jî Salihê Qubînî li gor terza xwe çi nû ve çêkiriye.

**2.2.2.7. Şêxa Dînê**

Şêxa dînê heyran ez ne şêx im lê lê Lê wez derwêş im

Werî lê lê lê herî lê lê lê lê

Ez ê herim cem qesabê diyarbekir

Ez ê kêrekî qesaba bînim

Serê dile lê xwe biqelêşim

Weri lê lê lê herî lê lê lê

Wele kul û derdê dilê min zahf in

Ez ê rûnim temamî ji şêxa xwe re lê we bibêjim

Wele ez ê ji eşqa dilê rezil ax lê ez kerr û gêj im

Werî lê lê lê ax herî lê lê lê

Eman eman eman eman eman eman eman

Şêx ê heyran ti ne li malî

Şêxa dînê heyran mi yar î kir rebenê lê te yarî kir

Lê werî lê lê herî lê lê

Wele min dî ber û bişkok qetiyan ax lê sing spî kir

Werî lê lê herî lê lê

Wele fesad ewan û şeytanê gundê mala bavêm li pişta dîwar li min û şêxa delal lê guhdarî kir

Werî lê lê herî lê lê

Wele min dî çûne odeka mala şêxa dîna min rûniştin li min û li şêxa delal Ax lo fesadî kir

Lê werî lê lê herî lê lê

Wele dê û bavê şêxa min berê xwe dane qereqolê li min û li şêxa delal lê li me gilî kir

Werî lê lê herî lê lê

Şêxê bila Xwedê ji mixtar û azayê gundê me razî be

Ewan derdê dilan li Xwedê ti li min û şêxa delal ax lo sitarî kir

Werî lê lê herî lê lê

Di go here kuro haydê qîzê wele her du ji xwe re zarok bûn ji xwe re nefêdî kir

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Neman eman lê werî lê lê herî lê lê

Eman eman eman eman eman eman ti şêxa min î lê ez mirîdê te me

Şêxa dînê heyran îro li ser bana lê wez û tu ne

Werî lê lê werî lê lê

Gidî wele min go li bin bana lê em her du ne

Werî lê lê werî lê lê

Wele dinya alem hima bê hemî zane ez û şêxa xwe em aşiqê lê hev û du ne

Werî lê lê lê lê

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Şêxê heyran ti ne li malî

Şêxa dînê heyran îro li palê çiyê li hafê va hala rebenê lê gula zer kir

Ax werî lê lê herî lo lo

Wele ez û şêxa delal çûne çiyê ax me gul çinî lo me li ber hev kir

Werî lê lê lê lê

Ez û şêxa delal rûniştin me yê ji xwe re îro gilî kirin ax lê gazîn hiştin

werî lê lê lê lê

Ez û şêxa delal me yê me yê ji xwe re îro bi tene dinya girtî rebenê lê û axret terk kir

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Ax neman eman eman eman

Ax herî lê lê lê werî lo lo lo

Eman eman eman eman eman ti şêxa min î lê mirîdê te me

Şêxa dînê heyran

Em ê çibikin ax rebenê lê ji xeberdana

Ax werî lê lê herî lê lê

Şêxa dînê heyran we mê çibikin lê ji qisedana

Werî lê lê lê lê

Şêxê heyran min go gul çêbûn e lê li zozana

Werî lê lê werî lê lê

Wele ji te pêştir min kes nedî gelo hôrî çêbun ax rebenê lê ji însana

Werî lê lê herî lê lê

Eman eman eman eman eman eman eman eman

Şêxê heyran lê tu ne li malî."[103]

**2.2.2.7.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhemê evîn e.

**2.2.2.7.2. Naveroka Berhemê**

Berhemek gelerî ye û naveroka wê nediyar e.

**2.2.2.7.3. Lehengên Berhemê**

Lehengên berhemê wek nav nediyar in.

**2.2.2.7.4. Zimanê Berhemê**

Di berhemê de hin motîf û hin gotinên qalib dîsa hatine bi kar anîn. Wek mînak di rêzika "Wele min dî ber û bişkok qetiyan ax lê sing spî kir" de ev gotin di gelek berhemên dengbêjan de bi heman terzê tê xuyakirin. Ji nîşka ve qetandina bişkokên hezkiriyê û derketina holê singên wê yên spî tê teswîr kirin.

Dîsa peyvên wek "fesad û ewan" jî di gelek berheman de derdikevin hemberî me. Fesad û ewan her tim nûnerê xerabî û nebaşiyê ne. Nahêlin ku hezkirî bigihêjin hev dibin sedemê miradê wan. Lê digel fesad û ewanan çewa ku dengbêj di vê berhemê de jî bi kar anîye mezinên gund ango di vir de "axa û Azayên gund" mezinatiya xwe didin nîşan û vê rewşa sitarê li vê rewşa hezkiriyan dikin. Ev yek jî di gelek berheman de wek gotinek qalibî dibore.

**2.2.2.7.5. Teşe û Cûreya Berhemê**

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hene. Berhem ji pênc bendan pêk hatiye. Benda ewil diwazdeh ya dûyemîn şazdeh ya sêyemîn neh û herdu bendên dawî jî ji yazdeh rêzikan pêk hatine. Cûreya berhemê Lawik e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de "î" serwa ye, tîpên "kir" jî paşserwa ne.

"Şêxa dînê heyran mi yar î kir rebenê lê te yar**î** *kir*

[103] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

Lê werî lê lê herî lê lê

Wele min dî ber û bişkok qetiyan ax lê sing sp**î** *kir*

Werî lê lê herî lê lê

Wele fesad ewan û şeytanê gundê mala bavêm li pişta dîwar li min û şêxa delal lê guhdar**î** *kir*

Werî lê lê herî lê lê

Wele min dî çûne odeka mala şêxa dîna min rûniştin li min û li şêxa delal Ax lo fesad**î** *kir*

Lê werî lê lê herî lê lê

Wele dê û bavê şêxa min berê xwe dane qereqolê li min û li şêxa delal lê li me gil**î** *kir*

Werî lê lê herî lê lê”

#### 2.2.2.7.6. Dahûrîna Berhemê

Berhema Şêxa Dînê gelerî ye. Lê belê Salihê Qubînî li gor xwe hin cihên berhemê guherandine û hin cih lê zêde kirine. Ji xeynî Salihê Qubînî li gor terza xwe ya xweser dengbêjên wek Dengbêj Elî nas, Dengbêj Newaf Bavê Ehmed û Mihemedê Meskenî, bi navê “Şexa Dînê”; Mihemed Arifê Cizrewî, Dengbêj Huseynê Omerî û Mirado[Miradê Kinê] jî bi navê “Şêxa Delal” dibêjin.

### 2.2.2.8. Sebrê Bihar e

Lê lê li lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê ha wî li lê lê lê wî lê lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê

Lê lê Sebrê kubarê bêbavê dînê min go bihar hat û Sebrê dilê min wele lê ne tu wext e

Heyla kewê kubarê kubarê bêbavê dînê mi go bihar hat û Sebra dilê min wele lê ne tu wext e

Xwedê zane gul û giya li zozanê jorî bûne lê weka text e

Heçî evd û însanê jinika wî delal e

Wele bila nebêje ji mêrani ya min e ew ji siûd û îqbal û bext e

Wî li lê lê lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê

Lê lê Sebrê kubarê bêbavê dînê wezê bimrim sala îsal wele tu sebebî

Hey la kewê kubarê bêbavê dînê wezê bimrim sala îsal gelo wele tu sebebî

Ez ê gavê bimrim bila mezelê min ê li hewşa mala dê û bavê te bî

Ti wê rojê pênc ferza desmêj bigre li ser min bisekine

Piyê xwe li kêlika min xe

Bêje rabe meyto ji qebrê derve hezar rehmet lo li gora te bî

Wî li lê lê lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê

Lê lê Sebrê kubarê bêbavê dînê min go yarî sed cara li bi min yarî

Ez ê rabim sala û îsal ser ava Bişêriya şewitî li hindava Şêxewinda Qubînê ji xwe re çekim lê pireka darî

Ez ê rabim diakî ji rebê xwe bixwazim

Ji hewara Xwedê rebê aleme çi li melekê erda çi ê li ezmanî banî bilind

Ez ê dia bikim cimeeta hazir bêje amîn

Lê belkî sala îsal bavê qîzê bimre ez herim ser malê rûnim ji xwe re bi delalî

Wî li lê lê lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê

Lê lê Sebrê kubarê bêbavê dînê navê te nizanim

Navê te dibên navê sebra dilê min Sebrê ye

Heyla kewê kubarê navê te hilnadim navê sebra dile min Sebrê ye

Bila Sebebê min û Sebra dilê min xêr nebîne

Wî li lê lê lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê."[104]

**2.2.2.8.1. Mijara Berhemê**

Mijara Berhemê evîn e.

**2.2.2.8.2. Naveroka Berhemê**

Dengbêj Salihê Qubînî di vê berhemê de behsa evîna xwe û Sebrê dike. Sebrê qîza Mahmûdê Qirê ye. Salihê Qubînî, Sebrê ji bavê wê dixwaze lê wê nadinê. Wek sedem jî bavê keçikê dibêje wille Salih yekî beredayîye ez keça xwe nadim wî. Salihê Qubînî dixwaze Sebrê birevîne lê belê vêca Sebrê qîma xwe nayne. Li ser vê evînê Salihê Qubînî bîranîneka xwe wisa tîne ziman: "Kurê Birahîmê Hacî Selîm jî dil ketibû Sebrê. Li gund hima digihişte kî, ji wan re digot ka herin ji Sebrê re bibêjin min qebûl nake.

Li ser wê dîn bibû. Rojekî diçe pêşiya Ehmedê kurê Osmanê şivan jê re dibêje ka here cem Sebrê jê re bibêje mesela min. Roja din Ehmed dibîne. Dibêje te jê pirsî, çi bersiv da te. Ehmed dibêje belê min jî pirsî got bila bi qeştî herî. Rojekî ji min re jî got tu hima dibê alîkarî xelkê, ji wan re qîza dixwazî. Hima ji min re jê Sebrê birevîne. Çewa wisa got ez di dilê xwe de qehirîm û hima mabû ez lê bixim. Ji ber ku dilê min jî bi Sebrê ve bû.

Ez fikirîm min ji xwe re got ez lê bixim çênabe. Min ji xwe re got ez dê lîstikekî bînim serê wî û bila hevalên min lê bixin. Min jê re got here kara xwe bike, sibehê ez ê Sebrê ji te re birevînim û li derveyê gund teslîmê te bikim. Min êvarê deh panzed ciwanan dan hev û mesele ji wan re got, me cilên qîzan li ciwanekî kir çewa ku Sebrê be. Sibehê li derveyî gund em li benda wî bûn. Hat cem me li keçikê nihêrî fam kir ku ew zilam e. Min got kuro tu gunehî ez ê pera bidim te hima ji axa Qubînê derkeve, here

[104] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

ji van deran. Çewa min wisa got kir ku bireve ciwanan wî girtin bêhna wî derxsitin ji lêdanê. Piştî vê bûyerê çend salekî bi min re neaxivî."[105]

**2.2.2.8.3. Lehengên Berhemê**

Sebrê, Bavê Sebrê

**2.2.2.8.4. Zimanê Berhemê**

Dengbêj hezkiriya xwe şibandiye kewê. Hin gotinên qalib hatine bi kar anîn. Wek mînak di rêzika "Xwedê zane gul û giya li zozanê jorî bûne lê weka text e" de qesta bihorandina demê, hatina demsaleka nû hatiye kirin. Disa wek gotinek qalib di rêzika "Lê belkî sala îsal bavê qîzê bimre ez herim ser malê rûnim ji xwe re bi delalî" de jî ji bo bavê qîzê nifir hatine kirin. Ji ber ku bav ji bo evîna wan dibe asteng hezkiriyê qîzê daxwaza mirina wî dike û dixwaze li ser malê wî jî rûne.

**2.2.2.8.5. Teşe û Cûreya Berhemê**

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji çar bendan pêk hatiye. Benda ewil neh yên dûyemîn û sêyemîn heşt ya dawî jî ji şeş rêzik in. Cûreya berhemê Stran e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên "ext" serwa ne, tîpa "e" yê jî paşserwa ye.

"Heyla kewê kubarê kubarê bêbavê dînê mi go bihar hat û Sebra dilê min wele lê ne tu w**ext** *e*

Xwedê zane gul û giya li zozanê jorî bûne lê weka t**ext** *e*

Heçî evd û însanê jinika wî delal *e*

Wele bila nebêje ji mêrani ya min e ew ji siûd û îqbal û b**ext** *e*

Wî li lê lê lê li lê lê li lê lê li lê lê hewî li lê lê

De rabe li dinyayê tobedara te me Sebra min lê lê"

**2.2.2.8.6. Dahûrîna Berhemê**

---

[105] Mehmet Salih Yorulmaz, Dengbêj, " Li ser mijara dengbêjiyê", Batman, 13.07.2018.

Di berhemê de tişta balkêş eve ku, pir caran ji bo her dû evîndar bihigîjên hev gelekî astengî derdikevin. Li vir jî astenga mezin dê û bavê keçikê ne. Ji ber evîna xwe kurik ewqas ketiye rewşek xerab ku mirina dê û bavê keçikê dixwaze. Ger ku bimire jî sedemê vê yekê evîna xwe dibine û daxwaz dike ku wî li bexçeyê dê û bavê keçikê veşêrin.

### 2.2.3. Berhemên Şînê/Zêmar

Em di berhemên dengbêjan de pir leqayî mijara şînê jî dibin. Bitaybetî di çanda Kurdî de ji zêdebûna şeran, lihevxistin, neyartî û kuştin jî pir in. Bi gelemperî ev kilam û sitran di encama van bûyeran de derdikevin holê.

Canser Kardaş di teza xwe ya doktorayê de cûreya zêmarê wisa pênase dike:"Zêmar ku wek laya, laja jî tê binavkirin, ji berên ku naveroka wan ji dîn pêk tê re tê gotin."[106]

Di pirtûka bi navê "Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî" ya ku di bin edîtoriya lêkorîner Mehmek Bayrak de derketiye di gotarekî de zêmar wisa hatiye pênase kirin: " Zêmar, bitaybetî ilhama xwe ji dîn distîne û piranî di cenazeyê qîz û xortên ciwan yên negihaştine miradên xwe de tên gotin."[107]

Zelal Özağaçhanlı vê cûreya dengbêjiyê wîsa pênase dike: " Kilamên evînî yên mijarên xwe ji du evîndarên negihiştine hev, an jî zêmarên li pişt miriyekî tên vegotin distînin, li gor destan û çîrokan kurt in, bi formeka serbest tên gotin û binavê lawik, zêmar an jî lawje tên binav kirin re tê gotin."[108]

#### 2.2.3.1. Loqman Birazî

Were menal menal menal menal menal menal menal ooo Loqman Birazî lo

Were menal menal menal menal menal menal lo Loqman Birazî lo

---

[106] Kardas**, h.b,** s. 168.

[107] Bayrak, **h.b.** , r. 133.

[108] Zelal Özağaçhanlı, **Kürtlerde Sözlü Kültür ve Hikâye Anlatıcılığı: Dengbêjlik Geleneği,** Kimlik, Kültür ve Değişim Sürecinde Osmanlı'dan Günümüze Kürtler Uluslararası Sempozyumu, Bingöl: 6-8 Eylül, 2012, s. 795.

Were menal menal menal menal menal menal lo lo mam bi gorî loooo waye waye ax

Were menal menal menal menal menal menal lo lo xweşmêro loooo waye wayee

Loqman birazî heyran wezê bi çiyayê Sasûnê pişta Simaîlka ketim loo lo li ber cadê de lo

Ez ê bi Qewsanê pişta Şêxika ketim lo li ber cadê de lo

Belkî kula xwedê bi kul be bikeve derê mala bavê yûzbaşiyê lo eskeriyê lo

Çewa derbekî daye li bejin û bala Loqman Birazî şervanê azadiyê

Wele gulê çar tiliya girtiye ji mîrata lo kezebê lo

Wele sê dilopê xwîna reş niqitî xwe berda ser kabokê lo lo qunderê lo

Were menal menal menal menal menal menal lo lo Loqman Birazî lo

Were menal menal menal menal menal menal lo lo mam bi gorî lo

Loqman birazî heyran wezê bi çiyayê Sasûnê pişta Simaîlka ketim êvar e loo lo li me şev e loo

Ez ê bi Qewsanê pişta Şêxika ketim loo lo li me şev e loo

Wile şade şûdê Loqmanê Birazî çend şervana hene loo lo li dinê lo

Wele çawa êrîşan dide li ser panzêra lo lo li ser cadê ye lo ooo

Belkî kula Xwedê bi kul be bikeve derê mala bavê yûzbaşiyê loo lo li taqîbê lo

Çawa derbekî da ye li bejin û bala Loqmanê birazî şervanê azadiyê

Welle gulê çar tiliya girtiyê ji mîrata lo ax kezebê lo

Were menal menal menal menal menal menal lo Loqman birazî lo

Were menal menal menal menal menal menal lo lo mam bi gorî loooo waye waye ax

Were menal menal menal menal menal menal lo lo xweşmêro loooo waye wayee

Ez ê bi destê Loqmanê birazî şerwanê azadiyê bigirim bigerînim li ser hekîma li ser tixtora ax lo li dinê lo

Welle dibê gulê çar tiliya girtiyê ji mîrata lo ax kezebê lo

Were menal menal menal menal menal menal lo loo şervano lo

Were menal menal menal menal menal menal lo birîndaro lo”[109]

**2.2.3.1.1. Mijara Berhemê**

Mijara berhemê Şîn, mêrxasî û kuştin e.

**2.2.3.1.2. Naveroka Berhemê**

Loqman biraziyê Salihê Qubînî ye. Navê bavê wî Qasim e. Loqman bi karen polîtîk ve mijûl dibe. Ev yek jî çend caran dibe sedemê girtina wî. Di girtîgehan de pir caran îşkence jî dibine. Cara dawî ku Loqman ji girtîgehê derdikeve venagere malê. Piştî demekî Loqman û sisê hevalên xwe vedigerin û Li gundê Smaîlka ku girêdayî Navçeya Sasonê ye nêzî Qerekolê bi leşkeran re dikevin nav şer de û li vir Loqman tê kuştin.

**2.2.3.1. 3. Lehengên Berhemê**

Loqman.

**2.2.3.1. 4. Zimanê Berhemê**

Dengbêj ji bo mêrxasiya leheng bîne ziman di rêzika “Wile şade şûdê Loqmanê Birazî çend şervana hene loo lo li dinê lo” de peyva “ şade şûd” bi kar anîye. Ev peyv di gelek berhemên ku mijar mêrxasî an jî şer e ji bo lehengan tê bi kar anîn. Di rêzika ‘Wele sê dilopê xwîna reş neqitî xwe berda ser kabokê lo lo qunderê lo’ de jî bi awayekî hurgulî birîndarbûna leheng hatiye teswîr kirin.

**2.2.3.1.5. Teşe û Cûreya Berhemê**

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hene. Berhem ji du bendan pêk hatiye. Benda ewil diwazdeh ya din jî çardeh rêzik in. Cûreya berhemê şîn e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi

[109] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpa “b” yê serwa ye, tîpa “ê” yê jî paşserwa ye.

“Belkî kula xwedê bi kul be bikeve derê mala bavê yûzbaşiyê loo lo li taqî**b***ê* lo

Çawa derbekî da ye li bejin û bala Loqmanê birazî şervanê azadiy*ê*

Welle gulê çar tiliya girtiyê ji mîrata lo ax keze**b***ê* lo

Were menal menal menal menal menal menal lo Loqman Birazî lo”

**2.2.3.1.6. Dahûrîna Berhemê**

Ji naveroka berhemê diyar e ku Salihê Qubînî pir di bin bandora mirina biraziyê xwe Loqman de maye. Kuştina wî bi awayekî hurgulî û bi dilşewatî vedibêje.

**2.2.3.2. Bav û Qîz**

Were bavo bavo bavo bavo bavo bavo bavo

Were bavo bavo bavo qîz bi gorî

Were bavo bavo ez qîza te me

Meyrem dibê bavo ez qîza te me bavo

Wele warê bavê min warê qîza ji te re bêfayde ye

Were bavo bavo bavo qîz bi gorî

Dayê wele bavê min bavê qîzan e bavo

Wele serweta bavê min giran e bavo

Wele bavo bavo ez qîza te me

Ezê şûrê Şamê li pişta te me bavo

Wele warê bavê min warê qîza ji te re bêfayde ye

Were bavo bavo bavo qîz bi gorî

Meyrê dibê daye ma gundê me gundê filla ne bavo

Wele sê çar malê misilman têda ne bavo

Wele bavê min kuştin bi tevra bi balta ne bavo

Were bavo bavo bavo qîz bi gorî

Dayê bavê min siwar e ji bajêr tê bavo

Wele cotê demaça li kêlekê wê çiqa li te tê bavo

Wele bavê min kuştin heyfa herkesî lê tê

Were bavo bavo bavo ez qîza te me bavo

Ezê şûrê Şamê li pişta te me bavo

Wele warê bavê min warê qîza ji te re bêfayde ye

Were bavo bavo bavo qîz bi gorî."[110]

**2.2.3.2.1. Mijara Berhem**

Mijara kilamê şîn û şewat e.

**2.2.3.2.2. Naveroka Berhemê**

Meyrê keçeka ji gundê Leglega girêdayi yê Amedê ye. Pênç xwişkê wê hebûn. Birayên wê tûnebûn. Bavê wê li gund ji aliyê Hizbuleçî yan ve bi tevran û balteyan bi xedarî tê kuştin. Meyrê ji bo li ser kuştina bavê xwe kilamêkî bide çêkirin dikeve pey dengbêjan. Li Amedê çend cihan pirs dike berê wê didin Batmanê cem dengbêj Salihê Qubînî. Li ser vê yekê jî Salihê Qubînî bûyera kuştina bavê Meyrê ji devê wê guhdar dike û vê zêmarê diavêje li ser bavê wê.

**2.2.3.2.3. Lehengên Berhem**

Bav û qîza wê Meyrê

[110] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.

#### 2.2.3.2.4. Zimanê Berhemê

Di berhemê de ji aliyê ziman ve zêde gotinên wek qalib an jî motîfên xurt nehatine bi kar anîn. Tenê di rêzika "Ezê şûrê Şamê li pişta te me bavo" de Meyrê ji ber ku pir li ber bavê xwe ketiye, dema behsa mêrxasiya wî de ev gotin bi kar anîye.

#### 2.2.3.2.5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê Serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hene. Berhem ji çar bendan pêk hatiye. Benda ewil ji sê ya dûyemîn neh ya sêyemin çar ya dawî jî ji 7 rêzik in. Cûreya berhemê Şîn e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên "an" serwa ne, tîpa "e" jî paşserwa ye.

"Were bavo bavo bavo qîz bi gorî

Dayê wele bavê min bavê qîz**an** *e* bavo

Wele serweta bavê min gir**an** *e* bavo

Wele bavo bavo ez qîza te me"

#### 2.2.3.2.6. Dahûrîna Berhemê

Di jiyanê gelek bûyer tên serê mirovan. Ji van bûyeran hinek gelekî dilsoj in. Ji ber ku carna di encama van bûyeran de kesên biqedir wek dê û bavên mirov an jî hevalên mirov dimirin an jî tiştên nexweş tên serê wan. Pir caran mirov ji bo ku van ji bîr neke dixwaze hertim behsa wan bike. Ji ber vê yekê jî çîroka jiyana wan mirov dixwaze qeyd bike. Vî karî jî kesên bi hostatî û hûnertî dikin bêguman dengbêj in.

Di hevpeyvîna min û Salihê Qubînî de wî ji min re got ku bi dehan kes tên dibin mêvanê wî û hin çîrokên di derheqê jiyana xwe û malbata xwe de jê re dibêjin û jê daxwaz dikin û van çîrokan wek kilam ji wan re bibêje û ew jî qeyd bikin. Hin kes tenê dixwazin ew qeyd bi wan tenê re hebin hin jî dibêjin bila li her deverê belav bibe.

### 2.2.3.3. Şêx Şabedîn û Seyîd Elî

Ax li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo

Ax de li lo li lo li lo li lo li lo li wey la li min nemayê wayê

Hey la lê dayê rebenê sibeye wezê bi diyarî Xeyda yê Geliyê Hîzanê diketim gelo gelî bi gelî

Heyla nemayê sibeye ez ê bi diyarê Xeyda yê Geliyê Hîzanê diketim gelo meşiyam ji xwe re gelî bi gelî

Tê de rabûne sê heb welî:

Şêx Şabedîn, Mihemed Şîrîn, Seyîd Elî

Piştî va seyîda ez çi bikim tekiya mala xews birawo li me maye xalî

Ax bê li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo

Bê de li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo weyla li min ne mayê

Heyla lê dayê rebenê sibeye wezê bi diyarê Belîsê diketim gelo bi dikan e

Wey lo nemayê ez ê bi diyarê kavila Belîsê diketim gelo bi dikan e

Sibe ye mi bala xwe daye walî û qomitan li hev civiyan e

Reîsê umûmî bêîman e ji ba xwe ra kiriye ferman e serê Kurda mîna serê şêxan û mela ne

Gelo reîsê umumê bêîman e ji ba xwe ra kiriye fermana sere Kurda mîna serê şêxan û mela ne.

Ji tirsa hikûmeta romê temamê şêx û seyîd û murşîdê me bûne firar û mahkûmê li serê çiya ne

Piştî va seyîda va murşîda kesekî tekiya mala xews de bira nemaye

Ax bê li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo

Bê li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo weyla li min nemayê

Heyla lê daye rebenê sibe ye wezê bi diyarê Erdîşê geliyê Zîlan diketim li hember e

Heyla nemayê sibe ye wezê bi diyarê Erdîşê geliyê Zîlan diketim li hember e

Weyla Sedîqê Mamo lawo li dinyayê belkî kok û zireta te biqele

Min ê go ew ya seyîd in, li avdelê ji zireta pêxember e

Ketine pêşiya sê tabur eskerê cimhuriyetê li taqîba va seyîda va şêxa va seyîda lawo mi go tu bes bigere

Belkî xaliq rebê alemê kurê te bikuje lawo li taqîba va şêxa va seyîda bes bigere

Seyîd Elî destê xwe avêtiyê sedîrê Şêx şabedîn di go bira ti yanîş nebe ev ne karê mala me ye

Ev ne çêdibin Şêx Celaledîn anîne welayeta Wanê li dewsa qahwê fincana jahrê gelo dane ber wî

Bira wele ev ne çêdibî Şêx Celaledîn anîne welayeta Wanê li dewsa qahwê fincana jahrê dane bere

Destê va Şêx û murşîda girtin xistin darê kelemçê bere wa dane kavila Belîsê

Yeqîn be bi çavê sere xwe şêrît avêtin qirika ewladê pêxember e lo

Ax bê li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo

Bê li li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo weyla li min nemayê wayê

Heyla lê dayê rebenê sibe ye wezê bi diyarê Belîsê diketim di kortê de

Heyla lê nemayê ez ê bi kavila Belîsê diketim rebiyo ti xêra bikî gelo di kortê de

Dara zilmê çikandine di devê rê de şerît avêtin bi darê de

Şêx Şabedîn digo: Mihemed Şîrîn bira ti delal î ti biçûkê şêxa yî

Ez nizanim çima li ber şerîtê wisa kûr dinalî

Bira, va şêxa avêtin bi darê de va qutba avêtin bi darê de

Sê car şerît qetiya di hizûra Xwedê de

Xîret nema di islamê de îman bira nema di serê romê de

Ax bê li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo

Bê li li lo li lo li lo li lo li lo li lo li lo weyla li min nemayê wayê[111]

#### 2.2.3.3.1. Mijara Berhemê

Mijara berhemê darvekirina Şêx Şabedîn, Mehmet Şîrîn û Seyît Elî ye

#### 2.2.3.3.2. Naveroka Berhemê

Di vê berhemê de dengbêj behsa darvekirina, kuştina Şêxên Kurdan dike û bi taybetî mijar li ser darvekirina Şêx Şabedîn û Seyîd Elî ye. Sedemê darvekirina van Şêxên Kurdan di dîrokê de wek serhildan, tevgerîna li dijî dewletê tê dîtin.

Lêkolîner Tibet Abak di gotara ya bi navê "Serhildana Bedlîsê Di Belgeyên Arşîvên Rûsan de(194)" de li ser mijarê de vê yekê wisa tîne ziman: "Beriya Herba Dinyayê a Yekemîn li wîlayetên rojhilatê tevgerînên cûrbecûr hebûn. Navenda van tevgerînan jî Bedlîs bû. Abdurrezak û Simko ji Îrana di bin kontorola Rûsya, Molla Selîm û Şêx Şabedîn û hwd. Serokên serhildanan jî ji rojhilatê ji wîlayetên rojhilatê yên Osmanîyan li Bedlîsê amadehîya serhildanekî dikirin…Di vê navberê de 23 yê îlonê ji bo 11 Kurdan cezayê mirinê hatibû birîn û di 7 ê gulanê de jî hatibûn darvekirin. Di nav van de kesayetên girîng yên serhildanê Şêx Şabedîn û Seyîd Elî jî hebûn."[112]

Ji xeynî Şêx Şabedîn û Seyîd Elî bêguman gelek kesên din jî di nav vê bûyerê de cih girtin e û gelek kes ketine zindanan û hatine darvekirin. Lê belê yên navên wan derketine pêş û ji bo vê bûyerê bûne wek navên sembol bêguman Şêx Şabedîn, Seyîd Elî, Mihemed Şîrîn û Mele Selîm in. Lêkolîner Erdal Aydoğan jî di gotara xwe ya bi navê "Di Ronahîya Belgeyên Nû De Bûyera Bedlîsê" de li ser navên bûyera Bedlîsa van agahîyan dide: "Di bûyerên Bedlîsê de sê nav balê dikşînin. Ev her sê nav jî şêxên xwedî nufûz yên navçeya Hîzanê bûn. Ev her sê kes di serî de Şêxê Tekyaya Xeyda Şabedîn, Seyîd Elîyê ku bi karên Tekyayê yên îdarî ve mijûl bû û Xelîfeyê Şêx Mele Selîm bûn."[113]

Di straneka ku di kovara Jîn ê de dibore darvekirina Şêx Şabedîn, Seyîd Elî û Mehmet Şîrîn wisa tê behs kirin.

---

[111] Deşifrekirina berhemê ji aliyê Necat Gümüş ve hatiye kirin.
[112] Tibet Abak, **Serhildana Bedlîsê Di Belgeyên Arşîvên Rûsan de(194)**,Toplumsal Tarih, Stenbol: 2011, hej. 208, r. 7-9.
[113] Erdal Aydoğan, **Di Ronahîya Belgeyên Nû De Bûyera Bedlîsê,** A.Ü. Türkiyat Araştırmalar Ensitütüsü Dergisi[TAED] 49, Erzurum: 2013, r. 313.

"*Çûme Bedlîsê, xopanê di kortê da*

*Hatim Bedlîsê, xopanê di kortê da*

*Daraxacî rast kiribûn tê da*

*Kindirên zeytkirî berdabûn pê da*

*Şêx Şabedîn, Seyîd Elî, Mehmed Şîrîn avêtibûn pê da*

*Kindir qetiyabû ji bal Xwedê da*

*Şêx Şabedîn ketibû erdê da*

*Dilê neyaran, kevir bû tê da*

*Dîsa Şêx avêtibûn kindirê sêpê da.*"[114]

**2.2.3.3.3. Lehengên Berhemê**

Şêx Şabedîn, Seyîd Elî, Mihemed Şîrîn, Şêx Celaledîn, Sedîqê Mamo

**2.2.3.3.4. Zimanê Berhemê**

Di rêzika 'Reîsê umûmî bêîman e ji ba xwe ra kiriye ferman e serê Kurda mîna serê şêxan û mela ne' de peyva "fermanê" dîsa hatiye bi kar anîn û kuştina şêxên Kurdan di wateya çewa ku fermanek giştî li serê Kurdan rabûbe hatiye bi kar anîn. Dî rêzika "Weyla Sedîqê Mamo lawo li dinyayê belkî kok û zireta te biqele" de jî dengbêj bal kişandiye îxaneta di nav Kurdan de. Sedîqê Mamo di berhemê de wek nûnerê vê îxanetê hatiye nişandan.

Dî rêzika "Bira wele ev ne çêdibî Şêx Celaledîn anîne welayeta Wanê li dewsa qahwê fincana jahrê dane bere" de jî çewa ku di gelek berhemên bi vê terzê de wek gotinek qalib " kuştina bi fincana jehrê" hatiye bi kar anîn. Di rêzika "Sê car şerit qetiya di hîzûra Xwedê de" de dengbêj bal kişandiye ku dema kesekî pîroz, qencekî Xwedê hatiye xenîqandin şerîta ku diavêjin stuyên wan jî ji ber hirmet û rêzgirtina wan diqete û naxwaze kuştina wan bi rêya wê çêbibe.

[114] Mehmed Emîn bozarslan, **Kovara Kurdî- Tirkî Jîn**, İsveç: Weş. Deng, cild 1, 1985, r. 45.

#### 2.2.3.3. 5. Teşe û Cûreya Berhemê

Kêşa berhemê serbest e. Di berhemê de serwa û paşserwa hatine bi kar anîn. Berhem ji çar bendan pêk hatiye. Benda ewil ji heft ya dûyemîn neh ya sêyemîn sêzdeh ya dawî jî ji diwazdeh rêzikan pêk hatiye. Cûreya berhemê zêmar e. Em dê li jêr wek mînak di bendeka berhemê de serwa û paşserwayên hatine bi karanîn nîşan bidin. Di peyvên hatine nîşandayîn de tîpên “er” serwa ne, tîpa e jî paşserwa ye.

“Heyla nemayê sibeye wezê bi diyarê Erdîşê geliyê Zilan diketim li hemb**er** *e*

Weyla Sedîqê Mamo lawo li dinyayê belkî kok û zireta te biqele

Min ne go e wîya seyîd in li avdele ji zireta pêxemb**er** *e*

Ketine pêşiya sê tabur eskerê cimhuriyetê li taqîba va seyîda va şêxa va seyîda lawo mi go tu bes big**er** *e*”

#### 2.2.3.3.6. Dahûrîna Berhemê

Di berhemê de tiştê herî zêde bala mirov dikşîne ev e ku ji aliyê dewletê ve fermana kuştina şêx, welî û murşîdên di nav Kurdan de rabûne hatiye dayîn. Çewa ku dengbêj jî anîye ziman ji ber ku Kurd ji dîrokê ve gelekî girêdayî dînê xwe bûne û zêde qedir dane şêx, mele û welîyên xwe, ev bûyera ku hatiye serê şêx û welîyên civata Kurdan bûye sedemê travmayek mezin di nav civatê de.

Çewa dengbêj jî aniye ziman “Tekya” vale bûne û mirîd û endamên van tekyayan ketine nav rewşeke aloz de. Dengbêj bûyera darvekirina Şêx Şabedîn û Seyîd Elî bi awayekî dilsoj anîye ziman. Dîsa ji aliyê dengbêj ve bi nûnertiya ‘Sedîqê Mamo’ xayîntiya di Kurdan de jî hatiye sembolîze kirin.

## ENCAM

Dengbêjî di nav xwe de gelek hêmanên wekî çîrok, serpêhatî, adet, tore, hwd dihewîne. Lewma hunera dengbêjiyê di nav hêmanên çanda devkî de cihekî taybet digire. Dengbêjî di dema me de her çiqas bêqedir û kêm bûye jî, ji rola xwe ya di nav civakê de zêde tiştek wenda nekiriye. Niha jî dengbêj li malên dengbêjan, di bernameyên televîzyonan de, di civatan de, di şevbuhêrkan de cih digirin û bi dengê xwe yên xweş vê rola xwe pêk tînin.

Çewa ku me di gelek cihên teza xwe de jî anî ziman, Kurdan çanda xwe bi awayekî devkî anîne ziman û heya dema me jî parastine. Di warê parastina çanda Kurdî de barê giran jî bêguman dengbêjan hilgirtine. Dengbêj him di nav gel de him jî li derveyê civakê her tim bûne berdevk û nûnerê civaka xwe. Dengbêjî wek hunerek li gelek herêmên ku Kurd lê dijîn derdikeve pêşiya me. Di warê dengbêjiyê de bêguman herêma herî serkeftî Serhed e. Ji vê herêmê gelek dengbêjên navdar yên wek Evdalê Zeynikê, Şakiro û Reso hwd derketine. Li ser van dengbêjan û dengbêjiya herêma Serhedê xebat pir hatine kirin.

Di vê xebata xwe de jî me xwest ku em ji herêmek cuda ango herêma Xerzanê behsa dengbêjiyê bikin. Bitaybetî jî em li ser jiyan û hûnera dengbêjê herêmê yê navdar Salihê Qubînî rawestiyan. Salihê Qubînî niha jî li Batmanê dijî û karê xwe yê dengbêjiyê berdewam dike. Li gelek herêmên ku Kurd lê dijîn Salihê Qubînî tê nas kirin. Berhem û kilamên wî ji aliyê gelek dengbêjan ve tên gotin û guhdar kirin. Dema behsa dengbêjiya Xerzanê bête kirin kesê ku ewil tê bîra mirov bêguman Salihê Qubînî ye.

Ji bo vê xebata xwe em li gelek cihên herêmê geriyan û di warê dengbêjiyê de bi gelek dengbêj û lêkolîneran re me hevpeyvîn kirin. Ji ber ku mijara teza me bitaybetî Salihê Qubînî bû em zêdetir li ser jiyan û berhemên wî sekinîn. Di hevpeyvînên me de di derheqê jiyana wî û naveroka berhemên wî yên ku xweser wî çêkirine de mijarên balkêş derketin holê. Salihê Qubînî ji aliyê dengbêjiyê ve di bin bandora hin dengbêjên navdar yên herêmê de maye, lê belê wî bixwe jî di vî warî de bandor li hin dengbêjên herêmê kiriye. Ev yek ji bo berdewamkirina karê dengbêjiyê gelekî girîng e. Wek mînak li gor agahiyên em hîn bûn neviyê wî Yusuf di warê dengbêjiyê de gelekî di bin bandora wî de maye û niha jî di civatan de carinan bi bapirê xwe re cih digire û kilaman dibêje.

Li herêma Xerzanê ji xeynî Salihê Qubînî gelek dengbêjên din yên navdar jî hene. Lê belê ji bo ku mijara teza me ji armanca xwe ya bingehîn dernekeve me nexwest ku em bi tevahiya dengbêjên herêmê ve re biaxivin û behsa jiyan û dengbêjiya wan bikin. heya ji dest me hat, me kesên navdar yên herêmê hilbijartin. Li gor min bitaybetî dengbêj Teyîboyê Sehertî ji ber ku berê di herêmê de dengbêjekî gelekî navdar bu û gelek berhem û kilamên wî bixwe çêkirine hene, divê li ser jiyana wî û dengbêjiya wî lêkolîn betin kirin. Teyîbo digel temenê xwe yê li ser heştêyî niha jî li gundê Marîbê yê girêdayî navçeya Misircê dijî. Herçiqas derfeta wî ji bo kilamgotinê zêde nemabe niha jî qesîdeyan çêdike û dibêje.

Di vê xebata xwe de di nav sinorên çanda devkî de em li ser jiyana Salihê Qubînî û berhemên wî yên xweser sekinîn. Ji xeynî Salihê Qubînî bi rêya hevpeyvîn û lêkolînên li ser herêma Xerzanê di warê dengbêjiyê de me nexşeya dengbêjiya herêmê derxist berçavan.

## ÇAVKANÎ


Abak**,** Tibet, **Serhildana Bedlîsê Di Belgeyên Arşîvên Rûsan de(194)**,Toplumsal Tarih, İstanbul: Îlon 2011.

Akkuş, Bekir, Dengbêj, “Li Ser Mijara Dengbêjiyê”, Idir, 25.06.2018.

Alan, Remezan, **Dengbêj(î) û Helbesta Gelerî**, Diyarbakır: Kovara Wêje û Rexne, Hej. 4,Zivistan 2015.

Ava, Mihemed, **Dengbêj Çirokên Kılaman Radyoya Erîvanê**, Çapa yekemîn, Ankara: Weşanên Ar, Sermawez (Mijdar) 2016.

Aydoğan, Erdal, “Di Ronahîya Belgeyên Nû De Bûyera Bedlîsê” ,**A.Ü. Türkiyat Araştırmalar Ensitütüsü Dergisi[TAED]** Sayı 49, 2013.

Bayrak, Mehmet, **Mûzîk, Dans û Şarqiyên Kurdî**, Cilda Yekem, Ankara: Weşanên Özge, 2002.

Beğik, Mahmut, “Dengbêj Resoyê Gopala(Jiyan û Berhem)”,**Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi**, Mardin Artuklu Üniversitesi TYDE, 2013.

Benjamin, Walter, **Son Bakışta Aşk**, Çapa Dûyemîn, İstanbul: Weşanên Metis ê, 1995.

Boratav, Pertev Naili, **100 Soruda Türk Halk Edebiyatı**, Gerçek Yayınevi, Cild.4, İstanbul, 1982.

Bozarslan, Mehmed Emîn, **Kovara Kurdî- Tirkî Jîn**, Cild 1, İsveç: Weşanxana Deng, 1985.

Cebe, Rohat, “Teknîka Melîzma û Dengbêjî”, **Batman Üniversitesi Uluslararası Katılımlı Bilim ve Kültür Sempozyumu**, Batman, 18-20 Nisan 2012.

Cizîrî, Şerefxan, **Edebiyat an jî Kultura Devkî**, Kovara Nûdem, İsveç: 1999.

Cîbo, Nezîrê, **Kürt Tarihinde Garzan ve Pencinarîler**, Birinci baskı, İstanbul: İBV Yayınları, 2016.

Çakar, Mehmet Sait, Fehim Işık vd. ,**Orta Öğretim Kürt Dili ve Edebiyatı Ders kitabı**, İstanbul: Tarih Vakfı Yayınları, Ekim 2010.

Çobanoğlu, Özkul, **Aşık Tarzı Kültür Geleneği ve Destan Türü**, Ankara: Akçağ yay, 2000.

Derviş İleri, Dengbêj, “Li ser mijara dengbêjiyê”, Misirc, 17.05.2018.

Ekîncî, Hayrettîn, **Dengbêjî**, Çapa Yekem, İstanbul: Weşanên J&J, 2013.

Erdal, Tuğçe, “Sözlü ve Yazılı Kültür Tartışmaları Açısından Fuzûlî Eserlerinde Varyatnlaşma”, **Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi**, Bozok Üniversitesi SBE, 2013.

Eren, Tahir, **Cemîlê Çeto û Serhildanên Xerzanê**, Çapa Yekem, Diyarbekir: Weşanên J&J, 2016.

Evdal, Emînê û Heciyê Cindî, **Folklora Kurmanca**, Çapa yekem, Stenbol: Weşanên Avesta, 2008.

Farqînî, Zana, **Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî,** Weşanên Enstîtuya Kurdiya Stenbolê, Stenbol, 2010.

Fırat Taş, **Dengbêjlik Geleneği ve Dönüşümler**, Yayınlanmamış Yüksek Lisans Tezi, Ankara Üniversitesi, SBE, Ankara, 2015.

Fırat Taş, **Bir Sözlü Gelenek Olarak Dengbêjlik ve Tarihi Anlatımı**, Kürt Tarih Dergisi İstanbul, sayı 27

Goody, Jack, **Sözlü Kültür**, Milli Folklor, Ankara: ,2009, Sayı 83.

Gündüz, Hüseyin**, Çîrokên Evînê Yên Kurdan 1**, Çapa duyem, Stenbol: Weşanên Do, 2009.

İnanç, Zeri, **Dengê Kurdan Di Radiyoya Erîvanê de**, Çapa Yekem, Stenbol: Weşanên Weqfa İsmail Beşikçi, 2016.

Îzolî, D. ,**Ferheng Kurdî-Tirkî, Tirkî-Kurdî**, Weşanên Deng, Köln, 1992.

Karacan, Hasan ve Rıdvan Nayman, **Dengbêj Salihê Qubînî ile Karapetê Xaço’nun Şarkılarında Aşiret Kavgaları: “ Filîtê Quto ile Elî Etmanki Kavgası**”,Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Dergisi, 2014.

Kardas**,** Canser, **“**Dengbêjlik Geleneği ve Aşık Edebiyatı İle Karşılaştırılması”, **Yayımlanmamış Doktora Tezi**, Fırat Üniversitesi SBE, Elazığ, 2013.

Lescot, Roger, **Memê Alan**, Çapa duyem, Stenbol: Weşanên Avesta, 2010.

Nas, Hüsamettin, Dengbêj , “Li ser dengbêjiyê”, Kurtalan(Zoqeyd), 12.05.2018.

Keskin, Necat, **Di Çarçoveya Teoriya Performansê De Nirxandina Vegotinên Gelerî,** Kovara Lêkolînên Kurdî yên Navnetewî**,** 2016**.**

Koçu, Zahir, Dengbêj, “ Li Ser Mijara Dengbêjiyê”, 03.11.2018.

Ong, Walter J. : **Sözlü ve Yazılı Kültür**, İstanbul: Weşanên Metis ê, 2014.

Pertev, Ramazan**, Edebiyata Kurdî ya Gelerî**, Çapa Yekem, Stenbol: Weşanên Avesta, 2015.

Sak, Abuzer, Dengbêj, “ Li ser dengbêjiyê”, Kurtalan, 10.08.2018.

Sanders, Barry, **Öküzün A’ sı, Elektronîk Çağda Yazılı Kültürün Çöküşü ve Şiddetin Yükselişi**, Üçüncü Basım, İstanbul: Ayrıntı Yayınları, 2013.

Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan**, Cilda Yekem, Stenbol: Weşanên Şaredariya Mezin a Amedê, 2007.

Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan**, Cilda Duyem, Stenbol: Weşanên Şaredariya Mezin a Amedê, 2007.

Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê, **Antoljiya Dengbêjan**, Cilda Sêyem, Stenbol: Weşanên Şaredariya Mezin a Amedê, 2007.

Taşkın, Nuri, Karmend, “ Di derheqê jiyana Dengbêj Recêyê Sihî de”,Batman, 16.04.2018.

Taymaz, Tayyip, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Kurtalan, 22.04.2017.

Ulugana, Sedat, **Dengbêjler Şahı Reso,** Kovara Dirokê ya Kurdan, Stenbol: 2016

Uzun, Mehmed, **Dengbêjlerim**, Weşanên İthakî, çapa nehan, İstanbul, Gulan 2012.

Yorulmaz, Enver, Karmend, “ Li ser Dengbêj Nazî Beg”, Kurtalan, 20. 08. 2018.

Yorulmaz, Mehmet Salih, Dengbêj, “ Li ser mijara dengbêjiyê”, Batman, 20.03.2018.

Yüksekbağ, Mehmet Ali, Dengbêj, “ Li ser dengbêjiyê”, Kurtalan, 12.05.2017.

Yeşîlçınar, Fehmî, “Dengbêj Ahmedê Alîksan’ın Hayatı ve Eserleri”, **Yayımlanmamış Yüksek Lisans Tezi**, Muş Alpaslan Üniversitesi SBE, 2016.

Zinar, Zeynelabidîn, **Jînewariya Derwêşê Sado**, Çapa Yekem, Stenbol: Weşanên Ajans Nas, 2011

## KURTEJİYAN

Beşir Güçlü di sala 16.02.1988 an de li navçeya Kurtalan a girêdayî bajarê Sêrtê hatiye dinê. Dibistana seretayî û ya navî li Kurtalan, lîse jî li navenda Sêrtê qedandiye. Sala 2007'an de li Fakûlteya Perwerdehiyê Ya Zaningeha Çukurovayê dest bi xwendina beşa mamostetiya agahiyên civakî kiriye. Di sala 2011 an de ji beşê mezun bûye. Di sala 2012 de li Zaningeha Artuklu Ya Mêrdînê di Ensitutuya Zimanên Zindî di beşa Çand û Zimanê Kurdî de dest bi mastira bêtez kir û 2013'an de ev beş jî qedand. Sala 2014' yan de li zaningeha Muş Alparslanê di beşa Çand û Zimanê Kurdî de dest bi mastira bitez kir û niha jî xwendekariya wî berdewam e.

## ÖZGEÇMİŞ

Beşir Güçlü 16.02.1988 yılında Siirt'in Kurtalan ilçesinde dünyaya geldi. İlkokulu ve ortaokulu Kurtalan'da, liseyi Siirt'te tamamladı. 2007 yılında Çukurova Üniversitesi Eğitim Fakültesi Sosyal Bilgiler Öğretmenliği bölümüne başladı ve 2011 yılında bu bölümden mezun oldu. 2012 yılında başladığı Mardin Artuklu Üniversitesi Yaşayan Diller Enstitüsü Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı'ndan 2013 yılında Tezsiz Yüksek Lisans derecesiyle mezun oldu. 2014 yılında Muş Alparslan üniversitesinde Kürt Dili ve Kültürü Anabilim dalında tezli yüksek lisansa başlamış ve halen bu bölümde öğrenciliği devam etmektedir.